# Saziyên Civaka Sîvîl di Pêvajoya Çareseriyê de 2013-2015

Cuma ÇİÇEK

BARIŞ VAKFI
WEQFA AŞITIYÊ - PEACE FOUNDATION

**Saziyên Civaka Sîvîl di Pêvajoya Çareseriyê ya 2013-2015'an de**

**Weşanên Weqfa Aşitiyê**

Rapora Polîtîkayê 2

**Nivîskar:** Cuma ÇİÇEK

**Qada Lêkolînê:** Reha RUHAVİOĞLU, Veysi ALTINTAŞ

**Şêwirmend:** Alev ERKİLET, Bekir AĞIRDIR, Etyen MAHÇUPYAN

**Bergsazî:** TMM Ajans

**Mîzanpaj û Rûpelsazî:** TMM Ajans


**Dîroka Çapê:** Berfanbar 2017
**Cihê Çapê:** Berdan Matbaacılık, Davutpaşa Cad. Güven Sanayi Sitesi C Blok
No: 239 - Topkapı / İSTANBUL
+90 (212) 613 1211

**Sertika No:** 12491
**ISBN:** 978-605-83546-1-6



**Copyright © Berfanbar 2017**

Ev weşan bê pere ye, ji bo firotinê nîne.
Hemû mafên weşanê parastî ne û tu beşeke wê nikare bê zêdekirin bêyî destûra Waqfa Aşitiyê.



**Weqfa Aşitiyê**
Waqfa Aşitiyê | Peace Foundation

**Navnîşan:** Kalyoncu Kulluğu Mh. Ömer Hayyam Cd. No: 40 Kat: 1 D: 5
Beyoğlu/İstanbul

**Tel:** +90 212 249 26 54
**Faks:** +90 212 249 26 54
**Web:** www.barisvak .org
**E-Posta:** info@barisvak .org
**Facebook:** /barisvak
**Twitter:** /barisvak

**Cuma ÇİÇEK** li Amedê ji dayik bû, di ala 1980'yê de. Piştî ku perwerdeya xwe ya sereta, navincî û lîseyê li Amedê temam kir, sala 2004'an beşa Endazyariya Endustriyal li Zanîngeha Têknîkî ya Stenbolê temam kir. Di navbera 2005-2008'an de Bernameya Masterê ya Pîlansaziya Bajar û Herêmê di heman zanîngehê de xilas kir. Bi pêrspêktîfeke rexnegirane pêvajoya birêvebirinê ya li Amedê nirxand di têza xwe de. Di navbera salên 2009-2014'an de li Enstîtuya Êtûtên Polîtîk ya Parîsê (*Institut d'Etudes politiques* de Paris – *Sciences* Po.), di Şaxa Makezanista Zanista Siyasetê de diktoraya xwe di warê sosyolojiya siyasetê û polîtîka/çalakiyên giştî de temam kir. Çiçek, yek ji damezirînerên Weqfa Aşitiyê, endamê Enstîtuya Lêgerînên Siyasî û Sosyal ya Amedê (*DİSA*) ye.

Di kovarên wekî *Birikim, Praksis, İktisat Dergisi, Turkish Studies, Dialectical Antropology* de li ser meseleya kurd, îslamgeriya kurd, birêveberiyên herêmî, newekheviyên herêmî, peywendiyên çînî û nasnameyî, çareserkirina pevçûnan û avakirina aşitiya civakî gotarên wî hatine weşandin. Niha li jêr banê Navenda Lêgerînên Navneteweyî ya Enstîtuya Êtûtên Polîtîk ya Parîsê (*Centre de Recherches Internationales* -CERI), berdewam e li xebatên xwe yên akadêmîk.

Pirtûkên Wî:

• *The Kurds of Turkey: National, Religious and Economic Identities* [Kurdên Tirkiyeyê: Nasnameyên Neteweyî, Dînî û Êkonomîk] (London: I.B. Tauris, 2017),
• *Ulus, Din, Sınıf: Türkiye'de Kürt Mutabakatının İnşası* [Netewe, Dîn, Çîn: Mitebeqetsaziya Kurdan li Tirkiyeyê] (Stenbol: İletişim, 2015),
• *Zimanek Çima Tê Qedexekirin: Polîtîkayên Zimanî û Rewşa Kurdî li Tirkiyeyê* (İstanbul: Weşanên Peywend, 2013),
• *Küreselleşme ve Yerel Demokrasi: Liberal Katılımın Söyleminin Sınırları & Diyarbakır Örneği* [Globalîzm û Demokrasiya Xwecihî: Sînorên Gotara Beşdarbûna Lîberal & Wek Nimûne Amed] (Stenbol: Weşanên Vate, 2011),
• *Demokratikleşme Süreçlerinde Sivil Toplum Örgütleri: Bir Alan Araştırması Örneği Olarak Güneydoğu* [Rêxistinên Civaka Sîvîl di Pêvajoyên Demokratîkbûnê de: Rojhilatê Başûr Wek Nimûneyeke Lêkolîna Qadê] (Stenbol: Toplum ve Hukuk Araştırmaları Vakfı Yayınları, 2004).

## NAVEROK

**KURTEYA BIRÊVEBER** .................. **9**

**DESTPÊK** .................. **13**

**1. CIVAKA SÎVÎL Û AVAKIRINA AŞITIYÊ: ÇARÇOVEYEKE TÊORÎK** ...... **17**
**1.1.** Astên Pêvajoyên Gotûbêjan .................. **17**
**1.2.** Heft Fonksiyonên SCS'yan di Çareserkirina Pevçûnan de .................. **20**

**2. CIVAKA SÎVÎL Û ÇARESERKIRINA PEVÇÛNAN LI TIRKIYEYÊ** ........ **23**
**2.1.** Profayla Civaka Sîvîl .................. **23**
**2.2.** Dewleta Hêzdar, Civaka Sîvîl a Lawaz .................. **25**
**2.3.** Civaka Sîvîl û Angajmanên Siyasî .................. **27**
**2.4.** Getoyên Civaka Sîvîl .................. **29**
**2.5.** Civaka Sîvîl û Derza Herêmî .................. **30**
**2.6.** Civaka Sîvîl û Pirsgirêka Zerfiyetê .................. **32**
**2.7.** Civaka Sîvîl û Girtina Sînoran .................. **33**
**2.8.** Civaka Sîvîl û Normên Demokratîk .................. **34**
**2.9.** Salên 1990'î: Salên Tarî .................. **35**
**2.10.** Salên 2000'î: Berfirehbûn û Zindîbûn di Qada Sîvîl de .................. **36**
**2.11.** Du Qadên Ku Derdikevin Pêş di Çareserkirina Pevçûnan de: Mafên Mirovan û Zayenda Civakî .................. **40**

**3. PÊVAJOYA ÇARESERIYÊ (2013-2015) Û CIVAKA SÎVÎL** ........... **43**
**3.1.** SCS'yan Çi Kir di Pêvajoya Çareseriyê de? .................. **43**
**3.2.** SCS'yan Nekarî Çi Bikin? .................. **46**
**3.3.** Dînamîkên Ku Beşdarbûna SCS'yan li Pêvajoyê Sînordar Dikin .................. **50**

**4. SCS Û ŞIRÎKATIYÊN SAZGEHÎ DI PÊVAJOYA ÇARESERIYÊ DE** ...... **57**
**4.1.** Têkiliyên SCS-SCS'yan .................. **57**
**4.2.** Têkiliyên SCS-Siyasetê .................. **60**
**4.3.** Têkiliyên SCS-Akadêmiyê .................. **61**
**4.4.** Têkiliyên SCS-Medyayê .................. **68**

**5. DERFETÊN GOTÛBÊJ Û LEVKIRINÊ DI MESELEYA KURDÎ DE** ....... **81**
**5.1.** Pêvajoyeke Nû ya Gotûbêj û Levkirinê? ................................ **81**
**5.2.** Asteng ................................................................ **86**
**5.3.** Derfet ................................................................ **91**
**5.4.** Akterên Krîtîk ........................................................ **96**

**ENCAM: ROLA CIVAKA SÎVÎL JI BO ÇARESERÎ Û LEVKIRINÊ** ........... **101**
Astengên Bingehîn li ber SCS'yan ....................................... **101**
Derfetên li pêşiya SCS'yan ............................................. **103**
SCS Dikarin Çi Bikin? .................................................. **104**
Dewlet, Hukumet û Tevgera Sereke ya Kurdan Divê Çi Bikin? ........ **108**

**ÇAVKANÎ** ................................................................ **111**

**PÊVEK**
**PÊVEK 01:** SAZÎ Û KESÊN KU HEVDÎTIN LI GEL WAN HATINE KIRIN . . **113**
**PÊVEK 02:** PIRSÊN LÊKOLÎNA QADÊ ..................................... **117**

## PÊŞEKÎ:

Tirkiye di qonaxeke biêş û kaotîk re derbas dibe. Ji bo bidawîkirina pevçûnan di meseleya kurdî de û ji bo pêşvebirina zemîna çareseriyeke demokratîk, ji rojên ewil ên sala 2013'an, Pêvajoya Çareseriyê hate destpêkirin. Piştî ku ev pêvajo têk çû, me gelek tişt ji dest dan û em hê jî ji dest didin. Me di wexta Pêvajoya Çareseriyê de gelek tişt bi dest xistin û em hînî gelek tiştan bûn ku îro qedrê wan baştir tê famkirin. Îro, em gelek dûr in ji çareseriyê. Zehmettir bûye gihîştin bi aşitiyê. Hin kêşeyên nû yên siyasî, civakî û saykolojîk çar bûn. Atmosfera civakî lawaz bûye ji bo bilêvkirina peyva aşitiyê.

Ji ber çi cure xeta û polîtîkayên şaş ên kesekî yan kesan rewş hate vê astê û Pêvajoya Çareseriyê ji ber kîjan saîq û armancê ji aliyê kê ve hate sabotajkirin, li ser akterên siyasî û layenên yekem ên kêşeyê, ev du sal in hin nirxandin hatin/tên kirin. Cara yekem e, cuda ji akterên siyasî, xebatek hate kirin bi sernavê "Saziyên Civaka Sîvîl di Pêvajoya Çareseriyê de". Encamên xebatên qadê hatin veguhertin bo raporekê.

Ev rapor, ji aliyekî ve berdewamiya rapora bi sernavê "Çözüme Doğru: Olasılıklar, İmkânlar ve Sorunlar Üzerine Değerlendirme [Ber bi Aşitiyê: Nirxandinek li ser Dibetî, Derfet û Kêşeyan]"(http://barisvakfi.org/tr/index.php?option=com_content&view=article&id=61&Itemid=40) e ku Meclîsa Aşitiyê ya Tirkiyeyê di Nîsana 2015'an de belav kiribû; her wiha Weqfa me raporek bi sernavê "Ji Dolmebaxçeyê heta Roja Îro Pêvajoya Çareseriyê: Têgihîştina Sernekeftinê û Peydakirina Rêyeke Nû" (http://www.barisvakfi.org/kr/kurdi_rapor.pdf) di Nîsana 2016'an de wek yekemîn xebata xwe weşand.

Rapora yekem, sedemên çêbûna qeyranê di Pêvajoya Aşitiyê de û çareserkirina vê qeyranê li xwe digire. Rapora duyem, wan tiştan li xwe digire ku piştî bidawîkirina Pêvajoya Aşitiyê qewimîn û her wiha derfetên peydakirina rêyeke nû li xwe digire.

Bi vê xebatê ve jî, hate armanckirin ji bo enelîzkirina pozîsyon û zerfiyeta (*capacity*)ya wan saziyên civaka sîvîl ku di maweya 2013-2015'an de ji bo çareserkirina pevçûnan û avakirina aşitiyê di qada bidawîkirina pevçûnên meseleya kurd de xebat kirine. Gava yekem, armanca wê ew e ku geşeyê bide pêşniyaran ji bo xebatên saziyên civaka sîvîl. Hate armanckirin ji bo ku Saziyên Civaka Sîvîl bikarin bêtir bi techîzat û çalak tevkariyê bikin li lêgerînên xwe yên nû.

Di raporê de, ew peywir û berpirsiyarî bi awayekî zelal û eşkere tên bibîrxistin ku li hêviya me ne. Nexşerêyek e ji bo Saziyên Civaka Sîvîl. Enerjiyekê li pêşvebirina hêviyên aşitiyê zêde dike.

Em yek bi yek spasiya  wan kesan dikin ji ber tevkariyên wan ên binirx: Birêveberê projeya me akademîsyen Dr. Cuma Çiçek (Navenda Lêkolînên Navneteweyî li Parîsê), Endamên Desteya Şêwirmendiyê ya Projeyê Doç. Dr. Alev Erkilet, nivîskar Etyen Mahcupyan, Gerînendeyê KONDAyê Bekir Agirdir; Reha Ruhavioglu û Veysi Altintaş ku xebatên qadê bi rê ve birin.

Em hêvî dikin ku ev rapor bikare tevkariyekê bike li lêgerînên ji bo aşitiyeke karîgertir û mayindetir; bibe wesîleya pêşveçûna me di rêya Tirkiyeyeke wekhev, azad û demokratîk de.

**Desteya Birêvebirinê ya Weqfa Aşitiyê**
**Berfanbara 2017'an**

## KURTEYA BIRÊVEBER

Ev lêkolîn armanc dike ku pozîsyon û zerfiyeta Saziyên Civaka Sîvîl (SCV) ya ji bo bidawîkirina pevçûnan di meseleya kurdî de û avakirina aşitiya civakî enelîz bike; hem ji bo akterên siyasî û hem jî ji bo civaka sîvîl pêşniyaran destnîşan bike ji bo pêvajoyeke muhtemel a gotûbêj û levkirinê. Di vê çarçoveyê de, li ser wan xebatên SCS'yan disekine ku di Pêvajoya Çareseriyê ya 2013-2015'an de ji bo çareserkirina pevçûnan û avakirina aşitiya civakî hatine çêkirin. Rol û pêgeh(konum)a SCS'yan bi çavê SCS'yan enelîz dike hem di Pêvajoya Çareseriyê ya têkçûyî û hem jî di pêvajoyeke muhtemel a gotûbêjan de. Wek rêbaza lêkolînê teknîka kalîtatîf ya lêkolînê *qualitative research technique* hatiye bikaranîn. Di navbera 15'ê Gulanê û 30'yê Tîrmeha 2017'an de li gel 45 SCS û sê pisporan li Amed, Wan, Stenbol û Enqereyê hevdîtinên nîv-sazkirî (*semi-structured interview*) hatin pêkanin.

Lêkolînên ku li ser mijara çareserkirina pevçûnan û avakirina aşitiya civakî hatine kirin, nîşan didin ku SCS di pêvajoyên wiha de dikarin rolên girîng bilîzin. Di wan bûyeran de, ku di serî de li cihên siyasî, êkonomîk, civakî, çandî û her wiha li gelek qadên din dibine sedema xirapkariyeke girîng, bidawîkirina pevçûnan û ve-avakirina aşitiya civakî zehmet e ku tenê bi gotûbêjên navbera layenên pevçûnan bê pêkanîn. Lewma ve-avakirina aşitiya civakî pêwîstî bi têkilîdanîneke civakî ya pir-astî û pir-akterî, gotûbêj û helalbûnê heye. Xebatên ku li ser rola SCS'yan di avakirina levkirina civakî de hatine kirin, binê heft fonksiyonên van rêxistinan xêz dikin: (1) parastina hemwelatiyan, (2) şopandin û berpirsiyarî-qebûlî, (3) parêzvanî û ragihandina giştî, (4) civakîbûna nav-komî û çanda aşitiyê, (5) pêkvebûna civakî ya hestyar bo pevçûnan, (6) navbînkarî û asankarî û (7) xizmetkirin yan pêşkêşkirina xizmeteke rasterast.

Fikra hevpar li ba piraniya beşdaran ew e ku li Tirkiyeyê qada civaka sîvîl sînordar e û akterên civaka sîvîl lawaz in. Ew kêşeyên bingehîn ku binê wan hate xêzkirin; dûrbûna civaka sîvîl ji meseleya kurdî, kevneşopiya "dewleta hêzdar, civaka sîvîl a lawaz", cemserbendî (polarization) a navbera SCS'yan û getoyên civaka sîvîl, ferqa herêmî ya navbera SCS'yan, pêşveçûneke netam ya nirxên demokratîk û pêvajoya biryaran di nav saziyan de. Liv û tevgera qada civaka sîvîl li Tirkiyeyê bi taybetî di salên 1990'î de derketiye meydanê. Salên 2000'î mirov dikare wek dewrekê qeyd bike ku tê de qada civaka sîvîl berfireh dibe û xebatên SCS'yan zindî dibin. Tevî hemû sînordarkirinan, ew hewlên ku ji salên 1990'î ve tên dayîn, li Tirkiyeyê tecrubeyeke wisa pêk anî ku mirov nikare bi girîng nebîne. Şopandin, ku di mijara mafên mirovan de pêş ketiye, berpirsiyarî-qebûlî û li ser vê bingehê derketina mobîlîzasyoneke sosyo-polîtîk di qada ragihandina giştî,

parêzvanî, newekheviya jin û mêran û zayenda civakî de; şopandin û ber-pirsiyarî-qebûlî du qadên bingehîn in ku di wan de tecrubeyeke girîng hate berhev ji bo çareserkirina pevçûnan û avakirina aşitiya civakî.

SCS'yan bi asteke sînordar cih girtine di Pêvajoya Çareseriyê ya 2013-2015'an de. SCS'yan bi piranî di Pêvajoya Çareseriyê de bi navend girtina hukumeta AK Partiyê û Tevgera Kurdan a sereke fokisa xwe dane ser lobîû gerî û parastina xebatên wan. Di gel vê yekê, xebatên nîqaşkirina meseleya kurdî di qada giştî de û berbelavkirina çanda aşitiyê bi awayekî qismî hatin kirin di Pêvajoya Çareseriyê de. Li gorî zerfiyet û dijwariya meseleya kurdî, xebatên ku li jor hatin xulasekirin nîşan didin ku beşdarî û tevkariya SCS'yan li Pêvajoya Çareseriyê gelek sînordar bûye. "Civakîkirina aşitiyê", "lokalîzekirina aşitiyê", derbaskirina getoyên siyasî û herêmî bi xebatên ku fokisa wan li ser pêkvebûna komên ciyawaz ên civakî ye; ev hemû ew kar in ku SCS binê wan xêz dikin ku "kêm mane" yan jî "nekarîne bikin".

Nûnerên SCS'yan li ser tevkariya sînordar a SCS'yan li Pêvajoya Çareseriyê, ji aliyekî ve îşaretê didin bi wan kêşeyan ku çavkaniya wan aliyên pêvajoyê ne, ji aliyekî ve jî binê wan kêşeyan xêz dikin ku çavkaniya wan civaka sîvîl bi xwe ye. Kêşeyên bingehîn ku çavkaniya wan dewlet, AK Partî û Tevgera Kurdan a sereke ye, wisa hatin yadaştkirin(notkirin): aliyan SCS li pêvajoyê beşdar nekirin, ew têkiliyên ku li gel civaka sîvîl çêdibûn gelek caran "usûlen" dihatin çêkirin, girtîbûna pêvajoyê li kontrola giştî, neçarkirina SCS'yan ji bo alîgirtinê. Ji aliyê din, kêşeyên bingehîn ku çavkaniya wan civaka sîvîl bi xwe ye pêk tên ji van kêşeyan: alîgirî û peywendiyên siyasî yên civaka sîvîl, mehrûmbûn ji piştgirî û têkiliyên xurt ên civakî, amadekarînekirin ji bo avakirina aşitiya civakî, piştgirînedana SCS'yên mezin û karîger li seranserê welêt li pêvajoyê, xwe-dûrgirtina CHP û SCS'yên di bin bandora wê de ji pêvajoyê û wek dawî jî înîsiyatîf pêşnexistina civaka sîvîl ji ber fikara zererdanê li pêvajoyê.

Bi tena serê xwe helwesta hukumeta AK Partiyê û Tevgera Kurdan a sereke yan jî hewlên sazgehî(institutional) yên van akteran bi xwe, tevkariya akterên civaka sîvîl li çareseriya siyasî ya meseleya kurdî û avakirina aşitiya civakî diyar nake. Bi qasî van hewlan hevpariya sazgehî ya SCS'yan jî xwedî girîngiyê ye. Dema ku peydak(finding)ên lêkolînên qadî li ber çav bêne girtin, dikare binê sê mijarên bingehîn bê xêzkirin. Ya yekem ji wan ev e, cudabûna siyasî/aydolojîk di navbera SCS'yan de. Duyem; hevkariya navbera SCS'yan zêdetir li ser bingeha sektorî/mijarî ye, xebatên navbera sektoran/mijaran ku hev temam dikin sînordar in. Sêyem, cudabûna herêmî di navbera SCS'yan de. Di Pêvajoya Çareseriyê de, li seranserê Tirkiyeyê her

çend hin teşebus hebin bi armanca avakirina piran, lê ev teşebus sînordar mane û bêyî ku encamine wisa girîng bînine pê belav bûne.

Hatiye çavdêrîkirin ku di çarçoveya têkiliyên siyaset û SCS'yan de, paralêl li gel cemserbendiya siyasî ya qada civakî, di civata SCS'yan de jî cemserbendiyeke siyasî ya dijwar heye û ji bilî hin teşebusên sînordar SCS'yan tercîh kirine ku li "taxên xwe yên siyasî" bimînin. Li gorî daneyên lêkolîna qadî, gelek SCS'yan di wexta Pêvajoya Çareseriyê de bi rehetî û gelek caran xwe gihandine akterên siyasî û diyalog danîne. Di gel vê yekê, ev rehetiya heyî di danîna diyalogê de wê yekê nîşan nade ku li Tirkiyeyê di navbera civaka sîvîl û qada siyasetê de gotûbêj û hevkariyeke hêzdar heye, berevajî vê yekê nîşan dide ku bi rêjeyeke mezin têkiliya SCS û siyasetê xwe dispêre "hevhêziya fonksîyonel". Bi gotineke zelaltir, akterên ku bi motîvasyonên wekî hev tev digerin, di qadên ciyawaz de fonksiyonên wisa dibînin ku hev xwedî dikin.

Têkiliya SCS û akadêmiyê di mijara çareseriya siyasî ya meseleya kurdî û avakirina aşitiya civakî de her çend di wexta Pêvajoya Çareseriyê de zindîbûneke girîng bi xwe ve dîtibe jî, lê ji aliyê sazgehî ve ne di asteke girîng de ye. Li rexmî vê yekê, li ber çavan e ku hevkariyeke girîng hate çêkirin di navbera wan akadêmîsyenan de ku xebat kirine di vê mijarê de yan jî nexasim bi awayekî şexsî têkildar in li gel mijarê. Li rexmî têkiliyeke gelek lawaz di navbera SCS û akadêmiyê de, ji aliyê din ve, teqrîben hemû beşdar hemfikr in ku zanîngeh dikarin roleke gelek krîtîk bilîzin di mijara çareseriya meseleya kurdî de.

Di qada têkiliyên SCS û medyayê de, piraniya beşdaran diyar dikin ku desthilatdariyeke dewlet û desthilatdariya siyasî her wekî çawa li ser qada civaka sîvîl heye li ser qada medyayê jî heye. Ji ber vê têkiliya desthilatdariyê, her wekî civaka sîvîl medyaya sereke jî dewlet-tewer û dewlet-navend e. Lewma jî, di meseleya kurdî de medya xwe li gorî pozîsyona dewletê bi cih dike. Bi dirêjahiya Pêvajoya Çareseriyê, ji ber ku hukumeta AK Partiyê kêşe kişande zemîneke siyasî û cara yekem bi awayekî nisbî pêvajoyeke vekirî bo raya giştî bi rê ve bir, medyayê jî piştgiriya vê pêvajoyê kir bi awe-yekî giştî. Medyaya sereke ku piştgiriya Pêvajoya Çareseriyê dikir, heta asteke diyar meydan li ber SCS'yan jî vekir di vê mijarê de. Di gel vê yekê, gava ku hukumeta AK Partiyê helwesteke nerênî wergirt li hember pêvajoyê, medyayê jî xwe da ser vê guhertinê û pozîsyona xwe nû kir. Nexasim piştî hewla derbeya leşkerî ya 15'ê Tîrmeha 2016'an, piraniya mezin a medyaya sereke kete bin kontrol û rêgeha hukumetê.

Di navbera SCS'yan de qebûleke giştî heye ku pêvajoyeke gotûbêj û lev-kirinê bi mebesta çareseriya siyasî ya meseleya kurdî dê ji nû ve dest pê bike. Piraniya beşdaran binê wê yekê xêz dikin ku bijardeyek nîne ji bilî maseyê. Di gel vê yekê, beşdar derpêş dikin ku destpêkirina pêvajoyeke nû ya gotûbêj û levkirinê zehmet e gava ku şert û mercên heyî bêne li-berçavgirtin. Di vê mijarê de, dîrok û xala werçerxanê ku gelek caran tê bibîrxistin, hilbijartinên 2019'an in. Li gorî vê yekê, li gel hilbijartinê tevli-hevî(turbulans)a siyasî dikare bi dawî bibe li Tirkiyeyê. Meseleya kurdî hem di xilaskirina vê tevliheviya siyasî de dikare fonksiyonekê bigire û hem jî piştî ku tevliheviya siyasî bi dawî bû dubare bê rojevê di çarçoveya gotûbêj û levkirinê de. Hinek ji beşdaran, esasen, binê rola akterên siyasî xêz dikin ji bo pêvajoyeke nû; hinek jî diyar dikin ku pêwîst e akterên civaka sîvîl rol bigirin zêdetir ji akterên siyasî.

Beşdar, bi baldan li asteng û derfetên heyî, pêşniyarên ciyawaz pêşkêş dikin ji bo wan tiştên ku dikarin bikin di pêvajoyeke gotûbêj û levkirinê ya muhtemel de. Pêşniyarên ku beşdaran pêşkêş kirin ji bo tiştên ku SCS di-karin bikin, gava ku li ser bingeha heft fonksiyonên SCS'yan di mijara çare-serkirina pevçûnan û avakirina aşitiyê de bêne sinifandin, yên ku herî zêde derdikevine pêş bi dorê ev in: "parêzvanî û ragihandina giştî", "pêkvebûna civakî ya hestyar bo pevçûnan", "navbînkarî û asankarî", "civakîbûna nav-komî û çanda aşitiyê", "şopandin û berpirsiyarî-qebûlî" û "pêşkêşkirina xizmetê bi awayekî rasterast". Fonksiyona "parastina hemwelatiyan" ku di nav van heft fonksiyonên civaka sîvîl de ye, tê dîtin ku SCS'yan ew wek qadeke krîtîk nenirxandiye.

## DESTPÊK

Pêla nû ya şîdetê ji Tîrmeha 2015'an ve berdewam dike di meseleya kurdî de. Pêvajoya Çareseriyê ya 2013-2015'an, ku hêviyên mezin çêkiribûn li ba raya giştî di mijara xilasbûna pevçûnan û avakirina aşitiya civakî de, piştî Hilbijartinên Giştî yên 07'ê Hezîrana 2015'an bi dawî hat. Pevçûnên ku di dawiya meha Tîrmehê de ji nû ve dest pê kirin, cuda ji yên berê, li deverên bajarî gurr bûn û di nav du salên dawî de bû sedema gelek kuştî, xirapkariyên sosyo-êkonomîk û mekanî ku ne mumkun e bêne qiyaskirin li gel berê. Li gorî hejmarên fermî, di nav du salan de, nêzîkî 11.000 kesî canê xwe ji dest da.[1] Ji aliyê din; bajarên dîrokî, Sûr-Amed û Cizîr-Şirnex jî tê de, li 11 navçeyan xirapkariyên gelek mezin qewimîn û nîv mîlyon kes neçar man ku terka mala xwe bidin.[2] Di vê demê de, destgîrkirina parlementer û şaredaran, te'yînkirina qeyyûman nêzîkî li sed şarderiyan Şarederiya Bajarê Mezin a Amed, Mêrdîn û Wanê jî tê de, girtina bi dehan SCS'yên hestyar bo meseleya kurdî û her wiha girtina saziyên medyayê derbeyeke mezin weşande wê ezmûnê ku hem li qada civaka sîvîl û hem jî li qada siyasî hatibû ser hev. Bidawîkirina pevçûnan di meseleya kurdî de, peydakirina çareseriyeke siyasî bo meseleyê û avakirina aşitiya civakî îro gelek dijwartir e li gorî berî Pêvajoya Çareseriyê.

Civaka Tirkiyeyê hê ew şoka zelzeleya sosyo-polîtîk derbas nekiribû, ku pevçûnên nav-bajaran ku encamên gelek giran pêk anîbûn bûbû sedema wê, bi teşebusa derbeya leşkerî ya 15'ê Tîrmeha 2016'an cara duyem hejaneke siyasî û civakî derbas kir. Bi derketina hemwelatiyan bo qadan û bi

**1** Li gorî daneyên ajansa nûçeyan a fermî ya dewletê Anadolu Ajansi; di wan opêrasyonan de ku ji Tîrmeha 2015'an heta Çileya 2017'an li nav welêt û li derveyî welêt hatine encamdan, 823 peywirdarên ewlehiyê û 343 hemwelatiyên sîvîl canê xwe ji dest dane û nêzîkî 10.000 endamên rêxistinê jî yan jiyana xwe ji dest dane yan jî bi awayekî ciddî birîndar bûne. Okur, Yunus, "Terör örgütü PKK'ya 557 günde ağır darbe," *Anadolu Ajansı,* 31.01.2017, http://aa.com.tr/tr/turkiye/teror-orgutu-pkkya-557-gunde-agir-darbe/738313, dîroka destgihîştinê: 11.05.2017. Ji aliyê din, li gorî daneyên Komeleya Mafên Mirovan, di navbera Tîrmeha 2015 û Cotmeha 2017'an de teqrîben 3.000 kesî jiyana xwe ji dest daye.

**2** United Nations, *Report on the human rights situation in South-East Turkey: July 2015-December 2016,* United Nations Human Rights Office of the High Commissioner, New York, February 2017, http://www.ohchr.org/Documents/Countries/TR/OHCHR_South-East_TurkeyReport_10March2017.pdf, dîroka destgihîştinê: 26.04.2017.

berxwedana akterên siyasî, cara yekem li Tirkiyeyê hewleke leşkerî hate astengkirin ji aliyê birêveberiya sîvîl ve. Mixabin ev rewş, ku ji bo dîroka demokrasiya Tirkiyeyê derfetên gelek girîng afirandin, sûd jê nehate wergirtin ji bo derbaskirina cemserbendiyên siyasî yên salên dawîn û ji nû ve avakirina aşitiya civakî. Di çarçoveya praktîkên Rewşa Awarte de, ku piştî teşebusa derbeyê dest pê kir û piştî 15 mehan cara pêncem ji bo sê mehan hate dirêjkirin, paşxistina huqûqê, girtina bi hezaran Saziyên Civaka Sîvîl ên muxalif û saziyên medyayê, destgîrkirina zêdetir ji sed rojnamegerî, îxrackirina akadêmîsyenên muxalif ku ne têkildar in li gel teşebusa derbeyê, bû sedema texrîbatê di kevneşopiya demokrasiya Tirkiyeyê de di serî de di mafê ra-derbirîn û rêxistinbûnê de ku sererastkirina wê zehmet e.

Li aliyekî li qada sosyo-polîtîk zelzeleyeke mezin diqewimî li Tirkiyeyê, li aliyê din şikestinên girîng rû didan di hevkêşeya jêopolîtîk a meseleya kurdî de. Li erdnîgariya kurdan li bakurê Sûriyê, bi rêberiya Partiya Yekîtiya Demokratîk – PYD'ê ku rêxistineke "birader" a Koma Civakên Kurdistanê – KCK'ê ye, herêma *de facto* otonom a kurdan wek erdnîgarî bi awayekî girîng berfireh bû. Bi piştgiriya Rûsye û kurdên Sûriyê hem di qada leşkerî hem jî di qada siyasî de pêşketinên girîng tomar kirin. Ev rewş, nexasim di têkiliyên Tirkiye û Dewletên Yekbuyî yên Emerîkayê (*DYE*) de bû sedema qeyranên wisa ku berî niha çênebûbûn. Ji aliyê din ve, li Herêma Kurdistana Iraqê ku ji 2003'yan ve li Iraqê wek dewleteke nîv-serbixwe lê hatibû, lêgerînên serxwebûnê di vê demê de zêde bûn. Di 25'ê Îlona 2017'an de hem li parêzgehên Dihok, Hewlêr û Silêmaniyê û hem jî li wan herêmên nîqaş-liser wekî Kerkûkê "Giştpirsiya Serxwebûnê" hate lidarxistin li rexmî wan daxwazên "betalkirin" û "paşxistinê" ku hem ji hêzên cîhanî yên wekî DYE, Rûsyayê û hem jî ji welatên cîran ên wekî Tirkiye û Îranê hatibûn kirin. Di giştpirsiyê de teqrîben ji %72'yê dengderan beşdar bûn û bi rêjeya %92,73 deng dan dengê "Belê"yê.[3]

Dînamîkên ku li jor hatin xulasekirin nîşan didin ku wek civak em gihîştine çerxerêyeke girîng di meseleya kurdî de li Tirkiyeyê. Di çarçoveya sînor-derbas(cross-border) de, di demekê de ku qada kurdan[4] şemitok û şikestinbar e, Tirkiye yan ê meseleya kurdî bi rêyên aşitiyane-demokratîk çareser bike û bibe giraveke demokrasî, aşitî û îstîqrarê li navçeyê ku her roj dikeve nav xumamiyekê; yan jî dê wek parçeyekî bimîne ji vê xumamî û wan pevçûnan ku ev xumamî dibine sedem.

**3** Rudaw, "Resmi Sonuç – Yüzde 92.73 Evet", 27.09.2017, http://www.rudaw.net/turkish/kurdistan/270920177, dîroka destgihîştinê: 12.10.2017.

**4** Ez têgeha "qada kurd" (*escape kurde*) yan jî "meydana kurd" (*sphere kurde*) ji Jean-François Pérouse bi deyn werdigirim û bi kar tînim. Ev têgeh balê dikêşine ser sînorên cografî, çandî, aborî û polîtîk ên guherbar û şikestinbar ên mobîlîzasyona kurdan. Pérouse, Jean-François, di nav "Reposer la 'question kurde',", Semih Vaner (Dîr.), *La Turquie,* Parîs Fayard, 2005, 357-387.

Hewlên ji bo çareseriya siyasî ya meseleya kurdî û hiştina şîdetê li derveyî rojevê, ji serê 1990'î ve dest pê kiriye. Piştî wan lêgerînên lawaz ên diyalogê di salên 1990'î de, Pêvajoya Îmraliyê ya 1999-2004'an, Pêvajoya Osloyê ya 2008-2011'an û ya dawî jî Pêvajoya Çareseriyê ya 2013-2015'an jî tê de sê tecrubeyên girîng ên diyalogê çêbûn. Di gel vê yekê, teqrîben li rexmî rabirdûyeke 25 salî, li Tirkiyeyê bidawîkirina pevçûnan û avakirina aşitiya civakî pêk nehat.

Pevçûnên nav-welatî ku li cîhanê di wext û cihên ciyawaz de qewimîne nîşan didin ku bidawîkirina pevçûnan û avakirina aşitiya civakî bi tena serê xwe bi wan pêvajoyên diyalog û gotûbêjên navbera akteran çareser nabe ku rasterast beşdar in li pevçûnan. Ew her sê pêvajoyên diyalogê yên 1999 û 2015'an jî ku li Tirkiyeyê çêbûn vê rewşê piştrast dikin. Bi qasî akterên ku pev diçin, pêvajoyên diyalog û levkirinê yên navbera wan akteran jî xwedî girîngiyê ne ku di çînên ciyawaz ên civakê de cih digirin, bi gotineke din akterên ku di qada civaka sîvîl de ne. Xebatên "avakirina aşitiya civakî" fonksiyoneke krîtîk digerîne di xilaskirina pevçûnên nav-welatî de ku mebesta wan derbaskirina wan meseleyan e ku ji ber pevçûnan di qadên wekî êkonomîk, civakî, çandî, siyasî û saykolojîk de çêbûne.

Armanca vê lêkolînê ew e ku pozîsyon û zerfiyeta Saziyên Civaka Sîvîl (SCS) a ji bo xilaskirina pevçûnan di meseleya kurdî de û avakirina aşitiya civakî enelîz bike û pêşniyaran diyar bike ji bo polîtîkayan hem ji bo civaka sîvîl hem jî ji bo akterên siyasî. Di vê çarçoveyê de, nirxandinê li ser xebatên çareserkirina pevçûnan û avakirina aşitiya civakî yên SCS'yan dike di Pêvajoya Çareseriyê ya 2013-2015'an de. Cih û rola SCS'yan dîsan bi çavê SCS'yan enelîz dike hem di Pêvajoya Çareseriyê ya têkçûyî de hem jî di pêvajoya gotûbêjeke muhtemel de.

Wek rêbaza lêkolînê *qualitative research technique* hatiye bikaranîn. Di navbera 15'ê Gulanê û 30'yê Tîrmeha 2017'an de li gel 45 SCS û sê pisporan li Amed, Wan, Stenbol û Enqereyê *semi-structured interview technique* hate encamdan. Gava ku sazî hatin hilbijartin, li ser bingeha heft fonksiyonên bingehîn ên SCS'yan ji bo çareserkirina pevçûnan û avakirina levkirinê, esasen ew SCS hatin tercîhkirin ku di Pêvajoya Çareseriyê de yek ji wan fonksiyonan yan jî hinek ji wan fonksiyonan bi cih anîne. Xebat hate kirin ji bo hevdîtinkirina li gel wan SCS'yan ku di Pêvajoya Çareseriyê de xebat kirine; bi heman awayî xebat hate kirin ji bo hevdîtinkirina li gel wan saziyan ku di qadên ciyawaz de xebatan dikin û xwedî motîvasyoneke ciyawaz a sosyo-polîtîk in. Bi mebesta rengvedana dengê wan qadên kurdan ku pevçûn lê gurr bûne, bajarên Amed û Wanê hatin hilbijartin ku wek mêtropolên herêmî ne. Bi mebesta têgihîştina meyla giştî li seranserê Tirkiyeyê jî, du bajarên sereke Stenbol û Enqere hatin tercîhkirin ku xwedî

zerfiyeteke wisa ne ku bandorê li seranserî welêt dikin û xebatên civaka sîvîl li van bajaran gurr bûne.

Encamên lêkolînê di bin şeş beşan de hatine sinifandin. Di beşa yekem de, çarçoveyeke têorîk hatiye pêşkêşkirin li ser rola SCS'yan di bidawîkirina pevçûnên nav-welatî û pêvajoyên levkirinê de. Di beşa duyem de, cihê SCS'yan hatiye gotûbêjkirin di çarçoveya wan hewlên diyalog û levkirinan de ku ji 1990'î ve berdewam dikin. Di vê çarçoveyê de, profayleke wan SCS'yan hatiye derxistin ku li Tirkiyeyê li ser avakirina aşitiya civakî û bidawîkirina pevçûnan, ku çavkaniya wê meseleya kurdî ye, xebatan dikin. Di beşa sêyem de, rola SCS'yan di Pêvajoya Çareseriyê de tê enelîzkirin bi awayekî rasterast. Mijara vê beşê pêk tê ev in: SCS'yan bi dirêjahiya Pêvajoya Çareseriyê çi kirine, çi nekirine û ew dînamîkên bingehîn çi ne ku SCS sînordar kirine ji bo beşdarbûn li pêvajoyê. Di beşa çarem de, hevkariya sazgehî ya SCS'yan tê nirxandin. Di vê çarçoveyê de, têkiliyên SCS'yan li gel saziyên siyaset, akadêmî û medyayê hatine nirxandin. Di beşa pêncem de, bi çavê nûnerên SCS'yan ew astengên bingehîn û derfetên pêvajoyeke nû ya gotûbêj û levkirinê hatine nirxandin ji bo çareseriya meseleya kurdî, bidawîbûna pevçûnan û avakirina aşitiya civakî. Di beşa dawîn de, ji aliyekî ve ew peywend hatiye vekolîn ku SCS tê de ne, ji aliyê din ve jî pêşniyarên polîtîkayan ji bo akterên siyasî hatine pêşkêşkirin ka divê çi bikin gava ku gotûbêjan dîsan dest pê kir ji bo ku ev sazî bikarin karîgertir rola xwe bilîzin.

# 1. CIVAKA SÎVÎL Û AVAKIRINA AŞITIYÊ: ÇARÇOVEYEKE TÊORÎK

Xebatên ku li ser çareserkirina pevçûnan û avakirina aşitiya civakî hatine kirin, nîşan didin ku SCS dikarin roleke girîng bilîzin di pêvajoyên bi vî rengî de.[5] Di gelek bûyeran de ji nû ve avakirina aşitiya civakî û bidawîkirina wan pevçûnan, ku di serî de li qadên siyasî, êkonomîk, civakî, çandî, mekanî û li gelek qadên din bûne sedema xirapkariyeke girîng, zehmet e ku tenê bi wan gotûbêjan bê pêkanîn ku di navbera wan akteran de tên birêvebirin ku pev diçin. Di gelek qadan de çareserkirina wan pevçûnan ku bûne sedema meseleyên ciyawaz û tevlihev û her wiha pêwîstiya çareserkirina xirapkariyên wan bi têkilîdanîneke civakî, gotûbêj û levhelalbûneke pir-astî û pir-akterî heye.

## 1.1. Astên Pêvajoyên Gotûbêjan

J. P. Lederach, yek ji wan kesan e ku di mijara çareserkirina pevçûnan û avakirina aşitiya civakî de derdikeve pêş,  di berhema xwe de ya bi navê *Building Peace: Sustainable Reconciliation in Divided Societies*[6] pêvajoyên gotûbêjan ji bo avakirina aşitiya civakî û akterên wan pêvajoyan di sê astan de kombend dike: pêşengiya asta bilind, pêşengiya asta navincî û pêşengiya di asta civakî de. Li gorî vê yekê, ew gotûbêjên ku di çarçoveya pêşengiya asta bilind de bi rê ve diçin, di navbera pêşengên leşkerî, siyasî yan jî dînî de pêk tên ku di asteke bilind de xwedî bijaretiyekê ne. Di van gotûbêjan de ku di asta bilind de pêk tên, esasen mijarên wekî agirbestê tên gotûbêjkirin û dîsan tenê ji aliyê navbînkarekê ve tên birêvebirin ku xwedî bijaretiyeke payebilind e. Gotûbêjên bi pêşengiya asta navincî van kesayetan vedihewîne: birêveberên rêzdar ên sektorên cuda, pêşengên êtnîk û dînî, akadêmîsyen, rewşenbîr û navên ku di qada civaka sîvîl de derdikeven pêş. Gotûbêjên ku di vê astê de tên birêvebirin ji xebatên wekî komxebatên çareserkirina meseleyan, perwerdehiya çareserkirina pevçûnan, komîsyonên aşitiyê, xebatên hundur yan jî jêr-komîsyon pêk tên. Wek dawî, pêşengên di asta civakî de pêk tên ji pêşengên di asta civakî de yên


**5** Daşlı Güneş, Alıcı, Nisan ve Flader, Ulrike, *Kadınların Barış Mücadelesinde Dünya Deneyimleri: Sırbistan, Kosova, Sri Lanka ve Suriye,* Ankara: DEMOS Weşana Demokrasi Barış ve Alternatif Politikalar Merkezi Derneği, 2017; Çelik, A. Betül, di nav "Etnik Çatışmaların Çözümünde Siyaset Bilimi ve Uyuşmazlık Çözümü Yaklaşımları,", F. Nimet Beriker (brhv.), Çatışmadan Uzlaşmaya: Kuramlar, Süreçler ve Uygulamalar, İstanbul, Weşanên İstanbul Bilgi Üniversitesi, 2010, 163-188.

**6** Lederach, John Paul, *Building Peace: Sustainable Reconciliation in Divided Societies,* Washington, D.C., United States Institute of Peace Press, 1999, rp. 39.

wekî birêveberên SCS'yan, rûspî û birêveberên saziyên wekî perwerde û tendirustiyê ku xizmeta giştî pêşkêş dikin. Di şeklê 01'ê de ew modêl hatiye nîşandan ku ji aliyê Lederachî ve hatiye pêşxistin.

Her çend modêlê ku Lederach pêş xistiye çarçoveyeke sabît pêşkêş dike û derfetê nade ku têkiliya dînamîk a navbera akterên sê-astî bê famkirin, lê xwedî girîngiyekê ye ji ber ku nîşan dide ku çareserkirina pevçûnan û avakirina aşitiya civakî pir-astî û pir-akterî ye. Her wiha, modêl, bi baldan li mezinahiya nufûsê, nîşan dide ku têkilîdanîna civakî û gotûbêjên bi pêe şengiya asta navincî û asta civakî bi qasî wan xebatên aşitiyê girîng in ku di qada pêşengiya asta bilind de tên birêvebirin. Lewma cext(kirpandin)ê li ser girîngî û rola wan akteran dike ku di xebatên çareserkirina pevçûnan û avakirina aşitiya civakî de di asta navincî û asta civakî de cih digirin.

Şekl 01: Nêzîkbûnên Avakirina Aşitiyê û Akter




**Çavkanî:** Lederach, John Paul, *Building Peace: Sustainable Reconciliation in Divided Societies,* Washington, D.C., United States Institute of Peace Press, 1999, rp. 39.

Jinavbirina wan tirs û xetereyan ku di wexta pevçûnan de derketine, guhertina îdraka komên ciyawaz ên civakî û çareserkirina cemserbendiyên civakî, bi kurtî avakirina “aşitiya civakî” girêdayî ye bi civakîkirina pêvajoya çareserkirina pevçûnan û levkirinê;[7] her wiha girêdayî ye bi avakirina levkirina civakî[8]. Her wekî ku di vê nêrînê de jî tê dîtin ku ji aliyê Lederachî ve hatiye pêşxistin, SCS, ku akterek in ji wan akterên krîtîk çi di xebatên asta navincî de û çi jî di xebatên asta civakî de, roleke girîng di avakirina levkirina civakî de dilîzin.

Ji aliyê din, ew tecrubeyên ku di van salên dawîn de derketine, nîşan didin ku SCS dikarin roleke krîtîk di pêşengiya asta bilind de jî bilîzin. Bo nimûne, li Fîlîpînê li ser herêma Bangsamoroyê pevçûnên ku bi dehan salan di navbera hukumet û Bereya Rizgariya Îslamî ya Moroyê (*Moro Islamic Liberation Front – MILF*) de rû dan û bûn sedema mirina zêdetir ji 100.000 mirovî, bi navbînkariya pêkhateyeke têkel ji dewlet-SCS’yan bi daxilbûna dewletên Îngîlistan, Japonya, Erebistana Su’udî û Tirkiyeyê di gel çar SCS’yên navneteweyî bi dawî bûn. Çavkaniyên Levanînê navend-London (*Conciliation Resources*), Navenda Diyaloga Mirovî navend-Cenêv (*Center for Humanitarian Dialogue*), Cimeeta Mihemediye navend-Êndonêzya û Cimeeta Sant’Egidio navend-Rome (*Community of Sant’Egidio*) tevkariyeke girîng pêşkêşî Pêvajoya Çareseriyê ya Fîlîpînê kirin.[9] Koma Temasê ya Navneteweyî (*International Contact Group*) ku li Fîlîpînê hate pêkanîn, bi “mekanîzmeke têkel ji dewlet û akterên xeyrî-dewlet ku pêkve tê de cih digirtin û berî niha jî şibhê wê nînbûn”[10] rêfêranseke girîng di xebatên aşitiyê de pêk anî. Li Fîlîpînê di qonaxa çavdêrîkirina peymanê de jî SCS’yan roleke krîtîk lîst û dilîzin. “Tîma Çavdêriyê ya Aliyê Sêyem” (*Third-Party Monitoring Team* – TPMT) ku tê de ji Tirkiyeyê Weqfa Maf û Azadiyên Mirovan û Alîkariya Mirovî[11] jî heye, berpirsiyar e ji çavdêrîkirina guncawbûna wan gavan li peymanê ku alî dê piştî peymanê biavêjin û her wiha berpirsiyar e ji raporkirina wan. TPMT bi serokatiya aktereke/î bêlayen î navneteweyî, ji SCS’yeke xwecihî û navneteweyî pêk tê ku ji aliyê dewlet û MILF’ê ve hatine pêşniyarkirin.[12]

---

**7** Çelik, A. Betül ve Mutluer, Nil, di nav “Toplumsal Barış ve Barış Süreci’nin Toplumsallaşması,”: Necmiye Alpay & Hakan Tahmaz (brhv.), *Barış Açısını Savunmak. Çözüm Sürecinde Neler Oldu?,* İstanbul, Metis Yayınları, 2015, 59-75.

**8** Çelik, A. Betül, di nav “Kürt Meselesini Dönüştürmede Toplumsal Mutabakat İhtiyacı: Neden, Nasıl, Kimle?,”: Murat Akbaş (brhv.), Çatışma Çözümleri ve Barış, İstanbul, İletişim Yay., 2014, 131-152.

**9** Democratic Progress Institute (DPI), *Briefing: International Contact Group for the Southern Philipines Peace Process,* Democratic Progress Institute, 2014; Söylemez, Hatice, *Moro: Uzakdoğu’da Bir Bağımsızlık Mücadelesi,* İstanbul, İHH İnsani ve Sosyal Araştırmalar Merkezi, 2016, jimareya rp. 146-148.

**10** Democratic Progress Institute (DPI), *‘Çatışma Çözümünde Filipinler Deneyimi’ Konulu Karşılaştırmalı Çalışma Ziyareti Raporu,* Londra, Democratic Progress Institute, 2016, rp. 20.

**11** DPI, age., rp. 40; Söylemez, Age., jimareya rp. 151-152.

**12** DPI, age., rp. 40.

Her wekî li Fîlîp-Bangsmoroyê, di pevçûnên Êndonêzya-Açeyê de jî civaka sîvîl roleke krîtîk lîst di qada pêşengiya asta bilind de. Li ser pevçûnên 30 salî li Êndonêzyayê, bi navbînkariya Înîsiyatîfa Birêvebirina Qeyranê (*Crisis Management Initiative* - CMI) ku bi pêşengtiya kevneserokê Fînlandê Martti Ahtisaari hate avakirin û SCS'yeke navneteweyî ye, di encama pêvajoya hevdîtinên pênc dewran de levkirin pêk hat.[13] Her wiha, prênsîba "di tu mijarekê de levhatin bi awayekî rasteqîne çênabe heta ku di her mijarê de levhatin çênebe" ku ji aliyê Athisaari ve hate pêşxistin, bû rêfêranseke girîng di xebatên aşitiyê de. Ahtisaari, nêrîna "zindî-hiştina pêvajoya gotûbêjan" ya "têoriya pisîklêtê" bi prênsîba jorê xiste pratîkê ku ev têorî ji aliyê nûnerê hukumeta Tony Blairî J. Powelî ve, ku hemû pêvajoya aşitiyê ya Brîtanya-Îrlenda Bakurî rasterast bi rê ve dibir, hatibû formîlekirin.[14] Li gorî vê yekê, ew ciyawaziyên levneker ku di navbera pozîsyonên aliyan de hene, bi zindî-hiştina pêvajoya gotûbêjan dikarin bêne çareserkirin û vê prênsîbê ev zindîbûn pêk aniye.[15]

Bi kurtî, di her sê astan de jî SCS roleke girîng di çareserkirina pevçûnan û avakirina aşitiyê de dilîzin. Jê zêdetir, ew tecrubeyên pêvajoya aşitiyê ku SCS van salên dawîn li wan beşdar bûne, di mijara çareserkirina pevçûnan û avakirina levkirinê de rêfêranseke girîng pêk tînin.

## 1.2. Heft Fonksiyonên SCS'yan di Çareserkirina Pevçûnan de

T. Paffenhon û C. Spurk, ku li ser rola SCS'yan di avakirina levkirina civakî de dixebitin, binê heft fonksiyonên van rêxistinan xêz dikin: (1) parastina hemwelatiyan, (2) şopandin û berpirsiyarî-qebûlî, (3) parêzvanî û ragihandina giştî, (4) civakîbûna nav-komî û çanda aşitiyê, (5) pêkvebûna civakî ya hestyar bo pevçûnan, (6) navbînkarî û asankarî û (7) xizmetkirin yan pêşkêşkirina xizmetê bi awayekî rasterast.[16]

**13** Aspinall, Edward, *The Helsinki Agreement: A More Promising Basis for Peace in Aceh?,* Policy Studies No. 20, Washington, D.C., East-West Center, 2005.

**14** Powel, Jonathan, *Teröristlerle Konuşmak: Silahlı Çatışmalar Nasıl Sona Erdirilir?,* İstanbul: Aykırı Yayıncılık, 2014.

**15** Aspinal, age., jimareya rp. 22-23.

**16** Paffenholz, Thania & Spurk, Christoph, "Civil Society, Civic Engagement, and Peacebuilding," *The World Bank Social Development Papers: Conflict Preventation and Reconsturciton,* , Paper No. 36, Washington, DC, October 2006; Paffenholz, Thania & Spurk, Christoph, di nav "A Comprehensive Analytical Framework,", Thania Paffenholz (ed.) *Civil Society and Peacebuilding: A Critical Assessment,* Boulder, Lynne Rienner Publishers, 2010, 65-76. Di nav vê berhemê de, li ser bingeha heft fonksiyonên bingehîn ên SCS'yan hedîseyên Guatemala, Îrlenda Bakur, Bosna Hersek, Tirkiye, Qibris, Îsraîl/Filîstin, Efxanistan, Nêpal, Srî Lenka, Somalî û Nîjêrya bi kûrahî tên gotûbêjkirin. Xebata ku Ayşe Betul Çelikê li ser Tirkiyeyê kiriye, enelîzeke girîng pêşkêş dike li ser rola SCS'yan di mijara bidawîkirina pevçûnan –ku ji ber meseleya kurdî derketine- û avakirina aşitiya civakî de; her wiha enelîzeke girîng dike li ser kîjan fonksiyon di çi astê de pêş ketiye û divê çi bên kirin. Bnr.: Çelik, A. Betül, di nav "Turkey: The Kurdish Question and the Coersive State,", Thania Paffenholz (Ed.)*, Civil Society and Peacebuilding: A Critical Assessment*, Boulder, Lynne Rienner Publishers, 2010, 153-179.

*Parastina hemwelatiyan*; di wexta pevçûnan de parastina jiyan, azadî û milkiyeta hemwelatiyên sîvîl li hember dewlet û otorîteyên xeyrî-dewlet li xwe digire. Di vê çarçoveyê de ji bo xebatên ku derdikevin pêş wek nimûne ev dikarin bêne anîn: pêkanînan herêmên aşitiyê yên çek ne tê de, rakirina mînan, parastina hemwelatiyan, bêçekkirina leşkerên zarok û beşdarkirina wan li nav jiyana civakî.

Fonksiyona *şopandin û berpirsiyarî-qebûlî* çavdêrîkirin û tesbîtkirina xebatên dezgeha dewletê -di serî de-, hukumetê û akterên pevçûnan li xwe digire. Bo nimûne, tesbîtkirina pêşêlkariya mafên mirovan ên ji ber pevçûnan û berpirsiyarên wan; ji akterên têkildar daxwazkirina mecbûrbûn bo hesabdanê di çarçoveya vê fonksiyonê de dikare bê nirxandin.

Fonksiyona *parêzvanî û ragihandina giştî* xebatên pêşkêşkirin û belavkirina zanyariyên li ser pevçûnan bo raya giştî bi liberçavgirtina berjewendiyên giştî û hemwelatiyan –nexasim yên komên vederkirî- li xwe digire. Di vê mijarê de nimûneyên wiha dikarin bên anîn: kempeniyên zêdekirina agahdariya civakî li ser mirina zarokan ji ber pevçûnan, liv û tevgera cemawerî yan jî xebatên lobîgeriyê li gel akterên siyasî ji bo ji nû ve destpêkirina hevdîtinan.

Fonksiyona *civakîbûna nav-komî* wan xebatan li xwe digire ku SCS'yan ji bo belavkirina çanda aşitiyê di nav komên civakî yên ciyawaz de kirine. Di vê mijarê de, behsa xebatên wiha dikare bê kirin: diyaloga navbera ciyawaziyan, çêkirina bername/rêzefîlmên têlevîzyonî yan jî radyoyî li ser mijara pêkvejiyanê, şanoyên nav-kuçeyan, çalakiyên werzişî, mîhrîcanên mûzîkê yan jî paqijkirina kitêbên dibistanan ji fikrên cudaker.

Fonksiyona *pêkvebûna civakî ya hestyar bo pevçûnan* wan xebatan li xwe digire ku ji bo danîna jêrxanekê tên kirin ji bo ku beşên ku pev diçin bikarin wek hemwelatiyên wekhev bijîn di civakê de. Ev fonksiyon esasen fokisa xwe dide ser wan çalakiyên hevpar ku di navbera komên dijmin ên kevn û nû de tên kirin. Ev nimûne di çarçoveya hemahengiya civakî de dikarin bên dayîn: levcivandina wan kesan ku xwedî fikrên siyasî yên dijîhev in, levcivandina malbata wan kesên jiyana xwe ji dest dane ku di aliyên cuda yên pevçûnan de cih girtine yan jî teşebusên hevpar bo aşitiyê ku ji aliyê van malbatan ve hatine kirin.

Fonksiyona *navbînkarî û asankariyê,* wan xebatan li xwe digire ku ji bo pêşvebirina diyalogê di asta xwecihî û neteweyî de di navbera wan komên ciyawaz ên civakî de tên kirin ku piştgiriya wan koman dikin ku pev diçin. Wek nimûne ev xebat dikarin bêne dayîn: teşebuskirin ji bo serbestberdana wan leşkeran ku hatine ragirtin, ragihandina agirbestê yan jî hevdî-

tinkirin li gel akterên pevçûnan ji bo rojên bêşîdet, wek çavdêr daxilbûn li pêvajoya diyalog û gotûbêjan ku di navbera akterên pevçûnan de bi rê ve diçin.

Wek dawî, fonksiyona *dabînkirina xizmetan*, wan xizmetan li xwe digire ku di wexta pevçûnan de yan jî piştî pevçûnan ji bo mexdûran di qadên wekî civakî, bijîşkî, huqûqî, êkonomîk û hwd. de tên pêşkêşkirin. Xizmet dikare di qadên curbecur de bê pêşkêşkirin; ji alîkariya xorakê ji bo wan kesan ku ji ber pevçûnan ji cihên xwe bûne bigire heta piştgiriya huqûqî yan jî saykolojîk, her wiha bi awayekî rasterast pêşkêşkirina xizmeta tendirustiyê ji bo wan kesan ku rastî şikenceyan hatine.

Li ser bingeha wê çarçoveya têorîk ku li jor hatiye xulasekirin, rola SCS'yan di xilaskirina pevçûnan –ku ji ber meseleya kurdî li Tirkiyeyê derketine- û avakirina levkirina civakî de hatiye enelîzkirin.

## 2. CIVAKA SÎVÎL Û ÇARESERKIRINA PEVÇÛNAN LI TIRKIYEYÊ

Li ba  piraniya beşdaran fikra hevpar ew e ku li Tirkiyeyê qada civaka sîvîl sînordar e û akterên civaka sîvîl lawaz in. Li gorî vê yekê, liv û tevgera qada civaka sîvîl li Tirkiyeyê bi taybetî di salên 1990'î de derketiye meydanê û zindîbûna sereke bi salên 2000'î re hatiye pêş. Di gel vê yekê; li hember meseleya kurdî ku teqrîben du sedsal temenê wê heye, qada civaka sîvîl gelek teng e û bandora wan SCS'yan gelek sînordar e ku li ser mijarê xwedî ezmûneke têr nînin.

### 2.1. Profayla Civaka Sîvîl

Mijara yekem ku divê binê wê bê xêzkirin ew e ku têgeha "saziyên civaka sîvîl" li Tirkiyeyê bi wateyeke gelek êlastîk û vehewîner tê bikaranîn. Li gorî rapora *Verilerle Sivil Toplum Kuruluşları* [Saziyên Civaka Sîvîl bi Daneyan] ku Yaşama Dair Vakifê (YADA) di sala 2015'an de amade kiriye, li Tirkiyeyê 108.712 komele, 4.968 weqf, 118 sêndîkayên karkeran, 83 sêndîkayên peywirdarên giştî, 20 sêndîkayên kardêran, 4.794 ode û 8.575 koopêratîf tê de bi giştî 126.730 SCS hene.[17] Nîqaş berdewam in li ser wê yekê ka mumkun e ku li ser bingeha krîtêrên armanc-neqezenc, têkiliyên li gel dewletê û dildariyê ode, saziyên pîşeyî, sêndîka, rêxistinên kardêran, koopêratîf wek SCS bêne qebûlkirin yan na. Di gel vê yekê; tenê bi baldan li komele û weqfan, zêdetir ji 113 hezarî SCS hene li Tirkiyeyê. Her çend hejmareke zêde ya SCS'yan hebe jî, gava ku nufûsa welêt û hejmara SCS'yên welatên pêşkeftî li ber çavan bê girtin, dikare bê gotin ku Tirkiyeyê di qada civaka sîvîl de pêşveçûneke sînordar tomar kiriye.[18]

Gava ku SCS ji aliyê fonksiyonên wan ve bêne sinifandin, tê dîtin ku li Tirkiyeyê SCS'yên ku li ser bingeha mafî dixebitin gelek kêm in. SCS'yên hembajariyan bi armanca civakîbûn û hevgirtinê bi rêjeya %17,2; SCS'yên ku bi piranî fokisa xwe didine ser xebatên çêkirina îbadetxaneyan, çêkirin, jiyandin û ciwansaziyê bi rêjeya %11,4; SCS'yên ji bo çalakiyên hobî, civakîbûn û danîna tora civakî bi rêjeya %10,7; yaneyên werzişê bi rêjeya %8,4; SCS'yên ji bo xêrxwaziyê bi rêjeya %5,3 ne.Lê belê rêjeya SCS'yên ku di qa-

**17** Yaşama Dair Vakıf YADA, *Verilerle Sivil Toplum Kuruluşları,* Ankara, 2015, rp. 42.

**18** YADA, age., rp. 43.

dên çêkirina agahdariyê û parêzvaniya mafan de xebatan dikin bi rêjeya %3,3 sînordar in û di rêza herî jêr de cih digirin.[19] Li gorî sinifandineke din ku li ser bingeha komele û weqfan hatiye kirin, %65'ê komeleyên li Tirkiyeyê, pêk tên ji komeleyên pîşeyî û komeleyên hevgirtinê, komeleyên têkildar li gel werzişê û komeleyên ku ji bo pêkanîna xizmetên dînî xebatan bi rê ve dibin.[20] Ji aliyê din ve, di nav 4.968 weqfan de rêjeya wan saziyan ku di qadên perwerde, civakî, alîkarî û xizmetên civakî de xebatan dikin li hindav %69'an e. Rêjeya weqfên ku di qadên huqûq, mafên mirovan û demokrasiyê de xebatan dikin tenê %0,54 e.[21]

Divê bê diyarkirin ku piraniya mezin a SCS'yên ku bi hejmareke sînordar di qada parêzvanî yan jî xêrxwaziyê de xebatan dikin, li ser meseleya kurdî û avakirina aşitiya civakî xebat nekirine. Bi gotina beşdarekî, li Tirkiyeyê SCS di mijara meseleya kurdî de du komên sereke pêk tînin: Ewên ku hewl didin ji bo çareseriya siyasî ya meseleya kurdî û yên ku meseleyê wek meseleya "têror"ê dibînin. Li gorî vê yekê, SCS'yên ku koma yekem pêk tînin jixwe ji kêmîneyeke gelek biçûk pêk tên. Beşdarek, ku li ser SCS'yan lêkolînan dike, ji vê rewşê wiha behs dike: "Meseleya kurdî li Tirkiyeyê, meseleyek e ku wan saziyên civaka sîvîl eleqedar nake ku ne saziyên mafên mirovan in; yan jî meseleyeke wisa ye ku ew SCS pê re eleqedar nabin."

Bi rastî, gava ku li qadê bê nêrîn tê dîtin ku hejmareke sînordar a wan SCS'yan heye ku fokisa xwe didine ser meseleya kurdî bi giştî û çareserkirina pevçûnan û avakirina aşitiya civakî bi taybetî. Bi taybetî SCS'yên ku li mêtropolên wekî Stenbol û Enqereyê bi hejmareke sînordar hene, li Tirkiyeyê ji bo çareserkirina pevçûnan û avakirina aşitiya civakî li ser fonksiyonek ji wan fonksiyonan xebatan dikin ku di beşa berî niha de hatibûn xulasekirin. Piraniya mezin a wan SCS'yan ku li çar bajaran hevdîtin li gel wan hatin kirin, xwedî fehmeke hevpar in di wê mijarê de ku ew SCS kêmîneyeke gelek biçûk pêk tînin ku bi giştî li ser bingeha mafî û bi taybetî li ser çareseriya siyasî ya meseleya kurdî û avakirina aşitiya civakî xebatan dikin. Nûnerekî SCS'yekê ku hem di qada neteweyî û hem jî di qada navneteweyî de li ser bingeha mafî xebatan dike, vê rewşê bi van gotinan xulase dike:

> Toreke civaka sîvîl heye ku hewleke gelek çalak û mezin dide; li ser kîjan fikrê dibe bila bibe. Lê belê gava ku li seranserê Tirkiyeyê li pêkhatin û hejmara civaka sîvîl, komele, rêxistinên weqfan û binyada wan bê nêrîn, ez wisa difikirim ku hewla ku bi giştî tê dayîn gelek lawaz e, hem civaka sîvîl di vê mijarê de lawaz maye û hem jî wê ev mijar hiştiye ji bo siyaset, hukumet

**19** YADA, age., rp. 24.

**20** YADA, age., rp. 50.

**21** YADA, Age., rp. 54.

> û pêvajoyeke navbera partiyan; berê hewldanan daye wir. Lê belê ez wisa difikirim ku hewla civaka sîvîl di nav hewla heyî de têra xwe wêrek û biqîmet e û eger rewş gihîştibe cihekî, bi xêra wê hewlê ye.

Nûnerekî SCS'yekê, ku di warê pêkvebûna civakî ya hestyar bo pevçûnan û levcivandina komên bipevçûn de xebatan dike, diyar dike ku SCS'yên ku li ser mijara çareseriya siyasî ya meseleya kurdî û avakirina aşitiya civakî xebatan dikin, bi piranî di nav beşa çeprew û muxalif de cih digirin; berevajî vê yekê, SCS'yên ku camîe'ya rastrew û parêzgarîkar dameziran-dine, li ser bingeha netewe-dewletê meseleyê di çarçoveya "yek welat", "yek al", "yek netewe" de dinirxînin. Li gorî beşdar, li Tirkiyeyê sedemek ji girîntirîn sedeman ji bo bi awayekî siyasî çaresernebûna meseleya kurdî û pêknehatina aşitiya civakî, "nebûna xebat û feraseta civaka sîvîl li ba komên rastrew ên parêzgarîkar bi têra xwe" ye. Piraniya wan SCS'yan ku bi rêfêransên rastrew û parêzgarîkar hatine avakirin, di nav zincîreferman-dari(emir-komuta zinciri)ya hiyêrarşîk de, dûr ji pêrspêktîfeke civaka sîvîl xebatan dikin. Her wekî bibîrxistina nûnerekî SCS'yekê, ku li Enqereyê li ser bingeha mafî xebatan dike, her çi qas li ba camîe'ya SCS'yên bi rêfêransa çep-sêkûler feraseteke civaka sîvîl hebe jî, divê bê yadaştkirin ku ev sazî jî ne rizgar in ji meseleyan. Meseleyên wekî navendgeriyê ku bi taybetî serdest e li ser kevneşopiya siyaseta çeprew, lawazbûna pêvajoyeke demokratîk bo biryardanê, vebestîbûn bi pêşeng li ba van saziyan jî heye. Lê belê, ji bilî çend teşebusên sînordar, heta îro pêşveçûneke berbiçav pêk nehatiye di vê qadê de li Tirkiyeyê.

## 2.2. Dewleta Hêzdar, Civaka Sîvîl a Lawaz

Nûnerên SCS'yan bi giştî wisa şîrove dikin ku li rexmî zêdetir ji sed hezar komele û weqfî, hejmareke sînordar a SCS'yan di qada çareseriya siyasî ya meseleya kurdî û avakirina aşitiya civakî de xebatan dikin; sedema vê yekê ew e ku li Tirkiyeyê kevneşopiyeke lawaz a civaka sîvîl heye. Di vir de, girîngtirîn tişt ku binê wê tê xêzkirin kevneşopiyeke "dewleta hêzdar" e ku civaka sîvîl sînordar dike. Li gorî vê yekê, kevneşopiya dewletdariyê ya li Tirkiyeyê, li aliyekî qadeke sînordar bo civaka sîvîl vedike, li aliyê din vê qadê bi rêjeyeke mezin bi rê ve dibe û/yan jî beralî dike. Di vê nuqteyê de, binê wê yekê tê xêzkirin ku li welêt kevneşopiyeke civaka sîvîl a "dewlet-tewer" yan jî "fokis-dewlet" heye.

Nûnerekî SCS'yekê, ku li ser bingeha mafî li Stenbolê parêzvaniyê dike, diyar dike ku sînordarbûna qada civaka sîvîl û nebûna hêzeke zext-çêker a SCS'yan li ser dewletê, bi tena serê xwe taybet bi meseleya kurdî nîne; ev rewş di her qadê de tê dîtin û ji bo vê yekê nimûneyeke bibandor dide:

> Ez wisa difikirim ku pêwîst e civaka sîvîl rûne û ji nû ve pêdeçûnê bi xwe, hebûna xwe, çima heye û peywira xwe de bike. Ji ber ku ev mesele tenê taybet bi meseleya kurdî nîne. Ev meseleya betal(î)yê, meseleya îrade-nîşannedanê tenê taybet bi meseleya kurdî nîne. Rêxistinên astengdaran nikarin îradeyeke wiha li ser astengdaran nîşan bidin. Civakeke sîvîl heye gelo ku wisa be? Ku hûn biçine daîreya komeleyan, 115 yan 117 hezar komeleyên çalak hene. Li her parêzgehê herî kêm 10 heb komeleyên astengdaran hene; herî kêm 10 heb!.. Binêrin, astengdar nikarin derkevine kuçeyên vî welatî, nikarin li ser peyarêkan bimeşin. Li rexmî ku dewletê qanûn derxistine, nizanim li rexmî çi, hê nikarin biçin û bêjine dewletê ku "qurban te çi kir, çima te hê çareser nekiriye?". Yanî nikare bêje, te go erê? Ev bêîradetî, rewşeke giştî ye.

Bêguman, lawaziya standardên demokratîk û çanda demokratîk girîngtirîn sedem in ku dewletê hêzdar dikin di qada civakî de. Têra xwe dijwar e ji bo ku SCS bikarin roleke çalak bilîzin di nav çandeke siyasî ya wisa de ku azadiya ra-derbirînê sînordar be, têgeha "rêxistin"ê yek be li gel "tomet" û "tirs"ê. Di gel vê yekê, her wekî ku gelek beşdaran binê wê xêz kir, girîng e ku SCS înîsiyatîfê wergirin û ji sînorên qada lîstikê ya dewlet û saziya siyasetê derkevin û bibine aktereke lîstik-çêker. Her wiha, li ber çavan e ku di qada sîvîl de ezmûneke wiha bi têra xwe nehatiye ser hev li Tirkiyeyê. Nûnerekî SCS'yekê, ku hem di qada neteweyî û hem jî di qada navneteweyî de li ser bingeha mafî xebatan dike, pozîsyona giştî ya SCS'yan di meseleya kurdî de bi van gotinan xulase dike:

> Gava ku hûn li xebatên SCS, komele û weqfan li Tirkiyeyê binêrin, hûn dibînin ku ev xebat di asteke nizm de ne û bi qasî ku mumkun e di vê mijarê de hewla sekneke pasîf didin. ... Lê belê meseleya kurdî, meseleyeke pir-alî ye. Dawiya dawî, ji aliyekî jiyana mirovan, mafê jiyanê pêwîst e ku mijara hevpar be li ba hemû komeleyan. Pêşêlkariya mafên mirovan; mijareke hevpar e li ba komele, weqf û her kesî. Her wiha perwerde, îstîxdam, gelek meseleyên din li herêmê yan jî cudakarî, bîrûbaweriyên têkildarî qewmiyetê, hemû, gelek mijar, mijarine wisa ne ku dikarin bikevine rojeva gelek komele û weqfan û civaka sîvîl. Lê belê gava ku mijar têkildarî wir bû yan jî têkildarî meseleya kurdî bû, hingî wan tercîh kir ku pasîf bimînin.

Nûnerekî SCS'yekê, ku bi nirxên parêzgarîkar û rêfêransên îslamî tê nasîn, di gel lêzêdekirinê diyar kir ku SCS'yan di mijara meseleya kurdî de ne tenê pozîsyoneke pasîf wergirtiye, lê belê li gorî dewlet û îqdîtarê pozîsyon wergirtine; bi van gotinên li jêr hakimiyeta dewletê di qada civaka sîvîl de xulase dike:

> Gava ku em bala xwe bidine vir, ango rojava ... nêrîna wê li meseleya rojhilatê başûr her dem dewlet-tewer bûye; ango dewlet-navend bûye. Serê pêşîn, rojava li dewletê mêze dike; dewlet çi dibêje ka pozîsyona dewletê

> çi ye di vir de. Li gorî vê yekê xwe bi cih dike. [...] SCS her dem li Tirkiyeyê di bin kontrolê de ne, di bin kontrolkirinê de ne. Li ser her du çavan. Gelek baş tên kontrolkirin ji aliyê maddî ve. Lê belê saziyên civaka sîvîl ji aliyê siyasî ve jî tên kontrolkirin. [...] Di mijarên siyasî de berê pêkhateyên (sîvîl) tim li ewkê, li îqtîdar û dewletê ye. Lê belê di mijarên civakî û çandî de tam rêxistinên civakeke sîvîl in. [...] Ji bo vê yekê jî esasen dibe ku li Tirkiyeyê [...] rêxistinên civaka sîvîl girîngtirîn alî bin ji bo pêşniyarkirina çareseriyekê. Ango ew çi qas guh bidin dengê xelkê û ji siyaset yan jî dewletê çi qas dûr kevin, ew qas rehettir dikarin pêşniyarên azad pêşkêş bikin. Lê belê me kêşeyek heye di vir de. Pêwîst e em vê qebûl bikin.

## 2.3. Civaka Sîvîl û Angajmanên Siyasî

Li gel cextkirin li ser civaka sîvîl ku dûr e ji meseleya kurdî û “dewleta hêzdar û civaka sîvîl a lawaz”, meseleya din ku wek meseleya sêyem a girîng binê wê hate xêzkirin, peywendiyên angajmanî yên navbera civaka sîvîl û siyasetê ne. Di wan lêkolînan de ku li çar parêzgehan hatin kirin, piraniya beşdaran binê vê meseleyê xêz dikin. Li gorî vê yekê, li Tirkiyeyê, piraniya mezin a komeleyên ku di qada sosyo-polîtîk de çalak in bi angajmanên curbecur ên siyasî di bin siya saziya siyasetê de xebatan dikin. Bi gotina nûnerê SCS’yekê, ku li Amedê di qada civakî de xebatan dike, ev sazî ne ew rêxistin in ku “rol digirin”, ew rêxistin in ku “rol bo wan hatine dayîn”. Nûnerê SCS’yekê, ku rasterast xizmetê pêşkêş dike bo mexdûrên pevçûnan, vê rewşê bi van gotinan îfade dike:

> Em bêjin li Amedê ...hezar heb rêxistinên civaka sîvîl hene. Ji wan sê sed heb, heman gotinan bi kar tînin û heman enelîzan dikin. Sê sed hebê aliyên din tiştekî cuda, sê sed hebê aliyê din... Welhasil gelek kêm e ku ew xwe bi taybetmendiyên xwe, bi enelîzên xwe û bi çavdêriyên xwe lê bikin beşdar. Lewma jî nikarin daxil bin li pêvajoyê. Ewkê li ser wan (rêxistina wan, partiya wan û hwd.) gava ku di nav pêvajoyê de ye, derfeta wan nîne ku zêde tevkariyê bikin li pêvajoyê.

Lêkolîna qadî ku li Wanê hatiye kirin, derdixe ku kêşeya heyî taybet bi Amedê nîne û peywendiyên angajmanî yên navbera civaka sîvîl û saziya siyasetê meseleyeke giştî ye. Nûnerê SCS’yekê, ku tercîh kiriye xwe dûr bigire ji angajmanên siyasî û ji ber vê pozîsyona xwe rastî zehmetiyên curbecur hatiye di asta xwecihî de, diyar dike ku angajmanên siyasî zererê didine hevkariya navbera SCS’yan û pevçûnan derdixe.

> Li Tirkiyeyê mixabin ku civaka sîvîl wek dûvelangeke pêkhateyên siyasî û aydolojiyan xwe rêxistin dikin. Ango her kes qada xwe ya civaka sîvîl çêdike. Lewma jî [...] civakeke sîvîl pêş nakeve ku bikare xelkê li mêkanîzmên biryardanê beşdar bike bi awayekî dirust, bêalî û objêktîf. Ez hê jî wisa difikirim ku ev tengije heye. ... Civaka (S)îvîl, mixabin, nekarî xwe ji wê yekê

> derbas bike ku nebe dûvelangek ku li dora navendên hêzê çerx dibe. Wisa lê hat ku her kes li gorî wan argomêntên wê cîhanê yan jî wê fikra siyasî tev bigere ku dûvelangê wê ye. Vê yekê jî derfeta pêkve-tevgerîna wan ji holê rakir. Wisa lê hat ku ew di navbera xwe de berdewamiyê bidine wan rikaberî û kêşmekêşiyên partiyên siyasî. Di dawiyê de jî, wisa lê hat ku civaka sîvîl ji rikaberiya partiyên siyasî gavekê bikeve pêş. Hetta ketin nav pevçûnên gelek ciddî.

Nûnerê SCS'yekê, ku li Stenbolê li ser bingeha mafî xebatan dike, bi nirxana dina têkoşîna nêzîkî 40 salî ya mafên mirovan dibêje ku esasen SCS'yan nekariye veguherine akterên serbixwe; esasen ew dixebitin ji bo ku "wan rolan bilîzin ku akterên din ji bo wan destnîşan kirine". "Em naxwazin bibine akter. Em dixebitin ji bo ku wan rolan bilîzin ku akterên din ji bo me destnîşan kirine. Tew ez behsa zincîrefermandariyê nakim ji van rolan. ... Hin kes hin bîrûbaweriyan dirust dikin ji bo ku rê li ber civaka sîvîl bigirin da ku fikra xwe beyan nekin. Em xwe radestî wê, wê rolê dikin."

Rapora YADA'yê jî vê rewşê piştrast dike ku li Tirkiyeyê li ser temamê kevneşopiyên siyasî yên ciyawaz hakim bûye. Li gorî daneyên YADA'yê, li Tirkiyeyê rêjeya SCS'yên bi meyla siyasî %9,8 e.[22] YADA SCS'yên bi meyla siyasî wiha pênase dike.

> Ew sazî ne ku wan takekesan li hev dicivîne ku hevpar in di cîhanbînî yan jî baweriyeke diyar de; xebatan dikin ji bo berbelavkirin û/yan jî nasandina hevpariyên xwe. Saziyên bi vî rengî bi gelemperî li gel derdorên siyasî xwedî têkiliyên organîk yan jî nerasterast nînin. Ev sazî, her çend bêtir geşedanxwazên pasîf bin jî, bi giştî dibine alî di meseleyên bingehîn ên Tirkiyeyê de û ji bo ku bandorê li raya giştî bikin daxuyanî hetta çalakî û mîtîngan li dar dixin.[23]

Daneyeke duyem heye ku daneya li jor piştrast dike û îşaretê dide jêrxaneya civakî ya meyla heyî. Li gorî vê yekê, li Tirkiyeyê di qada civaka sîvîl de SCS'yên ku piraniya wan ji civat û koman pêk tên hene. Hejmara wan SCS'yan gelek kêm e ku bi giştî takekesan li hev civiyabin û damezirandibin. Ew li gorî rêjeya xwe li herî jêr in di rêzbendî(ranking)ê de.[24]

Peywendiya angajmanî ya navbera civaka sîvîl û siyasetê, bi gotineke rasttir bandora saziya siyasetê li ser SCS'yan, bi awayekî giştî dibe asteng ji bo ku di qada civaka sîvîl de "qada gewr" bi pêş keve. Hin beşdar, ku di qadê de dixebitin, îddîa dikin ku li herêmê gelek SCS di navbera hukumeta AK Partiyê û Tevgeran Kurdan a sereke de asê mane. Ew diyar dikin ku bi

**22** YADA, age., rp. 21.

**23** YADA, age., rp. 24.

**24** YADA, age., rp. 25.

hejmareke sînordar be jî hin SCS hewl didin xwe ji van peywendiyên angajmanî dûr bigirin û bi parastina mesafeya xwe ji her du aliyan tevkariyê li pêvajoyê bikin. Lê belê diyar dikin ku her du pêkhateyên siyasî SCS'yan neçar dikin ji bo ku bibine alî. Her wiha cextê li ser wê yekê dikin ku di vê demê de ku rikaberiya siyasî dijwar bûye û pevçûn gur bûne, "qada gewr" bêtir teng bûye û SCS'yên vê qadê bêbandor bûne.

## 2.4. Getoyên Civaka Sîvîl

Di çarçoveya têkiliya dewlet, siyaset û civaka sîvîl de, kêşeya ku wek kêşeya çarem binê wê tê xêzkirin: cemserbendiya navbera SCS'yan û meyla wan e ku dixwazin di taxên xwe de bimînin. Li Tirkiyeyê tê dîtin ku di qada civaka sîvîl de cure getobûneke siyasî heye. Ev meyla getobûnê, ku li seranserê Tirkiyeyê li dora tevgerên siyasî û partiyan heye, li erdnîgariya kurdan ji cemserbendiya siyasî ya navbera hukumeta AK Partiyê û Tevgera Kurdan a sereke derdikeve holê.

Ev rewş, hevkarî û hevpariya navbera SCS'yan li Tirkiyeyê heta asteke girîng sînordar dike û wê yekê dijwar dike ku akter bikarin ji "taxên xwe" derkevin. Cemserbeniya ku di qada civakî de ji bo çareseriya siyasî ya meseleya kurdî û avakirina aşitiya civakî heye, di qada civaka sîvîl de jî heye. SCS'yên ku tê çaverêkirin di mijara derbaskirina pevçûnên civakî û avakirina levkirinê de rol bilîzin, hema bêje wan pevçûnan di qadên xwe de ji nû ve çêdikin ku di qada civakî de hene. Wek encameke vê rewşê, tê dîtin ku li Tirkiyeyê hevkarî û hevpariya navbera wan SCS'yan têra xwe sînordar maye ku xwedî meylên ciyawaz ên aydolojîk û polîtîk in. Bi gotineke nûnerê SCS'yekê, li Tirkiyeyê "hevkariya navbera SCS'yan" nîne; belku "hevhêziya navbera SCS'yan" heye. Bi gotineke dîtir, hevkarî SCS'yan li dora ciyawaziyan li hev dicivîne û sînêrjiyekê çêdike; lê belê "hevhêzî"ya wan SCS'yên ku mîna hev û xwedî motîvasyonên wekî hev in; li ser bingeha fik-rên polîtîk, têkiliyên hukumetî û nêrîna li meseleyan SCS'yan li hev dicivîne û "bereyan" ava dike. Ev pêvajoyên berebûnê, di encamê de dibine sedema pêkhatina "getoyên civaka sîvîl". Nûnerê SCS'yekê, ku li ser bingeha mafî li Stenbolê xebatên parêzvaniyê dike, diyar dike ku ev rewş bi taybetî piştî Giştpirsiya Makeqanûnê derket ku di sala 2010'an de çêbû. Li gorî vê yekê, di serê salên 2000'î de kêm be jî di navbera komên siyasî de peywendî hebûn û hevparî çêdibûn û vê rewşê rasterast bandora xwe li qada civaka sîvîl dikir. Lê belê piştî Giştpirsiya Makeqanûnê ya 2010'an cemserbendiya ku li welêt kûrtir û dijwartir bû derbasî qada civaka sîvîl jî bû. Di vê demê de "her kesî dest bi wan çalakiyan kir ku li gel 'cimee'ta xwe' û li gel cemawera xwe biaxivin; cemawera xwe û cimee'ta xwe armanc bikin".

Di lêkolînên qadî de hatiye çavdêrîkirin ku li bajarê Wanê, bi asteke sînordar be jî, hewl çêbûne ji bo ku di têkiliyên navbera SCS'yan de ji hevhêziyê derbasî hevkariyê bibin. Cuda ji Amed, Stenbol û Enqereyê, li bajarê Wanê di nav 10 salên dawîn de bi armanca çareserkirina siyasî ya meseleya kurdî û avakirina aşitiya civakî teşebus hatine kirin ji bo ku wan SCS'yan li hev bicivînin ku xwedî nirxên ciyawaz, xwedî meylên ciyawaz ên aydolojîk û polîtîk in; teşebusên ji bo çêkirina hevpariyê jî pê re. Ji bo vê mijarê beşdaran gelek caran platforma Tevgera Biraderiyê ji bo Aşitî û Edaletê bi bîr xistin ku di dawiya sala 2000'î de hatibû damezirandin. Bi vê teşebusê SCS'yên hem çep-sêkûlêr hem jî parêzgarîkar û bi rêfêransa îslamî li gel wan SCS'yan, ku civata kar û bar ava kiribûn, ji bo hevkariyê li hev dicivin. Lê belê ev teşebus jev belav dibe berî ku bibe pêkhateyeke mayinde. Di sala 2015'an de teşebuseke duyem bi navê Înîsiyatîfa Aşitiyê derdikeve û pêkhateyek tê avakirin ku xwedî wesfên manend in. Lê belê ev pêkhate jî ji ber girêdanên siyasî yên civaka sîvîl li gel tevgerên siyasî û hem helwesta nerênî ya hukumeta AK Partiyê û hem jî ya Tevgera Kurdan a sereke ji bo "qada gewr" bêyî ku karîger bibe jev belav dibe. Sedemeke girîng ji bo karîgernebûna van platforman ew e ku beşdar li şûna ku van pêkhateyan wek qadeke levkirin û hevkariyê bi kar bînin, platformê wek amrezekê bi kar tînin ji bo ku têgihîştina xwe zal bikin.

Bi kurtasî; kevneşopiya civaka sîvîl a "dewlet-tewer", têkiliyên angajmanî yên navbera civaka sîvîl û saziya siyasetê, tengiya qadên gewr û getobûn nîşan dide ku li Tirkiyeyê zemîna huqûqî, maddî û zîhnî gelek kêm e ku hewcedariya civakeke sîvîl a hêzdar pê heye.

## 2.5. Civaka Sîvîl û Derza Herêmî

Bi bandora wan sedeman ku li jor hatin xulasekirin, tê dîtin ku di navbera SCS'yan de li ser mijara meseleya kurdî û çareserkirina pevçûnan, getobûneke herêmî heye. Ji bilî hejmareke kêm a wan SCS'yên li Stenbol û Enqerê, di navbera erdnîgariya kurdan û beşa din a Tirkiyeyê de cudahiyeke wisa heye ku nikare çavpoşî lê bê kirin. Beşdarek ji Stenbolê bi van gotinan vê rewşê îfade dike:

> Zehmet e ku mirov bêje ev mesele temamê Stenbolê li xwe digire û temamê Stenbolê wê hest dike. Yanî li Stenbolê em bêjin, ku em sêmbolîk jê behs bikin, meseleya kurdî meseleya wan kesan e ku têkiliya wan di navbera Stenbol û Amedê de heye. Yanî esasen em behsa meseleyeke wisa nakin ku xema wan kesan be ku têkiliyeke wan di navbera Stenbol û Amedê nîne. Lewma meseleya kurdî kî ji xwe re dike xem? Kurdên ku li Stenbolê dijîn yan jî ew saziyên civaka sîvîl ku van kurdan ava kirine. Yan jî ez dikarim bêjim ku meseleya kurdî xema wan kesên ne kurd e lê belê têkiliyek danîne li gel meseleya kurdî di çarçoveya mafên mirovan de; yan jî xema kesayetan yanî

> rûspiyan e. Lewma, ji ber vê yekê bi min zehmet tê ku bêjim têkiliyeke Stenbolê li gel mijarê heye. Ji ber ku, ya rast, ez nîşaneyên wisa zêde nabînim ku beşên mezin ên Stenbolê eleqedar bin li gel mijarê. Lewma li Stenbolê nufûseke mezin heye. Li Stenbolê saziyên civaka sîvîl hene ku vê nufûsa kurdan ava kirine. Înîsiyatîfên curbecur ên siyasî û sîvîl hene ku ev saziyên civaka sîvîl dikarin wan bixine nav liv û tevgerê. Ez dikarim bêjim ku wêneyekî dibînim ku ji van pêk tê.

Beşdarek, ku naskirî ye bi xebatên xwe yên li ser SCS'yan, vê rewşê bi du meseleyên bingehîn ve girê dide. Ya yekem; şêweya nêrîna dewlet û Tevgera Kurdan, bi gotineke zelaltir şêweya gotûbêjkirin û daxilkirina aliyên din li meseleyê, astengên girîng çêdikin. Esasen, dewlet meseleya kurdî di çarçoveya meseleyeke "ewlehî û têrorê" de gotûbêj dike û ev yek jî dihêle ku SCS xwe dûr bigirin ji meseleyeke wiha mîlîtarîzebûyî. Ji aliyê din, heta îro Tevgera Kurdan a sereke, meseleyê li dora mijarên wekî nasname, mafê jiyanê û koça neçar dinirxîne; lewma jî çênebû ji bo ku beşên mezin ên civaka sîvîl bikişîne nav meseleyê û meseleyê civakî bike. Ya duyem, piraniya mezin a SCS'yên li Tirkiyeyê, meseleyê wek meseleyekê dibînin ku ayidî erdnîgariyekê ye û xwe jî wisa dinirxîne ku dûr e ji wê erdnîgariyê. Ev dûrahî ne tenê fîzîkî ye, di heman demê de dûrahiyeke zîhnî ye jî.

Nûnerê SCS'yekê, ku salên dirêj e di warê windahiyan de xebatan dike, cextê hem li ser şêwe-nêrîna dewlet û Tevgera Kurdan a sereke dike hem jî cextê li ser sînorên SCS'yan dike ji bo xwe-gihandina civakê. Li gorî vê yekê, li Tirkiyeyê zerfiyeta SCS'yan a xwe-gihandina beşên berfireh ên civakî û civakîkirina meseleyan, gelek sînordar e. Li ser vê mijarê, beşdarek ku bi nasnameya xwe ya parêzgarîkar û îslamî derdikeve pêş, bi bîr dixe ku di mijara serpoşiyê de jî, ku beşên berfireh ên civakê piştgiriya wê dikirin, zerfiyata civakîkirina meseleyê ya SCS'yan gelek sînordar bû. Lewma jî SCS gelek sînordartir man di civakîkirina meseleyeke wekî meseleya kurdî de ku "wî destî dişewitîne" ku pê dibe.

Hinek beşdarên ji Stenbolê diyar dikin ku di çêbûna getobûna herêmî de, bondora camîe'ya wan SCS'yan heye ku bi rêfêransên çep-sêkûlêr tev digerin û meseleya kurdî dikin amraz. Li gorî vê yekê, meseleya kurdî eweliyet(priority)a vê camîe'yê nîne. Ev camîe', ji çareserkirina siyasî ya meseleya kurdî û avakirina aşitiya civakî zêdetir li gorî têkiliyên xwe yên li gel AK Partiyê têkiliyê li gel vê meseleyê çêdikin. Bi gotineke din, "ew bi xwe, pozîsyona wan, siyasetên wan, têkiliyên wan ên niha yên li gel hukumetê, nêrînên li hember wan" têkilîçêkirina camîe'ya çep-sêkûlêr li gel meseleya kurdî diyar dikin. Meseleya kurdî di esil de ji aliyê van koman ve hatiye amrazkirin. Beşdarekî/e din diyar dike ku ev rewş taybetî dewra AK Partiyê nîne. Li gorî beşdar, camîe'ya çep-sêkûlêr "zêdetir, meseleya kurdî ne wek meseleyeke wisa dibînin ku divê bê çareserkirin, wexta ku bikêrhatî be di-

kişînin nav rojevên xwe yên din ên polîtîk; wexta ku difikirin ku zererê dide wan li derveyî rojeva xwe dihêlin” bi vî rengî li wê dinêrin.

Ji aliyê din beşdarê SCS’yekê, ku ji Enqerê beşdar bûye, di vê çarçoveyê de şîroveyekê dike û zêdetir ji amrazkirinê, meseleyê wek meseleyeke eweliyetê enelîz dike. Li gorî vê yekê, “bi giştî, rêxistinên li rojava ji aliyê qadên xwe yên xebatê ve li meseleya kurdî dinêrin. Bi giştî, rêxistinên li herêmê jî, ji aliyê meseleya kurdî ve li qadên xwe yên xebatê dinêrin”. Beşdarê navborî, tevî hin guhertinên dewrî û awarteyan, îddîa dike ku ev riwangeh têkiliyên navbera wan SCS’yan diyar dike ku li ser meseleya kurdî xebatan dikin. Dîsan, hin beşdar diyar dikin ku cudakirinên wekî “herêma kurdan” û “rojava” ne rast e; ev yek şîroveyeke homojênker e, lê di rastiyê de pêkhateyeke hêtrojêntir heye ku komên ciyawaz li xwe digire.

## 2.6. Civaka Sîvîl û Pirsgirêka Zerfiyetê

Tê dîtin ku di qada civaka sîvîl de tecrubeya sazgehî û têkildarî vê yekê jî zerfiyeta sazgehî têra xwe sînordar e. Beşdar diyar dikin ku pirsgirêka zerfiyetê ji bo mudaxilbûna SCS’yan li meseleya kurdî sînordariyeke girîng pêk tîne. Bi gotineke beşdarekî/ê, ku di warê SCS’yan de xwedî ezmûn e, “meseleyek ku çîroka wê 20 yan jî 25 salî (meseleya civaka sîvîl) ye, di mijara meseleyekê (meseleya kurdî) de ku çîroka wê 200 sal e heye, çaverêkirin ji bo ku roleke çalak bilîzin [...] ne tiştekî rast e”.

Têkildarî pirsgirêka zerfiyetê, tiştekî din ku beşdar cextê li ser dikin ew e ku SCS di mijara çareserkirina pevçûnan û avakirina aşitiya civakî de xwedî tecrube û zanyariyeke pêwîst nînin û di vê mijarê de bi awayekî rast û dirust nizanin ka dikarin çi bikin. Bi gotineke din, hem ji aliyê têorîk hem jî ji aliyê pratîkê ve pirsgirêkeke zerfiyetê ya berbiçav a SCS’yan di mijara çareserkirina pevçûnan û avakirina aşitiya civakî de heye. Beşdarekî SCS’yekê, ku di qada mafên mirovan de xebatan dike, diyar dike ku ji ber pirsgirêka zerfiyetê akterên qada civakî, zêdetir di wê çarçoveyê de li meseleyê dinêrin ku dewlet yan jî YE çêkiriye; SCS hem di nav civakê de hem jî di qada siyasî de ne xwedî hêz in. Li gorî vê yekê, li şûna ku SCS li ser meseleyê amadekariyeke bizerfiyet çêbikin û xebatan bikin ji bo civakîkirina meseleyê, li gorî rewşa siyasî xebatan dikin. Ev rewş jî tevkariya SCS’yan li avakirina aşitiya civakî sînordar dike.

Mijareke din ku binê wê di çarçoveya pirsgirêka zerfiyetê de tê xêzkirin, rêbaza xebatê ye. Hin beşdar diyar dikin ku agahdariyên têorîk û tecrube jî pê re xebatên ku ji bo çareserkirina pevçûnan û avakirina aşitiya civakî tên kirin, di wan de jî meseleyeke girîng î rêbazê heye. Têkildarî rewşa meseleyê, fokiskirin li ser fonksiyonên ciyawaz û li şûna ceribandina rêyên

ciyawaz, SCS bêyî ku guhertina rewşê bidin ber çavan, bi piranî hem di karên xwe de hem jî li ser awayê karkirina xwe berdewam dikin.

Wek dawî, di mijara zerfiyetê de îşaret bi wan sînoran tê kirin ku di warê hêza mirovan, çavkaniyên darayî û zanyariyan de hene. Bi giştî, profayla SCS'yan wisa ye ku mirovan bi têra xwe beşdar nakin li xebatên xwe, çavkaniyên wan ên darayî yên sînordar hene û têra xwe asteke nizm a pisporiya wan heye di hin qadên diyarkirî de. Yek ji girîngtirîn astengan ku di vê mijarê de dibe asteng li ber başkirinê, têrnebûna xebatên hevkariya navbera SCS'yan û hevtemamkirinê ye. Ji ber hevkariyeke sînordar, di gelek rewşan de SCS nikarin ji wan xebatan sûdê wergirin ku dikin û xebatên wekî hev dubare dikin. Ev rewş di qada civakî de dibe astengeke girîng li ber hevkarî, sînêrjî û pêkhatina ezmûnekê. Di vê mijarê de hin beşdar derdibirin ku di salên dawîn de rikaberî zêdetir bûye ji hevkariya navbera SCS'yan. Bi taybetî binê wê yekê xêz dikin ku wekheviyek di mijara xwe-gihandina çavkaniyên fonî de heye ku çavpoşî lê nikare bê kirin. Hin beşdar diyar dikin ku ev newekhevî di asta herêmî de jî heye û zêdetir jî bi sûda wan SCS'yan e ku xwe li rojava bi cih dikin.

## 2.7. Civaka Sîvîl û Girtina Sînoran

Mijareke din ku têkildarî pirsgirêka zerfiyetê ye lê ji wê wêdetir e, têkiliyên sînor-derbas ên navbera SCS'yan e. Hatiye çavdêrîkirin ku hevkariyên sînor-derbas ên SCS'yên ku li Tirkiyeyê di qada çareserkirina pevçûnan û avakirina aşitiya civakî de dixebitin, gelek sînordar mane.

Di vê mijarê de divê herî kêm binê sê tiştan bê xêzkirin. Yekem, hatiye çavdêrîkirin ku bi taybetî SCS'yên li Amed û Wanê, nîsbet bi SCS'yên li Stenbol û Enqereyê, zêdetir sînor-girtî ne. Hatiye çavdêrîkirin ku hevkarî û hevpariyên sînor-derbas ên SCS'yên ku li her du bajaran hevdîtin li gel wan hatin çêkirin –yek du heb ne tê de- hema bêje nînin. Di vê mijarê de her çi qas ku SCS'yên li Enqere û Stenbolê hinekî baştir bin jî, bi giştî tê çavdêrîkirin ku akterên civaka sîvîl ku di warê çareserkirina pevçûnan û avakirina aşitiya civakî de dixebitin, di mijara çêkirina wan têkiliyan de mesafeyeke gelek kurt birîne ku sînorên xwecih û neteweyî derbas dikin.

Duyem, hatiye çavdêrîkirin ku têkiliyên heyî yên sînordar, zêdetir li gel cîhana rojava ya navend-Ewrûpa hatine çêkirin; li hember vê yekê li gel erdnîgariya Rojhilata Navîn hema bêje têkilî çênebûne. Peywendeke akterên civaka sîvîl ên li Tirkiyeyê, welatên cîran di serî de, li gel SCS'yên Rojhilata Navîn hema bêje qet nîne. Hatiye çavdêrîkirin ku hin SCS'yan, ku hem li Amedê hem jî li Stenbolê hene, di vê mijarê de teşebusên curbecur pêş xistine di salên dawîn de. Dikare bê gotin ku bi taybetî SCS'yên ku li ser

bingeha zanyariyan xebatan dikin, di vê mijarê de xwedî wê potansiyelê ne ku bikarin piran ava bikin.  Di gel vê yekê, divê bê yadaştkirin ku têkiliyên heyî gelek sînordar in û projeyên ku dikarin bandorê li qada civakî bikin hema bêje qet nehatine pêşxistin.

Wek dawî, hatiye çavdêrîkirin ku tu cure têkiliyek hema bêje nehatiye danîn li gel wan SCS'yan ku li welatên din di qada çareserkirina pevçûnan û avakirina aşitiya civakî de xebatan dikin. Li rexmî hebûna dewreyeke dirêj a pevçûnan li Tirkiyeyê, hatiye çavdêrîkirin ku li gel wan SCS'yan ku tecrubeyên manend di wext û mekanên ciyawaz de tecrube kirine, di asteke biçûk de têkilî hatiye danîn. Her çi qas ku li gel cîhana rojava di asteke diyar de têkilî hebin jî, hatiye çavdêrîkirin ku hevkarî û hevpariyên bi armanca çareserkirina pevçûnan û avakirina aşitiya civakî hema bêje qet nînin. Cîhana rojava ne tê de, hem li Rojhilata Navîn hem li Asyayê bûyerên pevçûnan hene ku li ser bingeha êtnîk/dînî û li ser bingeha sînoran li nav-welatan diqewimin. Li rexmî vê yekê, SCS'yên li Tirkiyeyê ku hestyar in bo meseleya kurdî, li gel akterên civaka sîvîl ku li van herêman li ser çareserkirina pevçûnan û avakirina aşitiya civakî xebatan dikin, ji bo çêkirina têkîliyan û parvekirina tecrubeyan û çêkirina pêvajoyên hînbûnên muteqabil hewleke girîng nedane.

Eleqeya kêm, ênêrjiya kêm û zerfiyeta sînordar a SCS'yên li Tirkiyeyê di mijara çêkirina têkiliyên sînor-derbas de, bi gotineke din "rewşa sînor-girtinê", hem ji aliyê fonksiyon hem jî ji aliyê xwe-baweriyê ve akterên navborî lawaz dihêle.

## 2.8. Civaka Sîvîl û Normên Demokratîk

Qadên meseleyên li jor li aliyekî, hin beşdar îşaretê didin bi kêşeyên sazgehî yên hundurê SCS'yan. Mijara ku herî zêde binê wê tê xêzkirin, lawaziya beşdarî û normên demokratîk ên nav saziyê ne. Tê diyarkirin ku gelek SCS bûne yek li gel kesan û di hin rewşan de heman kes dewreke dirêj, teqrîben 20 sal, van saziyan bi rê ve dibe. Beşdara SCS'yekê, ku di qada jin û zayenda civakî de xebatan dike, vê rewşê bi gotinên "jixwe yek ava dike û heta ku dimire jî serok e" rexne dike.

Ya duyem jî, di vê mijarê de îşaret bi êlîtîzma nav SCS'yan tê kirin. Bi taybetî beşdarên ji Enqere û Stenbolê, diyar dikin ku cîhana SCS'yan camîe'yeke gelek sînordar û êlîtîst e. Mijareke din ku têkildarî êlîtîzmê binê wê tê xêzkirin ew e ku SCS gelek zêde li ser maseyan xebatan dikin û danakevin qadan. Di vê mijarê de beşdarê SCS'yekê, ku li ser bingeha mafî li Stenbolê xebatan dike, diyar dike ku wek encameke dûrbûna ji qadan, SCS danakevin qadan; ku dadikevin jî di piraniya rewşan de xwe dûr digirin ji çeperên bajaran.

Wek dawî li ser vê mijarê, hin beşdar diyar dikin ku pevçûn û cudabûnên ku di nav SCS'yan de diqewimin, li SCS'yan meseleyeke din a girîng zêde dike ku jixwe xwedî hêz û qadeke sînordar in. Beşdarê SCS'yekê, ku li Enqereyê xebatan dike, vê rewşê wek "zêdebûn bi cudabûnê" pênase dike:

> Pêwîst e ku meseleya zêdebûnê baş bê enelîzkirin. Em çawa zêde dibin? Em bi cudabûnê zêde dibin. Zêdetir mirov beşdar dibin. Em (wek) saziyên civaka sîvîl ên heyî bi cudabûnê zêde dibin. Ew, yanî pêkve zêde nabin. Mixabin hejmara wan mirovan zêde nabe ku li civaka sîvîl beşdar dibin yan jî xwe wek hemwelatiyeke/î sîvîl dibînin û bawer dikin ku li ser meseleyan divê xwedî gotin bin. Yan jî bi heman rêjeyê zêde nabin.

## 2.9. Salên 1990'î: Salên Tarî

Her wekî ku dînamîkên xulasekirî yên li jor nîşan dan, li Tirkiyeyê kevneşopiyeke lawaz a civaka sîvîl heye. Hatiye çavdêrîkirin ku liv û tevgera yekem di qada civaka sîvîl de bi taybetî di salên 1990'î de derketiye. Vê liv û tevgerê rengê xwe di qada meseleya kurdî de jî veda. Her wekî ku lêkolînên qadî piştrast dikin, di salên 1990'î de, bi taybetî SCS'yên li ser bingeha mafî derketin û van saziyan li ser meseleya kurdî xebatên wisa kirin ku nikare çavpoşî li wan bê kirin. Di vê mijarê de saziyên ku gelek caran îşaret bi wan tê kirin, Komeleya Mafên Mirovan (KMM) û Komeleya Hevgirtinê ji bo Mafên Mirovan û Mazlûman (Mazlum-Der) e.[25] Li rexmî van liv û tevgerên yekem di qada civaka sîvîl de, divê bê gotin ku di salên navborî de qad têra xwe sînordar û ji bo çalakvanên sîvîl têra xwe xwedî rîsk bû. Bi gotina beşdareke ji Amedê, "Rêxistinên civaka sîvîl di salên reş û tarî yên 1990'î de ...hetta nedikarî têkoşîna jiyanê bikin."[26] Nûnerekî SCS'yekê, ku fokisa xwe dide qada hilberandina zanyariyên giştî û parêzvaniyê, bi van gotinên karîger behsa atmosfera herêmên pevçûnan di salên 1990'î de dike:

> Sêndîkayên li Amedê ku ji berê ve hene û niha jî em wek rêxistinên civaka sîvîl pênaseya wan dikin yan jî em wek rêxistinên cemawerî yên demokratîk

**25** Mazlum-Der di sala 2017'an de piştî nîqaş û cudabûnên curbecur, ku meseleya kurdî mijareke sereke bû ji van, dabeş bû. Li rexmî îtîraz û protêstoya gelek şaxan, di encama desteya giştî ya awarte de ku bi biryara dadgehê civiya, komeke zêdetir li Stenbolê biryar da ku ji 24 şaxên komeleyê 16 şaxan bigire û navenda komeleyê ji Enqereyê bibe Stenbolê. Kongira ku Serokê Şaxa Stenbolê Ramazan Beyhan tê de wek Serokê Giştî hate hilbijartin; şaxên herêmê yên wekî Amed, Riha, Wan, Dîlok, Mûş, Batman, Bilîs, Çewlig, Şirnex, Colemêrg li aliyekî her wiha şaxên Îzmîr, Sakarya, Mêrsîn, Kocaelî, Bursa û Enteqyayê jî hatin girtin. Yek ji girîngtirîn hokaran ku bû sedema cudabûnê, meseleya kurdî bû. Şaxên ku hatin girtin bi "Înîsiyatîfa Heq" xebatên xwe berdewam dikin û tê çaverêkirin ku di sala 2018'an de bibine sazî.

**26** Di van salan de tenê 23 birêveber û endamên KMM'yê ji ber cînayetên kiryar nediyar jiyana xwe ji dest dan. Bi sedan birêveber û endamên komeleyê ji ber xebatên xwe yên li ser mafên mirovan hatin mehkemekirin û li sizayên heps û pereyî hatin mehkûmkirin. Serokê Giştî yê KMM'yê Akin Birdal, di 13'ê Gulana 1998'an de li avahiya komeleyê li Enqereyê, di odeya xwe de, rastî hêrişa çekdarî hat. Birdal bi şeş gulleyan bi giranî birîndar bû û demeke dirêj hate dermankirin.

> pênaseya wan dikin di serî de, gava ku em diçine serdana wan saziyan ku di nav lêgerînên rastiyê de ne, zêdetir wêneyên wan kesan hene ku jiyana xwe ji dest dane. [...] Li mêtropolan, li bajarên mezin wêneyên serokên berê daliqandî ne. Di saziyên me de zêdetir wêneyên wan kesan daliqandî bû ku jiyana xwe ji dest dane..

Di salên 1990'î de xebatên SCS'yan zêdetir bi rêya tesbîtkirin û raporkirina pêşêlkariya mafan û ragihandina giştî li ser xebatên parêzvaniyê hûr bûn. Mafên mirovan, koça neçar, windahî, alîkarîkirina girtî û mehkûman qadên bingehîn ên xebatê bûn ku di warê meseleya kurdî û avakirina aşitiya civakî de derdikevin pêş. Di vê çarçoveyê de gava ku em salên 1990'î ji aliyê heft fonksiyonên SCS'yan ve binirxînin, tê çavdêrîkirin ku bi "dabînkirina xizmetê bi awayekî rasterast" û "şopandin û berpirsiyarî-qebûlî"yê; bi tayş betî jî bi çalakiyên wekî raporkirin, daxuyaniya çapemeniyê, sêmpozyûm û konfêransan fonksiyonên "parêzvanî û ragihandina giştî" derdikevin pêş.

Xebatên kirî ji aliyê bandorê ve girîng bûn her çi qas ku ji aliyê çendaniyê ve sînordar bin jî. Xebatên ku di van salan de hatin kirin hişt ku xebatên piştî 2000'an zindî bibin. Her wekî ku nûnerê SCS'yekê, ku li ser bingeha mafî li Stenbolê xebatan dike, binê wê xêz dike SCS'yan di salên 1990'î de "di esil de encamên şîdetê tomar kirin". Her wiha di çarçoveya derfetan de ji bo qerebûkirina mexdûriyetên "huqûqî", "bijîşkî" û "saykolojîk" xebatên girîng encam dan. Wek dawî, "bîreke civakî" hate çêkirin li ser meseleya kurdî û pevçûnan. Bo nimûne, bi çalakiyên Dayikên Şemiyê yên ji bo windahiyên kiryar nediyar bîrek hate çêkirin ku sînoran derbas dike ji Tirkiyeyê wêdetir.

Di gel vê yekê, di salên 1990'î de ku pevçûn gurr bûn, li Tirkiyeyê di qada civakî de bi awayekî berbelav rizamendiyek hate çêkirin ji bo ku meseleya kurdî bi şîdetê bê serkutkirin. Li hember vê yekê, SCS'yan li ser bingeha aşitiya civakî û edaletê nekarîn ku bi awayekî berbelav rizamendiyekê çêkin. Lewma jî bandora xebatên ku di warê şopandin, berpirsiyarî-qebûlî û parêzvaniyê de hatin kirin, li ser beşên berfireh ên civakê hindik bû. Her wiha, akterên civaka sîvîl nekarîn di asta welêt de wan xebatan bi awayekî berbelav bikin ku fokisa xwe didine ser fonksiyonên wekî civakîbûna navkomî, berbelavkirina çanda aşitiyê, pêkvebûna civakî ya hestyar bo pevçûnan, navbînkarî û asankariyê.

## 2.10. Salên 2000'î: Berfirehbûn û Zindîbûn di Qada Sîvîl de

Salên 2000'î li Tirkiyeyê, wek dewrek dikare bê tomarkirin ku tê de qada civaka sîvîl berfireh dibe û di xebatên SCS'yan de zindîbûneke girîng çêdia be. Di vê mijarê de aliyê ku herî zêde binê wê di lêkolînên qadî de tê

xêzkirin, bandora pêvajoya endambûna Yekîtiya Ewrûpayê (YE) ye li qada civaka sîvîl. Di Kanûna 1999'an de pêvajoya endambûna YE, ku bi wergirtina statûya welatê berendam lez da xwe, tevkariyên girîng li pêşveçûna SCS'yan kir li Tirkiyeyê. Li aliyekî başkirinên di mewzûatê de ji bo pêvajoya demokratîkbûnê, komelebûn û azadiya ra-derbirîn û rêxistinbûnê li seranserê welêt, ji aliyê din piştigiriyên sazgehî ku ji aliyê YE'yê ve hatin kirin, zindîbûneke girîng çêkir di qada civaka sîvîl de li Tirkiyeyê.

Di vê mijarê de aliyê duyem ku divê binê wê bê xêzkirin, pêvajoya serûbinbûn û nûbûnê ye ku di qada siyasetê de hate meydanê li Tirkiyeyê. Piştî qeyrana aboriyê ya 2001'ê piraniya partiyên siyasî yên bizava sereke yên Tirkiyeyê marjînalîze bûn û ji qada siyasetê vekişiyan û Partiya Dad û Geşepêdanê (*AK Parti*), ku nû hatibû damezirandin, bi tena serê xwe bû desthilatdar di 2002'an de. Dîskûrsa ku li ser xeta endambûna YE'yê, demokratîkbûn û rêformê di salên damezirandina AK Partiyê de hebû û her wiha rêkûpêkkirinên huqûqî û siyasî, gava duyem a girîng bû ku hişt SCS hêzdar bibin.

Rengvedana zindîbûna giştî, ku di qada civaka sîvîl de çêbû, li ser meseleya kurdî û avakirina aşitiya civakî li aliyekî, pêwîst e ku binê du pêşveçûnên girîng jî bê xêzkirin ku li qada kurdan çêbû. Her wekî ku daneyên lêkolîna qadî piştrast dikin, yekem, lêgerînên ji bo çareserkirina siyasî di meseleya kurdî de ku di salên 2000'î de gurr bûn, hişt ku SCS beşdar bin li pêvajoyê. Piştî ku rêberê Partiya Karkerên Kurdistanê –PKK Ebdulla Ocelan hate destgîrkirin, pêvajoya bêpevçûn a pênc salî ya navbera -1999 2004'an, pêvajoya endambûnê li YE'yê li aliyekî, ji aliyê din berfirehbûna qada civaka sîvîl tevkariyên girîng çêkirin. Lêgerînên çareserkirina siyasî ji bo meseleya kurdî heta 2015'an berdewam kir li rexmî daketin û hilketinên curbecur. Axaftina serokwezîrê wê demê R. T. Erdogan di 2005'an de li Amedê ku tê de şaşiyên dewletê qebûl kirin û cext li ser wê yekê kir ku meseleya kurdî dê bi demokratîkbûn, huqûq û refahê çareser bike, Pêvajoya Osloyê ya navbera 2008-2011'an û Pêvajoya Çareseriyê ya 2013-2015'an wek rawestegehên girîng dikarin bêne tomarkirin di lêgerînên çareserkirina siyasî ya meseleya kurdî de. Di van salan de ku lêgerînên çareserkirina siyasî zêde bûn, meyla dewletê hêzdar bû ji bo ku meseleyê bi rêya diyalog û gotûbêjan di çarçoveya demokrasiyê de çareser bike, tê çavdêrîkirin ku akterên civaka sîvîl jî bêtir zêde beşdar bûne li vê mijarê.

Duyem, pêwîst e binê wê dînamîkê bê xêzkirin ku li qada kurdan qewimî. Pêvajoya endambûna YE'yê, rêformên giştî yên dêmoktarîkbûnê, bêpevçûniya pênc salî li aliyekî, ji aliyê din bi taybetî partiyên kurdan ên lêgal ên sereke ku piştî 1999'an bûn desthilatdar li ser birêveberiyên herêmî hişt ku li qada kurd hem lêgalbûn hem jî sazgehî çêbe. Akterên bingehîn ên

barhilgir SCS bûn di veguherînên her du qadan de. Di vê dewrê de mafên mirovan li aliyekî, ji aliyê din di qadên wekî jin, ciwan, zarok, ziman, çand, têkoşîn li gel feqîriyê û pêşveçûna sosyo-êkonomîk de gelek SCS hatin damezirandin û wan xebatên girîng kirin.

Cuda ji salên 1990'î, di salên 2000'î de hem hejmara SCS'yan zêde bû ku li xebatên çareserkirina siyasî ya meseleya kurdî û aşitiya civakî beşdar dibûn hem jî qada wan a xebatan berfireh bû. Di vê demê de xebatên SCS'yan ji bo dabînkirina xizmeta bi awayekî rasterast, şopandin, berpirsiyarî-qebûlî, ragihandina giştî û parêzvanî li aliyekî, ji aliyê din kêm be jî û dîsan zêdetir di "taxên xwe" de bimînin jî, xebatên civakîbûna navkomî û berbelavkirina çanda aşitiyê bi rê ve birin. Dîsan bi taybetî li Amedê di navbera aliyên pevçûnan de di asta xwecihî de xebatên navbînkariyê dem bi dem çêbûn. Li rexmî vê yekê, hatiye çavdêrîkirin ku fonksiyonên wekî pêkvebûna civakî ya hestyar bo pevçûnan û navbînkarî û asankariyê hem di navbera aliyan de hem jî di asta civakî de gelek sînordar maye. Dabînkirina xizmetê bi awayekî rasterast, şopandin, berpirsiyarî-qebûlî, parêzvanî û ragihandina giştî hê fonksiyonên bingehîn ên wan SCS'yan pêk tînin ku fokisa xwe dane ser xebatên çareserkirina siyasî ya meseleya kurdî.

Her wekî ku hin beşdaran binê wê xêz kirin, di salên 2000'î de, cuda ji salên 1990'î, hatiye çavdêrîkirin ku di qada civaka sîvîl de xebatên li ser meseleya kurdî di wan de curbecurbûnek heye. Bi salên 2000'î re mijarên wekî mafên mirovan, demokrasî, koça neçar û xebatên parêzvaniyê ku bi rêya wan dihatin kirin, girîngiya xwe parastin. Di gel vê yekê, bi taybetî bi bandora koça neçar li qada civakî, meseleya kurdî hate têkildarkirin li gel qadên wekî bajarîbûn, jin, zarok, êkolojî, ermenî ku berî niha qet neketibûn rojevê yan jî gelek kêm hatibûn gotûbêjkirin; di van qadan de mobîlîzasyoneke girîng a civaka sîvîl derkete holê.

Taybetmendiyeke din a girîng a salên 2000'an, zindîbûna di wan SCS'yan de bû ku parêzgarîkar û rêfêrans-îslam bûn; û cuda ji berê, hewlên van SCS'yan bû ji bo çareserkirina meseleya kurdî û avakirina aşitiya civakî. Mazlum-Der ne tê de, di salên 1990'î de SCS'yên parêzgarîkar û rêfêrans-îslam zêdetir xwe dûr girtibûn ji meseleya kurdî. Di salên 2000'î de hem li herêmê gelek SCS'yên parêzgarîkar û rêfêrans-îslam hatin damezirandin û hem jî van SCS'yan li gel şirîkên xwe yên aliyê rojava pozîsyon wergirtin der heqê meseleya kurdî de. Di vê mijarê de bi taybetî Platforma Edaletê ji bo Biratiyê ku li seranserê herêmê hate avakirin û her wiha Platforma Rojhilat û Rojava ku li seranserê welêt hate avakirin divê bêne bibîrxistin.

Di gel vê yekê, dikare bê gotin ku li SCS'yên bi rêfêransa îslamî di astên

curbecur de zor hat ku helwestê wergirin di mijara meseleya kurdî de. Hin beşdar di lêkolîna qadî de diyar dikin ku SCS'yên rêfêrans-îslam nekarîn di mijara meseleya kurdî de çarçoveyeke têorîk çêbikin. Li gorî beşdarê SCS'yeke parêzgarîkar û rêfêrans-îslam, "camîeya îslamî" nekarî dîskûrseke taybet ava bike di çarçoveya meseleya kurdî de û ji ber vê yekê jî nekarî pratîkên guncaw pêş bixe. Li gorî vê yekê, di mijarên wekî "ummet", "netewe", "pêkvejiyan" û "cudabûn"ê de kevneşopiya îslamî ya li Tirkiyeyê hê nekariye êkolan çêbike. Di vê mijarê de aliyê duyem ku binê wê tê xêzkirin, rêbaza têkoşînê û têkiliya li gel dewletê ye. Cuda ji tevgetên çep-sêkûlêr, kevneşopiya siyasî ya parêzgarîkar û rêfêrans-îslam xwedî wesfeke rêformxwaz e û têkoşîna desthilatdariyê dike bêyî ku şer bike li gel dewletê. Ev wesfê wê, rê dide ku li qadên din ên Anatolyayê pêşve biçe; lê pozîsyon-wernegirtin di çarçoveya meseleya kurdî de dibe sedem ku di nav civaka kurdan de têkiliyên hêzdar nekare çêbike. Mijareke din a girîng ku binê wê tê xêzkirin, SCS'yên rêfêrans-îslam ên li erdnîgariya kurdan şaxa herêmî ya camîeyên rojava-navend in û têkiliyên wan in li gel desthilatdaran. Di vê mijarê de, wek dawî, tê diyarkirin ku SCS'yên parêzgarîkar û rêfêrans-îslam bi rêjeyeke girîng xwe dispêrin zemîna karmendan û fikara berdana vê zemînê dibe asteng ji bo ku pozîsyoneke zelal wergirin di meseleya kurdî de.

Li rexmî wê zindîbûnê ku di qada civaka sîvîl de di salên 2000'î de hate pê, her wekî ku nûnerê SCS'yekê, ku fokisa xwe daye ser mijara aşitiyê, binê wê xêz dike "zehmet e ku mirov behsa rêxistinbûneke civaka sîvîl bike ku aşitiyê ferz bike li Tirkiyeyê". Her wekî ku beşdar bi bîr xist, li Tirkiyeyê beşeke civakî ya berfireh heye ku aşitiyê dixwaze. Di gel vê çendê, rêxistinbûneke civaka sîvîl û mobîlîzasyoneke civaka sîvîl nîne ku daxwazên vê beşê veguherîne zextekê bo ser siyasetê ji bo avakirina aşitiya civakî:

> Ez wisa difikirim ku hejmara aşitîxwazan, nexasim di meseleya kurdî de xwe digihîne mîlyonan li Tirkiyeyê. Ez wisa difikirim ku piraniya mezin a dengên %13'ê ku di 7 Hezîranê de bo HDP hatin dayîn, kesên ku sedî sed aşitiyê dixwazin dengên xwe dan; lê ji bilî vê yekê kesên ku dengên xwe dan AKP û CHP jî ji wan jî hejmara kesên ku çareseriyê dixwazin gelek bilind e. Lê belê ez wisa difikirim ku em hê di cihekî gelek paşve de ne di mijara civakeke sîvîl de ku van hemû kesan bike yek û zextekê çêbike li ser hukumetê. Li Tirkiyeyê [...] ez wisa difikirim ku civaka sîvîl hê bi awayekî kamil negihîştiye wê qebîliyetê ku bikare li ser siyasetmedar, hukumet û meclîsê zextê çêbike.

Beşdarek, ku di qada SCS'yan de li ser bingeha mafî dixebite, di vê mijarê de diyar dike ku bi taybetî sedemeke girîng ew e ku piştî salên 2000'î SCS'yan nekarî xwe biguncînin li gel wan guhertinan ku di qada siyasî û meseleya kurdî de hatin meydanê li Tirkiyeyê. Li gorî vê yekê, SCS'yên ku

di salên 1990'î de zêdetir fokisa xwe dabûn ser xebatên pêşêlkariya mafan û parêzvaniyê, pêwîst bû fokisa xwe bidana ser fonksiyonên din jî gava ku di salên 2000'î de lêgerînên çareseriya siyasî gurr bûn di meseleya kurdî de. Lê belê piraniya SCS'yên ku di qada meseleya kurdî û çareserkirina pevçûnan de dixebitin, nexasim ji ber ku bi rêfêransa çep in yan jî fokiskirî ne li ser siyaseta kurd, hê berdewam in li ser nirxandina meseleyê di çarçoveya xebatên parêzvaniyê de. Lê belê peywenda meseleya kurdî her dem diguhere û pêwîst e civaka sîvîl di çarçoveya herka kêşeyê de fonksiyonên ciyawaz bo xwe navend wergire û karê xwe bike. Bi rastî jî gava ku li peydakên lêkolînên qadî bê nêrîn, tê dîtin ku SCS'yan bi piranî fokisa xwe dane ser xebatên şopandin, berpirsiyarî-qebûlî û parêzvaniyê. Nexasim xebatên ku di warê pêkvebûna civakî ya hestyar bo pevçûnan de hatine kirin di asteke ew qas baş de nînin. Ji nav wan 45 SCS'yan ku li çar parêzgehan hevdîtin li gel wan hatin kirin, tenê saziyek heye ku fokisa xwe daye ser vê qadê.

### 2.11. Du Qadên Ku Derdikevin Pêş di Çareserkirina Pevçûnan de: Mafên Mirovan û Zayenda Civakî

Li rexmî hemû sînorên wan, hewlên ku ji salên 1990'î ve li Tirkiyeyê tên dayîn, ezmûneke wisa daye hev ku çavpoşî nikare lê bê kirin. Şopandin û berpirsiyarî-qebûlî ku li ser bingeha mafên mirovan pêş ketine û li ser vê bingehê jî pêşveçûna ragihandina giştî û parêzvaniyê, qadên yekem in ku bêguman divê binê wan bê xêzkirin. Di çarçoveya meseleya kurdî de ezmûneke wisa hate hev ku mirov nikare kêm bibîne. Xebatên ku bi pêşengiya ÎHD û Mazlum-Derê hatin kirin, di van 20 salên dawîn de hem curbecur bûn û hem jî berbelav bûn.

Wek duyem, pêwîst e binê wê mobîlîzasyonê bê xêzkirin ku di warê newekheviya jin û mêran û zayenda civakî de derkete meydanê. Her wekî di qada mafên mirovan de, di qada zayenda civakî û azadiya jinan de hem li qada kurdan û hem jî li seranserê welêt ezmûneke mirovî, sazgehî û bingeh-zanyarî hate hev ku kêm nikare bê dîtin. Pêşveçûna ku di qada çareserkirina siyasî ya meseleya kurdî û avakirina aşitiya civakî de pêk hat, her çi qas ku gelek qismî be jî, bi qasî wan xebatên ku di warê mafên mirovan de hatin kirin û her wiha bi wê mobîlîzasyona pir-alî ev pêşveçûn çêbû ku di warê zayenda civakî de derkete meydanê.

Tecrube û ezmûna ku hem di warê mafên mirovan de hem jî di warê zayenda civakî de derkete holê, dikare tevkariyeke girîng li çareserkirina siyasî ya meseleya kurdî û avakirina aşitiya civakî bike. Ji ber ku ev pêşveçûnên di vê qadê de wê potansiyelê hildigirin ji bo ku wan sînoran derbas bikin ku li jor binê wan hate xêzkirin. Yekem, bandor û beralîkirina dewletê di

her du qadan de jî kêm e bi qiyas li gel qadên din. Duyem, hatiye çavdêrîkirin ku angajmanên siyasî sînordar in û xwedî wê potansiyelê ne ku sînorên siyasî derbas bikin. Wek dawî, di her du qadan de jî di mijarên derbaskirina getoyên civaka sîvîl û derzên herêmî û pêşvebirina hevkarî û hevpariyên pir-alî de tecrubeyên girîng hatine ser hev.

## 3. PÊVAJOYA ÇARESERIYÊ (2013-2015) Û CIVAKA SÎVÎL

Hatiyê çavdêrîkirin ku SCS di asteke sînordar de beşdar bûne li Pêvajoya Çareseriyê ya 2013-2015'an. Rûdanên sêmbolîk ên wekî agahdarbûna giştî ji birêveçûna Pêvajoya Çareseriyê bi awayekî nisbî û bi rêya kenalên medya sereke ragihandina nameya Ocelan bo hemû Tirkiyeyê di Newroza Amedê de, cuda ji berê, teşwîq kir ku piraniya SCS'yan li pêvajoyê beşdar bin; di vê mijarê de bi taybetî cesaret da akterên civaka sîvîl ên li qada kurdan. Bi gotineke nûnerê SCS'yekê, ku li Amedê li ser bingeha mafî xebatan dike, "her ku qad vebû û çek paşve vekişiyan mirovan bêtir hest bi nêzîkbûnê kir ji bo xwe-berpirsiyar-zanîn, peywir-wergirtin û gav-avêtin ji bo ku tevkariyê li pêvajoyê bikin". Serbestiya nisbî hişt ku oto-sansora berbelav a cîhana SCS'yan rabe yan jî lawaz be û hişt ku ezmûna heyî ya qada civaka sîvîl zêdetir derkeve meydanê bi qiyas li gel berê. Di gel vê yekê, hem tengiya qada ku hukumeta AK Partiyê û Tevgera Kurdan a sereke vekiribû û hem jî kêşeyên civaka sîvîl, ku di beşa berî niha de binê wan hatibû xêzkirin, bi rêjeyeke zêde beşdarbûna SCS'yan li Pêvajoya Çareseriyê sînordar kir.

### 3.1. SCS'yan Çi Kir di Pêvajoya Çareseriyê de?

Gava ku beşdarbûn û tevkariya SCS'yan li pêvajoyê bi hûrgilî bê vekolîn, li gorî encamên lêkolînên qadê, mijara yekem ku divê binê wê xêzkirin ev e: SCS'yan di Pêvajoya Çareseriyê de esasen fokisa xwe dan ser wan xebatên lobîgerî û parêzvaniyê ku hukumeta AK Partiyê û Tevgera Kurdan bo xwe navend digirin. Hatiye çavdêrîkirin ku piraniya SCS'yan di astên curbecur de bi pêşkêşkirina fikrên xwe bi devkî û nivîskî hem bo hukumeta AK Partiyê û hem jî bo pêkhateyên Tevgera Kurdan hewl dane ku mudaxil bin li pêvajoyên diyarkirina polîtîkayan. Bo nimûne; nûnerê SCS'yekê, ku li Amedê di qada aboriyê de xebatan dike, diyar dike ku di Pêvajoya Çareseriyê de ezmûneke girîng î zanyariyan li ser meseleya kurd çêbû li ba dewletê û di çêbûna vê ezmûna zanyariyan de SCS'yan roleke girîng lîst. Her wiha binê wê yekê xêz dike ku piraniya zanyariyên ku ji aliyê bîrokrasiyê ve ji xwecihê bo navendê dihatin veguhestin, ji aliyê SCS'yan ve "dihatin sererastkirin". Ji aliyê din, piraniya SCS'yan derdibirin ku wan fikrên xwe ragihandine hukumet û Tevgera Kurdan a sereke, lê belê karîger nebûne û akterên siyasî bala xwe nedane wan di gelek rewşan de.

Duyem; her çi qas ku dewlet û Tevgera Kurdan a sereke li gorî pêwîst bala xwe nedabe zanyariyên ku ji aliyê SCS'yan ve hatine hilberandin, her wekî ku hin beşdaran îşaret pê dikir, di vê dewrê de meseleya kurd di qada giştî de xuya dibû wisa ku nikare bê qiyaskirin li gel berê û mesele ji aliyên xwe yên ciyawaz ve di nav beşên berfireh de hate axaftin. Bo nimûne; nûnerê SCS'yekê, ku li Enqereyê di qada civakî de xebatan dike, diyar dike ku gelek meseleyên ku me berê nedikarîn biaxivin, di Pêvajoya Çareseriyê de bi rehetî me nîqaş dikirin. SCS'yan roleke krîtîk lîstin ji bo ku mesele di vê astê de bê axaftin û nîqaşkirin di qada giştî de. Di vê mijarê de, gelek beşdar îşaret bi Lijneya Mirovên Aqil dikin. Piraniya nûnerên SCS'yan, tevî ku rexneyên xwe yên ciyawaz hebin, Lijneya Mirovên Aqil wek xebateke civaka sîvîl dinirxînin. Bicihgirtina gelek kesayetan di nav lijneyê de ku bi xebatên xwe yên qada civaka sîvîl tên naskirin û xwedî nasnameyeke sazgehî ne, dîsan têkilîçêkirin li gel SCS'yan gava ku lijneyên herêmî çûn bajarekî, du sedemên bingehîn ên vê nirxandinê pêk tînin.

Sêyem; her çend ku wek çavekî sêyem nekarîn li pêvajoyê beşdar bin ku aliyan ew wek fermî nas kiribin, dîsan jî hatiye çavdêrîkirin ku SCS'yan navbînkarî kiriye hem di navbera rayedarên dewletê ên xwecihî û pêkhateyên Tevgera Kurdan de û hem jî di navbera HUDA-PAR û HDP de. Ev rewş nexasim ji bo Amedê derbasdar e. Ev teşebusên navbînkariyê gava ku Pêvajoya Çareseriyê berdewam dikir, di rûdanên wekî bûyerên 6-8'ê Cotmehê ji bo Kobanê, rêgirtin, serbestberdana peywirdarên giştî de gelek caran karîger bû. Di gel vê yekê, di xendek û pevçûnên nav-bajaran de ku piştî ku Pêvajoya Çareseriyê bi dawî hat qewimîn, teşebusên navbînkariyê bi ser neketin. Di mijara navbînkariyê de, her wiha hatiye çavdêrîkirin ku hin akterên civaka sîvîl, ku li ser bingeha zanyariyan parêzvaniyê dikin, pir û carinan rasterast carinan jî nerasterast mêkanîzmên diyalogê çêkirine di navbera komên siyasî, camîeya kar û bar û camîeya SCS'yan de ku li meseleya kurd ciyawaz dinêrin.

Çarem; hatiye çavdêrîkirin ku bi dirêjahiya Pêvajoya Çareseriyê hin SCS'yan ku li ser bingeha mafî xebatan dikin, înîsîyatîf wergirtine û qadên nû vekirine têkildarî qadên xebatan û bi vî awayî hewl dane ku tevkariyê li pêvajoyê bikin. Bo nimûne, Lijneya Şopandinê ya *de facto* ku li Amedê ji 25 kesan pêk hat, ji bo vê yekê dikare bibe mînak. Bi dirêjahiya pêvajoyê, vê lijneyê, ku hem PKK û hem jî akterên dewletê şopandine û di wexta qeyranan de hewl daye mudaxil be, car caran feedback dane aliyan û xebat kirine ji bo bin-nekeftina pêvajoyê. Dîsan hatiye çavdêrîkirin ku SCS'yekê, ku li seranserê Tirkiyeyê di qada zayenda civakî û aşitiyê de xebatan dike, xebatên gelek girîng kirine ji bo ku pêvajo berdewam bike bi awayê hestyar bo zayenda civakî. SCS'ya navborî, li gel wan 14 jinan hevdîtinê dike ku di nav Lijneya Mirovên Aqil de cih digirin û hewl daye

ji bo ku xebatên pêşîn ên lijneyê hestyar bin bo zayenda civakî. Xebatên saziyê hem bi her du aliyên pêvajoyê û hem jî bi akterên din ên siyasî bi hevdîtinên manend berdewam kirine. SCS'yek, ku di qada edalet û rûbirûbûn li gel rabirdûyê de xebatan dike, di wexta Pêvajoya Çareseriyê de ji bo ku van mijaran bixe rojeva partiyên siyasî, hem li gel hukumetê hem li gel HDP û hem jî li gel CHP di astên curbecur de têkilî danîne.

Li Wanê bi awayekî nisbî di Pêvajoya Çareseriyê de –dibe ku ji ber wê konfîgerasyona siyasî ya bajêr be ku xwe dispêre du hêzên hejmonîk û dînamîk- hatiye çavdêrîkirin ku xebatên civaka sîvîl bêtir serkeftî bûne. Cuda ji Amed, Stenbol û Enqereyê hatiye çavdêrîkirin ku li bajarê Wanê di navbera wan SCS'yan de ku bi motîvasyonên çep-sêkûlêr û îslamî-parêzgarîkar xebatan dikin, hewlên diyalog û hevkariyê derketine holê û mobîlîzasyoneke gelek girîng hatiye çêkirin ji bo avakirina aşitiya civakî di xwecihê de. Hin SCS'yan înîsiyatîf wergirtine û xebat kirine bi mebesta avakirina aşitiya civakî. Nûnerê SCS'yeke bi rêfêransa îslamî-parêzgarîkar ku di nav vê înîsiyatîfê de cih girtiye, bi van gotinan xebatên kirî xulase dike:

> Bi destpêkirina Pêvajoya Çareseriyê, me pêkve înîsiyatîfek pêk anî û wekî ku min got ji van derdorên ciyawaz ango ji HUDA-PARê bigire heta AK Partî û HDPê me hewl da ji bo ku her kesî em kom bikin di nav vê înîsiyatîfê de. Li gel komîsyona ku me di vê înîsiyatîfê de pêk anî, me hewl da ji bo ku em herêmên opêrasyonan bigerin. Xebateke hişmendkirinê ye li ser aşitiyê... Bo nimûne em çûn tabûran, em çûn parêzgariyê, em çûn qayimqamiyê, em çûn şaredariyan û partiyan... Em li Elbakê, cihê ku opêrasyon lê tên kirin, û li gundan geriyan. Li wir em çûn tabûran. Em bûn mêvanê tabûran. Vê yekê moreleke fewqalade çêkir hem li ba xelkê hem jî li ba aliyên pevçûnan.

Li ser vê mijarê nûnerê SCS'yekê, ku li Wanê ye, diyar dike ku beşdarbûna çalak li pêvajoyê ya çend SCS'yan ku di lokalê de xwedî roleke krîtîk in, bandoreke domînoyî çêkir û li seranserê bajêr liv û tevgerek afirand. Beşdar dînamîzma ku li bajêr çêbû û bandorên wê bi van gotinan wiha îfade dike:

> Li Wanê teqrîben hemû pêkhateyan –çi pêkhateyên îslamî çi hemû pêkhateyên ji aliyê din- tevkariyên erênî pêk anîn. Bi nîqaşkirinê jî esasen ev tevkarî bû. Ev xebat tevkariyek bû. Beşa îslamxwaz yan jî ji kevneşopiya îslamî tê ku di aliyê herî dijber de disekine li ser vê meseleyê, piştî demekê neçar man ku li meseleya kurd angaje bin. Di vê mijarê de, wêdetir ji dîskûrsa 20 sal berî niha, neçar ma ku dîskûrsên nû qebûl bike ku ev yek jî pêşveçûnek bû. Yaxud di vir de tiştekî din bêjim ku gelek çeptir e, nûnerên CHP yaxud yên MHPê jî di nav vê rojeva germ û gur de hatibûn wê rewşê ku hin tiştan bikarin nîqaş bikin.

Pêncem, hatiye çavdêrîkirin ku hin SCS'yan zêdetir ji xebatên di asta akterên siyasî de, xebatên ku di qada civakî de bi awayekî rûtîn kirine yan jî berî niha nekarîne bikin û paş xistine di vê dewrê de bi awayekî karîgertir kirine. Bo nimûne; SCS'yek, ku ji bo mexdûrên pevçûnan xebatan dike, dibêje ku lêkolînên qadê û karê pêkanîna ênvantêrê ku berî wê demê ji ber meseleyên siyasî û huqûqî me nedikarî bike, di wexta Pêvajoya Çareseriyê de bi rehetî û bi awayekî me ew xebat kirin ku hemû herêmên pevçûnan li xwe digirin. Nûnerê SCS'yeke din ku piştgiriya sayko-sosyal bo mexdûrên pevçûnan dabîn dike, diyar dike ku ji bo çareseriyeke siyasî ya muhtemel, zerfiyetên xwe yên sazgehî hêzdar kirine ji bo ku bêtir tevkariyê bikin di qadên xwe yên pisporiyê de. Nûnera SCS'yekê, ku di warê jin û aboriyê de xebatan dike, binê wê yekê xêz dike ku wan di vê demê de bi mebesta kêmkirina bandorên zêdeker ên şîdetê di kuçe û jiyana rojane û kargehan de xebat kirine.

Şeşem; hin nûnerên SCS'yan diyar dikin ku ne tenê bi dirêjahiya Pêvajoya Çareseriyê, her wiha di destpêkirina pêvajoyê de jî zextên civaka sîvîl karîger bûn. Diyar dikin ku di encama wan xebatan de ku li seranserê welêt di qada civaka sîvîl de hatine kirin, mesele bi rêjeyeke mezin civakî bû û daxwazeke civakî derket meydanê ji bo çareseriyê. Li gorî vê yekê, xebatên qada civaka sîvîl bandoreke girîng çêkir ji bo ku ji aliyê layenan ve ev daxwaza civakî û pêwîstiya gav-avêtinê bê dîtin. Dikare bê gotin ku ev rewş nexasim li qada kurdan derbasdar bû. Ji ber ku hem di mijara çareserkirina pevçûnan û avakirina aşitiya civakî de ji bo ku agahdarbûn bigihê hemû beşan û hem jî li ba qada kurdan ji bo ku ew têgihîştin hakim bibe ku çareseriya meseleyê bi şîdetê ne mumkun e, SCS'yan tevkariyeke gelek girîng li wan kir. Bi gotina nûnerekî, ku li Amedê li ser bingeha mafî dixebite, SCS'yan "esasen ji aliyekî ve kurd û amedî çi difikirin, çi dixwazin, çi arezû dikin li hemû welêt belav kirin".

Dawî jî; hatiye çavdêrîkirin ku hin SCS'yan xebat kirine ji bo pêşvebirina zerfiyeta akterên civaka sîvîl di mijara çareserkirina pevçûnan û avakirina aşitiya civakî de. Di vê mijarê de xebatên ku herî zêde derdikevin pêş; atolye, komxebat û gerên qadan in ku tê de bûyerên wekî hev tên vekolîn û nîqaşkirin. Di lêkolînên qadê de hatiye çavdêrîkirin ku gelek nûnerên SCS'yan ku hevdîtin li gel wan hatine kirin, ji bo ku pêvajoyên manend di cihên wan de bibînin, li projeyên parvekirina tecrubeyan beşdar bûne.

## 3.2. SCS'yan Nekarî Çi Bikin?

Gava ku li zerfiyet û dijwariya meseleya kurd bê nêrîn, xebatên xulasekirî yên li jor nîşan didin ku beşdarî û tevkariya SCS'yan li Pêvajoya Çareseriyê têra xwe sînordar bû. Her wekî ku beşdarek, ku li Amedê li ser bingeha mafî

dixebite, binê wê xêz dike akterên civaka sîvîl bi giştî di qadên "beyankirina fikran û li ser vê bingeha çêkirina civînan û birêvebirina dîplomasiyê" de karîger bûn. Di gel vê yekê, di Pêvajoya Çareseriyê de "nekarîn gaveke pêşvetir bifikirin û vê yekê bisêwirin û wek zanyarî û nexşerêyekê bixine ber aliyan".

Beşdarek, ku li Stenbolê li ser bingeha zanyariyan parêzvaniyê dike, diyar dike ku SCS'yan ne karî zanyariyan hilberînin û pêşiya aliyan vekin û pêvajoyê asantir bikin ne jî karîn wê rolê bi cih bînin ku civakê, ku bi dirêjahiya pevçûnên 40 salî "jehravî bûye", ji wan hêvî dikir ji bo mijarên "aşitiya civakî", "pêkvejiyan li gel ciyawaziyan", "çareserkirina meseleyan ne bi rêya çekan lê bi rêya axaftinê li rexmî ciyawaziyan", "derbirîna ciyawaziyan di zemîneke demokratîk de". Hin beşdar her çi qas ku diyar dikin ku bi rêya Lijneya Mirovên Aqil di asteke baş de aşitî li civakê hate xomalîkirin û ji bo aşitiyê rizamendiya civakî hate hilberandin, lê gelek beşdar binê wê yekê xêz dikin ku "aşitî nekarî bê civakîkirin". Di vê mijarê de gelek beşdar bi bîr dixin ku hetta raporên herêmî yên Lijneya Mirovên Aqil jî nehatin eşkerekirin. Beşdarek, ku li Stenbolê li ser cudakarî û avakirina wekheviya navbera ciyawaziyên civakî dixebite, bi van gotinên xwarê pozîsyona pasîf a SCS'yan derdibire ku di Pêvajoya Çareseriyê de wergirtine:

> Girîngtirîn sedem ji bo têkçûna pêvajoya dawîn, xomalînekirina pêvajoyê bû li beşên civakî. Ji ber ku eger pêvajoyek bûya ku xomalîkirî bûya li beşên civakî, [...] li hember her helwesteke dewlet yan jî PKKê dê bigotana "Binêrin em aşitiyê dixwazin. Ev yek, mumkun e ku bibe asteng li ber vê" û bi vê yekê mêkanîzmên îqazkirinê ji civaka sîvîl, dikarî bo wan biçe. Neçû. Me lê temaşa kir. Yanî çûn Îmraliyê, hevdîtin çêbûn, ji wir çûn Qendîlê, ji wir hatin ba MÎTê, nizanim çi û çi... Me li vê pêvajoyê temaşa kir. Me wiha temaşa kir. Yanî wexta ku ew daxwaz derketin holê ku em dixwazin wan biparêzin, em li dora wan sekinîn û lev kom bûn. Lê belê me nekarî daxwazekê hilberînin.

Hin beşdar diyar dikin ku di mijara civakîkirin/giştîkirina aşitiyê de, SCS'yan, di Pêvajoya Çareseriyê de nekarîn di qada civakî de xebatan bikin yan jî xebat nekirin; nexasim xebatên berbelavkirina çanda aşitiyê. Di vê mijarê de diyar dikin ku qada sîvîl bi xwe li "çanda aşitiyê" gelek nas nebû, nekarî "zimanekî aşitiyê" çêbike û ev rewş karîger bû li ser lawaziya xebatên ji bo avakirina aşitiya civakî. Nûnerê SCS'yekê, ku di qada mafên mirovan de dixebite, gaveke pêşvetir diçe û diyar dike ku bi taybetî piraniya SCS'yên bi rêfêransa çep xwedî "dîskûrsên mîlîtarîst" û xwedî qonaxên zêdebar ên biryarên navendî ne; lewma jî zêde ne mumkun bû ku ev sazî di nav xwe de bikarin biryarên sîvîl wergirin û rêbazên demokratîk cî bi cî bikin.

Hin beşdar nîqaşên civakîbûn/giştîbûna aşitiyê bi rêya "lokalkirina aşitiyê" dinirxînin. Li gorî vê yekê, pêwîst bû ku di Pêvajoya Çareseriyê de "aşitî bihata lokalkirin". Di vê mijarê de li rexmî hemû sînorên xwe, Lijneya Mirovên

Aqil dikarî fonksiyoneke girîng bibîne. SCS'yan dikarî di vê mijarê de roleke girîng bilîstana. Lê belê ne hukumeta AK Partî û Tevgera Kurdan a sereke armanceke wiha dan pêş xwe û ne jî SCS'yan di vê mijarê de înîsiyatîf wergirtin û karîn mudaxil bin. Beşdarek, ku li ser SCS'yan dixebite, diyar dike ku di Pêvajoya Çareseriyê de mijara civakîkirina aşitiyê bi temamî hate feramoşkirin: "Di vê meseleyê de tiştekî wiha heye. Yekem, divê diyalog hebe di navbera aliyên pevçûnan de. Duyem, divê têkiliyek hebe di navbera mijar û rehend(aspect)ên mijarê û civakê de. Bi ya min, ev beşa duyem di Pêvajoya Çareseriyê de tew nehate pîlankirin jî." Beşdar diyar dike ku ev yek ne bi rêya bikeran, lê bi rêya mijarên wekî jin, jîngeh, astengdar û zarokan dikare pêk bê. Ji ber ku biker bi "xwe-pakkirin ji mijarên xwe" nikarin rêyekê vekin ji bo axaftina meseleya kurd; berevajî vê yekê dibine asteng li ber meseleya kurd ku pir-rehend e:

> Em 7-8 sal berî niha li ser zarokên kevir-avêj diaxivîn, ne wisa? Niha em wan ciwanan diaxivin ku şerên xendekan dikin. Me dît ku zarokên ku wê rojê kevir diavêtin, niha veguherîne wan ciwanan ku şerê xendekan dikin. Bi hezaran ji wan, jiyana xwe ji dest da di vê ewkê de (di pevçûnên nav-bajaran de). Baş e niha, gelo em ê li ser nifşê nû çi biaxivin? Eger peresendina vî karî wiha diçe, eger ciwanên kurd ji zarokên kevir-avêj vediguherin mîlîtanên ciwan ku şerê xendekan dikin, baş e gelo nifşa peyre dê veguhere çi? Lewma jî heta ku ev rehendên civakî yên meseleyê neyên gotûbêjkirin, yanî heta ku em li gel meseleyên zarokên kevir-avêj jî eleqedar nebin, heta ku em xebateke civaka sîvîl pêş nexin ji bo ku wê fam bikin, heta ku em wê têkiliyê di navbera yên vir û yên wir de daneynin, di nav mijaran de, yanî heta ku em dest bi nîqaşkirina mijarê nekin, ez dibêjim ku tenê dê nîqaşeke fasid be; ew jî ji axaftinekê pêk tê ku hewleke ragihandina dêklarasyoneke yek-alî ye bo aliyê din.

Hin beşdar diyar dikin ku SCS'yan nekarî pêvajoyê bişopînin û xwedî li "daxwaza aşitiyê" derkevin. Beşdarek, ku li Stenbolê li ser bingeha mafî dixebite, bi bîr dixe ku di Pêvajoya Çareseriyê de "daxwaza çavdêriyê" ku veguherî krîzê bi rêya "Lijneya Şopandinê", SCS'yan bêyî ku li hêviya aliyan bimînin dikarîn bi awayekî fîîlî bikin, lê belê di vê mijarê de xebateke wisa girîng nehate kirin. Beşdarek, ku li Enqereyê di qada zayenda civakî de xebatan dike, bi bîr dixe ku em hê tam ji ber vê kêmasiya "hakemiya civakî" nizanin ka pêvajo çima xirap bû, kê xirap kir, para kê çi qas bû. Beşdareke din, ku diyar dike ku aşitî sozeke siyasî bû ku PKK û hukumeta AK Partiyê pêşkêşî civakê kiribû, derdibire ku SCS xwedî li vê yekê derneketin:

> Aşitî sozeke siyasî ye ku hatiye dayîn bo vê civakê, bo civaka Tirkiyeyê, bo xelkên Tirkiyeyê. Pêwîst e em bidin pey vê sozê eynî wekî sozeke ku têkildarî mijarên darayî û xanenişîniyê yan jî têkildarî îstîxdamê ye. Em nadin pey. Çi rastrew çi çeprew çi muxalefet çi ewk[nebêje ku] "Birayo yek deqe.

> Wan li heft herêman bi dehan civîn çêkirin li gel rûspiyan li gel vî û wê. Te çû hevdîtin li gel Îmraliyê kir. Qendîlê te ev yek kir, aliyê din te ev yek kir". PKK û dewletê ev soz dan civaka Tirkiyeyê piştî ku bi awayekî fermî hatin eşkerekirin. Lewma jî divê ez xwediyê vê daxwazê bim gava ku ez li hêviya aşitiyê bim. Divê ez xwediyê wê daxwazê bim ku dane min.

Qadeke din ku SCS tê de lawaz man, pêşvebirina wan şirîkatiyan bû ku getobûnên siyasî derbas dikin û diyalogê mumkun dikin di navbera komên civakî yên ciyawaz de. Gelek beşdar diyar dikin ku di Pêvajoya Çareseriyê de SCS'yan tercîh kirine ku "di taxên xwe de bimînin" û hewl nedane ji bo ku hevkariyê bikin li gel beşên ciyawaz. Di vê mijarê de; getobûn, tengiya qadên gewr, angajmanên siyasî di qada civakî de ku di beşa berî niha de binê wan hatibû xêzkirin, di Pêvajoya Çareseriyê de jî bi asteke bilind berdewam kir. Nûnerê SCS'yekê, ku li Enqereyê xebatan dike, diyar dike ku "rûbirûbûna komên civakî yên ciyawaz" nekarî bê çêkirin û di vê mijarê de tirsên heyî karîger bûn. Her wiha, nûnerê SCS'yekê, ku li Stenbolê li ser bingeha zanyariyan xebatan dike, binê wê yekê xêz dike ku çend aware ne tê de, camîeya çep-sêkûlêr û camîeya îslamî-parêzgarîkar nekarîn şirîkatiyekê ava bikin. Di Pêvajoya Çareseriyê de camîeya çep-sêkûler di nav xwe de hin şirîkatî çêkirin û li pêvajoyê beşdar bûn; lê belê camîeya îslamî-parêzgarîkar bi rêjeyeke mezin li derveyî pêvajoyê ma û kar avête ser hukumetê. Nûnerê SCS'yekê, ku komên civakî lev dicivîne ku pev diçin û di qada têkiliyên civakî yên hestyar bo pevçûnan de xebatan dike, piştgiriya vê argomêntê dike û diyar dike ku beşa rastrew-parêzgarîkar xwe dûr girt ji pêvajoyê û li hêviyê sekinî û digot ku "ev îş xilas nebû ku mafdariya me derkeve meydanê".

Ji aliyê din; nûnerê SCS'yekê, ku ji Stenbolê ye û bi nasnameya xwe ya îslamî û parêzgarîkar tê nasîn, diyar dike ku camîeya îslamî cara yekem bi asteke girîng bi Pêvajoya Çareseriyê li meseleya kurd mudaxil bû. Beşdar, xebatên camîeya îslamî-parêzgarîkar bi van gotinan derdibire:

> Camîeya îslamî jî cara yekem germagerm kete nav vê meseleyê. Binêrin li Rojhilatê Başûr herî kêm 30-40 civîn çêbûn; yanî li Riha û Amedê. Li vir, hemû îslamxwaz çûn herêmê. Cara yekem ji medreseyên îslamî û têolojîstên herêmê bigirin heta rêxistinên civaka sîvîl li ser heman maseyê rûniştin. Yanî li ser maseyekê rûniştin. Ev tiştekî gelek girîng bû. Yanî 80 sal bû ku tu kesî atmosfereke wiha nedîtibû. Bayekî xweş hat. Her kesî ji vî bayî bawer kir.

Hatiye çavdêrîkirin ku bi qasî getobûna siyasî, derza herêmî jî nehatiye derbaskirin di Pêvajoya Çareseriyê de. Her wekî ku hin beşdaran binê wê xêzkirin, di navbera rojhilat û rojavayê Feratê de diyalogek pêk nehat û

mecrayên ji bo vê yekê pêwîst nehatin vekirin. SCS'yan dikarî di vê qadê de rolekê bilîzin. Lê belê di vê qadê de xebatên girîng nehatin çêkirin. Nûnera SCS'yekê, ku li Enqereyê di qada zayenda civakî de xebatan dike, diyar dike ku Tevgera Jinên Kurd ku gelek SCS'yan li xwe digire, rastereast wek aliyekî li pêvajoyê beşdar bû; lê belê ev rewş ji bo wan rêxistinên jinan derbasdar nebû ku li Enqereyê xebatan dikin. Rast ji ber vê reşwê, li gorî beşdar, derza herêmî di qada civaka sîvîl de ji nû ve tê hilberandin û ji bo wan SCS'yên bi hejmareke sînordar li Enqereyê ne û xwedî li aşitiya civakî derdikevin zehmet e ku li ser meseleya kurd, çareserkirina pevçûnan û aşitiyê biaxivin. Li ser vê mijarê, beşdarekî din ji Enqereyê bi bîr dixe ku nexasim li aliyê rojava xebatên hilberandina rizamendiya civakî ji bo aşitiyê bi têra xwe nehatin kirin. Li gorî beşdar, li rojava, bi hejmareke sînordar SCS hene ku dixwazin tevkariyê li çareseriya siyasî ya meseleya kurd û aşitiya civakî bikin. Ev SCS, zêdetir ji birêvebirina xebatên hevgirtinê li gel saziyên qada kurd, divê fokisa xwe bidin ser wan xebatan ku çanda aşitiyê berbelav dikin û rizamendiyê hildiberînin ji bo aşitiya civakî.

Hin beşdar derdibirin ku meseleyên wekî getobûna siyasî ya berbelav di qada civaka sîvîl de û derzên herêmî, bi taybetî bi xebatên heqîqet û rûe birûbûnê dikarin bêne derbaskirin; lê belê SCS'yan di vê mijarê de bi têra xwe tevkarî pêşkêş nekirin. Li rexmî ku di tecrubeyên cîhanê de ev mijar cihekî gelek girîng digire û li Tirkiyeyê salên dirêj e li ser vê mijarê tê axaftin û li rexmî ku di Pêvajoya Çareseriyê de gelek hate bilêvkirin, lê belê xebatên di vê mijarê de gelek sînordar man.

### 3.3. Dînamîkên ku Beşdarbûna SCS'yan li Pêvajoyê Sînordar Kirin

Nûnerên SCS'yan li ser mijara tevkariya sînordar a SCS'yan li Pêvajoya Çareseriyê, li aliyekî îşaret bi wan meseleyan dikin ku çavkaniya wan alî ne, ji aliyekî din binê wan meseleyan xêz dikin ku çavkaniya wan civaka sîvîl bi xwe ye.

Gelek beşdar diyar dikin ku Pêvajoya Çareseriyê girtî bû bo beşdarbûna civaka sîvîl. Diyar dikin ku hêvdîtinên ku bi asteke sînordar li gel SCS'yan hatin kirin, zêdetir "usûlen" hatin kirin û aliyan SCS kirin amraz bi mebesta çêkirina rewakirinê bo karê xwe. Li gorî vê yekê, her du aliyan jî pêvajo "bi rêxistinbûneke otorîtêr a aşitiyê" bi rê ve birin û nexwestin ku civaka sîvîl li pêvajoyê beşdar bikin wek aktereke lîstik-çêker. Hukumeta AK Partiyê û Tevgera Kurdan a sereke, civaka sîvîl yan ji pêvajoyê veder kir yan jî li gorî îstîqameta daxwazên xwe daxwaz kir ku civaka sîvîl mudaxil be.

Di vê mijarê de nimûneya ku herî zêde tê bibîrxistin, Lijneya Mirovên Aqil e. Gelek beşdar binê wê yekê xêz dikin ku vê lijneyê esasen fonksiyoneke

civaka sîvîl dît û di nav wê de ji SCS'yan gelek kesayetan cih girt; di gel vê yekê di pêkhatina vê lijneyê de SCS mudaxil nebûn. Bi gotina nûnerê SCS'yeke ji Amedê, Lijneya Mirovên Aqil, "ne li gorî hêz, daxwaz yan jî keda saziyên civaka sîvîl ku dane vê pêvajoyê, lê belê beşeke mezin ji aliyê hukumetê ve û beşeke wê jî bi pirsîn ji PKK, em dikarin bêjin Ocelan, hat amadekirin". Nûnerê SCS'yekê, ku li Enqereyê li ser bingeha mafî dixebite, diyar dike ku divê Lijneya Mirovên Aqil wek pêkhateyeke serbixwe ji wan SCS'yan bihata avakirin ku di qadên ciyawaz ên wekî zarok, mafên bajariyan, astengdar û mafên mirovan de xwedî tecrube ne; lê belê hukumetê, "mutabiq li gel çanda siyasî", tercîh kir ku bi rêya "tayînkirinê" lijneyê pêk bîne.

Beşdareke din, ku di qada zayenda civakî de dixebite, diyar dike ku hukumeta AK Partiyê ne tenê endamên Lijneya Mirovên Aqil tayîn kirin, her wiha rola civaka sîvîl jî dewrî vê lijneyê kir û SCS hiştin li derve. Nûnerê SCS'yeke ji Enqereyê wê qeyranê bi bîr dixe ku di destpêka Pêvajoya Çareseriyê de bilind bûbû ji ber ku nîşeyên hevdîtineke li gel Ocelan li çapemeniyê hatibûn eşkerekirin û diyar dike ku AK Partî û HDP SCS li aliyekî hetta li gel tabana xwe jî ev mesele bi têra xwe neaxiviye. Ji ber ku levkirina bingehîn, neaxaftin bû li ser meseleyê:

> Yanî bo nimûne, gava ku aşitî hat dê çi biqewime, eger li hemû dibistanên navincî li ser vê yekê pêşbirkek bihata çêkirin, mirovan zêdetir li ser vê dikarîn xeber bidana. Heta ku ev yek tenê li pişt deriyên girtî û di navbera lineyên diyar de û li ser wan zabitnameyan pêş ve biçe ku bi zimanê çûkan hatine nivîsîn, ne mumkun e ku civaka sîvîl yan jî kesek ji kesan vê yekê wek daxwazeke civakî daxwaz bike. Wisa ku hetta partiyên siyasî yên aliyan li gel tabanên xwe jî ev mesele qet xeber nedan. Ji ber ku tiştê ku li ser li hev kiribûn, neaxaftina meseleyê bû.

Duyem, pêwîst e ew yek bê yadaştkirin ku di mijara beşdarbûna Pêvajoya Çareseriyê de li ba gelek SCS'yan bendewariyek hebû ku ji aliyê dewlet û Tevgera Kurdan a sereke ve bo wan "qadek bê vekirin". Zêdetir ji wê yekê ku wek alî, muxatab û bikera meseleyê li pêvajoyê mudaxil bin, hatiye çavdêrîkirin ku di nav wê qada lîstikê de ku aliyên rasterast ên pevçûnan destnîşan kirine û di çarçoveya wan rolan de ku bo wan hatine dayîn, SCS li pêvajoyê mudaxil bûne; meyleke wiha di nav SCS'yan de zal bû ji bo mudaxilbûnê. Bi gotineke nûnerê SCS'yekê, ku li Stenbolê li ser bingeha mafî parêzvaniyê dike, "akterên civaka sîvîl ên li Tirkiyeyê gelek zêde xwe wek aktereke pêvajoyeke diyar bi cih nakin". Lê belê SCS parçeyeke binyadîn pêk tînin di gelek pêvajoyên aşitiyê de li cîhanê.

Di lêkolîna qadê de hatiye çavdêrîkirin ku SCS'yan çareserkirina pevçûnan û meseleya avakirina aşitiya civakî bi rêjeyeke mezin wek pêvajoya

gotûbêjeke di asta pêşengiya bilind de lê mêze kirine û wek pêvajoyên ku pêwîst e di asta civakî yan jî di asta navincî de bêne birêvebirin wisa fam nekirine têra xwe. Ji vî aliyî ve gelek SCS rolên xwe bi navbînkarî, hakemî yan jî bi xebatên wekî şopandin û bi fonksiyonên parêzvaniyê sînordar dikin. Hatiye çavdêrîkirin ku saziyên navborî li ser parastina hemwelatiyan, xizmeta rasterast bo mexdûrên pevçûnan, civakîbûna nav-komî, berbelavkirina çanda aşitiyê û hêzdarkirina pêkvejiyana civakî ya hestyar bo pevçûnan ku dikarin wek xebatên "civakîkirina aşitiyê" bêne xulasekirin, têra xwe xebat nekirine.

Hukumeta AK Partiyê û Tevgera Kurdan a sereke ji bo akterên civaka sîvîl qadeke gelek sînordar vekirin û SCS jî li şûna ku înîsiyatîfê wergirin di nav bendewariyê de man, ev hemû li aliyekî, wek sêyem, tê diyarkirin ku Pêvajoya Çareseriyê di wê astê de vekirî nebû ku rê bide kontrolkariya giştî; vê yekê jî beşdarbûna SCS'yan sînordar kir. Gelek beşdar her çi qas ku qebûl dikin ku divê pêvajo di asteke diyar de girtî be ji bo ku ji aliyê wan akteran ve neyê têkdan ku li dijî wê ne, lê belê cextê li ser wê yekê dikin ku divê kontrolkariya giştî bihata pêkanîn. Gelek beşdar li rexmî ku du sal bi ser Pêvajoya Çareseriyê de derbas dibin, derdibirin ku hê nizanin bê ka "mase çima wergeriya". Bi kurtasî; li gorî gelek beşdaran, girtîbûn bo kontrolkariya giştî, astengek ji astengên girîng bû li ber mudaxilbûna SCS'yan li pêvajoyê.

Wek dawî di vê mijarê de, hin beşdar diyar dikin ku dewlet û Tevgera Kurdan a sereke, SCS ne tenê veder kirin, di heman demê de ew neçar kirin ji bo ku bibine alî. Li gorî vê yekê, her du aliyan jî zor li akterên civaka sîvîl kirin ji bo ku li ba wan rawestin û piştgiriya argomêntên wan ên siyasî bikin. Ev yek ji aliyekî ve dibû asteng ji bo ku alî ji civakê rexne, fikr û pêşniyaran bigirin der heqê pêvajoyê de; ji aliyê din ve nexasim bû sedema bêbandorbûna wan SCS'yan ku tercîh dikirin ku di "qada gewr" de bimînin.

Tevî wan kêşeyên ku li jor hatin xulasekirin, ku çavkaniya wan aliyên rasterast ên pevçûnan in, her wiha binê gelek kêşeyan tê xêzkirin ku çavkaniya wan civaka sîvîl bi xwe ye. Meseleya ku di vê mijarê de gelek caran tê cextkirin, meseleyên alîgirî û angajmanên siyasî ne ku bi ser qada civaka sîvîl de hakim in. Li gorî gelek beşdaran, ev alîgirî û angajmanên siyasî di Pêvajoya Çareseriyê de bûn asteng li ber SCS'yan ji bo ku bikarin pozîsyoneke rexnekarane bigirin û di gelek rewşan de berê wan da wê yekê ku dîskûrsên wê siyasetê rewa bikin ku alîgirê wê ne û li ser wê xetê xebatan bikin. Beşdarek, ku li ser SCS'yan dixebite, diyar dike ku di Pêvajoya Çareseriyê de kêşeyên angajmanên siyasî û alîgirî gelek diyarker bûn di vederkirina akterên siyasî de yan jî di venebûna qadeke têr de ji bo civaka sîvîl. Wek encamek ji encamên angajmanên siyasî û alîgiriya SCS'yan, akterên

siyasî li saziyên bi vî rengî, her wekî di gelek rewşan de, di Pêvajoya Çareseriyê de jî, wek wan akteran mêze kir ku piştgiriya wan dikin û tevkariyê li siyaseta wan dikin. Bo nimûne di vê mijarê de, nûnerê SCS'yeke ji Wanê diyar dike ku Platforma Edalatê ji bo Biratiyê, esasen ji ber vê alîgirî û angajmanên siyasî fonksiyona xwe ji dest da û belav bû. Nûnerê SCS'yeke ji Wanê, ku hewl dide ku di "qada gewr" de bimîne, diyar dike ku ev meseleya alîgiriyê di xebatên Lijneya Mirovên Aqil de jî derket û ji ber vê meseleyê jî esasen zemîna diyalogeke rasteqîn pêk nehat:

> Bo nimûne, di civînên parêzgehan ên zilamên aqil de ev yek gelek eşkere derkete holê. Yanî alîgirê hukumetê yan jî civaka sîvîl ku parêzerê aydolojiya hukumetê ye, bi riwangeha hukumetê mesele nirxandin. Kesên ku muxalif bûn jî di wê çarçoveyê de li meseleyê nêrîn û rexneyên xwe anîn rojevê. Te zanî, di wan civînan de [...] yanî kesekî bi paşve-avêtina gevekê yan jî bi levnêzîkbûn û rojevkirina dîskûrsên hevpar, pêvajo xwedî nekir esasen. Yanî her kes di wê demê de *bi garda xwe, bi bereya xwe, bi riwangeha xwe ya aydolojîk li meseleyan nêrîn.*

Beşdarek, ku di qada civaka sîvîl de dixebite, gaveke din wêdetir diçe û diyar dike ku SCS bi angajmanên xwe yên siyasî û tevî van angajmanan li pişt akterên ku alîgirê wan in, li pêvajoyê beşdar bûn û diyalog û gotûbêj nemumkun kirin:

> Esasen beşdaran di nav beşdarbûneke bialîgir de cih girtin. Dewletê jî wisa mêze kir, bi ya min, siyaseta kurd jî wisa mêze kir. Yanî kesên ji min, bila beşdar bin. [...] Niha, bi ya min, ev rêbazeke baş nîne ji bo gotûbêjan. Ya rasttir, gava ku alî bi piştgiriya xwe ya civaka sîvîl li çareserkirina meseleyekê beşdar bû, ku aliyên wê yên civakî yan jî ewlehiyê hene, esasen ew gotûbêjeke baş, gotûbêjeke bikalîte hilnaberîne. Hingî hûn SCS'yan li pişt angajmana polîtîkayan li hev kom dikin. Yanî gava ku her kesî SCS'ya xwe di nav angajmana xwe de anî ser maseyê, di wir de ew jixwe tenê dikare bibe maseya daxuyaniyên yek-hêlî. Ew nikare bibe maseyeke axaftinê.

Wek encamek ji encamên angajmanên siyasî û alîgiriyê, bi gotineke beşdarekî ji Amedê, SCS "li şûna ku projêksiyonên afirîner pêş xin, li ber bayê siyasetê ketin". SCS'yên ku rexnegiriya xwe ji dest dan, Pêvajoya Çareseriyê di qada giştî de erê kirin, lê belê ev rewş bû asteng li ber wê yekê ku SCS nekarin aliyên lawaz ên pêvajoyê bibînin û tevkariyê lê bikin. Jê zêdetir, vê rewşê ji aliyekî ve SCS pasîfîze kirin û ji aliyê din ve jî bi rêjeyeke mezin zerer gihande bawermendiya van saziyan ku li ba civakê heye.

Beşdarek, ku li ser SCS'yan dixebite, diyar dike ku di pêvajoyên gotûbêjan de akterên rêveker û asankarîker esasen dikarin ew akter bin ku berê neketine nav angajmanên polîtîk û di qada gewr de mane, lê belê di Pêvajoya Çareseriyê de ev yek jî pêk nehat:

> Pêwîst bû SCS ku berê neketine nav angajmanên siyasî li mijarê beşdar bûna, ku dikarin ji me re behsa wan mexdûriyetan bikin ku li Tirkiyeyê hatine serê beşên civakî yên ciyawaz û dikarin me qanî bikin ku ev mexdûriyet qewimîne. Ew beşdar nebûn. Yanî saziyên jîngehan nînbûn, eve saziyên astengdaran nînbûn, eve saziyên ku ji bo mafên bajaran hewlan didin nînbûn. Yan jî saziyên ku ji bo wekheviya zayenda civakî hewlan didin nînbûn, saziyên ku têdikoşin nînbûn. Ev hemû sazî, di nav meseleya kurd de neketine nav tu cure angajmaneke polîtîk, lê belê ev sazî esasen xwedî wê zerfiyet û potansiyelê ne ku dikarin li wan encaman serwext bin ku ji ber kêşeyan çêbûne. Ji ber ku ev li gotûbêjan beşdar nebûn, esasen me nekarî em behsa wan mexdûriyetan bo civakê jî bikin ku ji ber meseleya kurd çêbûne. Lewma jî civakê fam nekir ka em dixwazin çi çareser bikin. Yanî wisa fikir ku tiştê ku em dixwazin çareser bikin, tenê şerê heyî ye. Yanî bêdengbûna çekan. Lê belê em dixebitîn ji bo ku tiştekî çareser bikin ku wêdetir e ji bêdengbûna çekan. [...] Lewma jî vê beşdarbûna kêm ya civaka sîvîl yan jî beşdarbûna mucehhez bi angajmanên polîtîk, tevkariyek neanî ji bo Pêvajoya Çareseriyê.

Alîgiriya SCS'yan hişt ku SCS bi têra xwe karîger nebin di Pêvajoya Çareseriyê de, ev li aliyekî, her wiha rola wê yekê jî girîng bû ku xwedî tabaneke civakî ya hêzdar nebûn. Nûnerê SCS'yekê, ku li Amedê di qada civakî de xebatan dike vê rewşê bi van gotinan xulase dike:

> Lê belê di vir de, dîsan tiştek hebû ku kêm dima. Li aliyan nediket. Divê em li civaka sîvîl hinekî jî wiha binêrin; ji ber ku tabana wan lawaz e, çarneçar ev xebat hinekî din dikarin êlîtîst bimînin. Û civaka sîvîl ku tabana wan heye, çarneçar, hem di navbînkariyê de hem jî di şopandin û nirxandina van mijaran de bandora wan bêtir bilind e. Her wekî ku min got ji ber du sedeman. Hem ji ber ku nekarîn bêalîgiriya xwe biparêzin hem jî bi taybetî tabana wan nebû.

Alîgirî û lawazbûna tabana civakî û êlîtîzm jî tê de, wek sêyem, hin akter diyar dikin ku SCS di pêvajoya Çareseriyê de di mijarên çareseriya siyasî ya meseleya kurdî û avakirina aşitiya civakî de bê amadehî bûn. Nûnerê SCS'yekê, ku li Stenbolê li ser bingeha zanyariyan dixebite, derdibire ku SCS bê amadehî ketin nav pêvajoyê û ji ber vê yekê jî nekarî tevkariyeke "avaker" û "çêker" pêşkêş bike. Nûnerê SCS'yeke ji Wanê, ku bi nasnameya xwe ya îslamî-parêzgarîkar tê nasîn, diyar dike ku akterên civaka sîvîl têra xwe bela wela bûn, nedikarîn xebatên sîstematîk bikin, nedikarîn çareseriyan bo kêşeyan pêş xin, bêtecrubetiya wan li ser qada siyasî û qada civaka sîvîl tund û berbelav bû û van hemû mijaran çalakiyên SCS'yan kêm kirin. Nûnerê SCS'yekê, ku li Amedê rasterast xizmetê bo mexdûrên pevçûnan dabîn dike, derdibire ku hukumeta AK Partiyê û Tevgera Kurdan a sereke di mijarên çareserkirina pevçûnan û avakirina aşitiya civakî de bê amadehî bûn û vê yekê jî derfeteke mezin afirand ji bo ku SCS li pêvajoyê mudaxil bin. Lê belê SCS'yan li şûna ku di qadên xwe de çareseriyên pratîîk hil be-

rînin, di vê mijarê de amadehiyê bikin û zemîn xweş bikin, qîma xwe bi alîbûna pêvajoyê û bi piştgiriya aşitiyê di asta dîskûrsî de anîn:

> Bo nimûne baro. Baro esasen saziyeke girîng e di civaka me de. Li hemû cîhanê baro yek ji girîngtirîn saziyan e li her welatî. Baro li şûna ku nîqaşa parêzvaniya siyasî ya vî karî yan jî mafdarî û nemafdariya wê, rastî û şaşiya wê bikin, bi ya min divê zemîna huqûqî amade bikin. Ev ê çawa be? Rewşa hezaran ciwanên me dê çi lê bê? Rengvedana wê di çarçoveya wan maf û makeqanûnê de dê çawa be? [...] Gava ku ev hatin projesazkirin sûda wan dibe. Eger na, "ez alîgirê pêvajoya çareseriyê me", "bijî aşitî" nizanim "wî têk da" nizanim "wî filan û filan tişt kir"; ev li şûna ku tevkariyê li aşitiyê yaxud jî li Pêvajoya Çareseriyê bikin... Bi kurtasî em ji vî îşî re bêjin pasîfîzm û derbas bin.

Çarem, binê wê yekê tê xêzkirin ku bi taybetî SCS'yên mezin ku di aliyê rojava de ne û bandora wan hem li ser hukumetê hem jî li ser raya giştî heye, piştgirî nedan pêvajoyê. Nûnerê SCS'yekê, ku li Amedê di qada aboriyê de dixebite, diyar dike ku ji ber ku pêkhateyên wekî Baro, Ode û rêxistinên Kardêran xwe dûr girtin ji pêvajoyê, ev yek karîger bû ku Pêvajoya Çareseriyê bi sernekeftî bi dawî bibe. Hin beşdar derdibirin ku SCS'yên qada kurd ji bo ku ev akterên civaka sîvîl, ku li seranserê welêt bandora wan heye, piştgiriyê bidin pêvajoyê hewldanên curbecur kirin, lê belê van hewlan encamek dernexist.

Pêncem, tê diyarkirin ku helwesta xwe-dûrgirtin û rexnegirane ya partiya muxalefeta sereke Partiya Gel a Komarê (CHP), bandor li wê qada civaka sîvîl kir ku di bin bandora wê de ye. Nexasim di nav camîeya çep-sêkûlêr de gotinên wekî "HDP li gel AKP lev hat", "serokatiyê bide û xweseriya demokratîk bigre" bi awayekî berbelav diçûn û dihatin û vê yekê bi taybetî CHP û qada civaka sîvîl, ku di bin bandora CHP'ê de ye, dehf da ji bo ku xwe dûr bigirin ji pêvajoyê.

Li gorî nûnerê/a SCS'yekê, ku li Stenbolê li ser bingeha mafî parêzvaniyê dike, "em di nav atmosfereke polîtîk re derbas bûn ku nêrîna xêrxwazane li pêvajoya çareseriyê hatibû wekhevkirin li gel nêrîna xêrxwazane li AK Partiyê" û vê rewşê tevkarî li çareseriya meseleya kurdî û avakirina aşitiya civakî nekir. Her wekî ku hin beşdaran binê wê xêz kirin, bi dirêjahiya Pêvajoya Çareseriyê nîqaş û rexneyên wekî "aşitî li gel hukumeteke rast-rew çêdibe?", "aşitî li gel hukumeteke antî-demokratîk çêdibe?", "ewil demokrasî paşê aşitî", ku camîeya çep-sêkûlêr tim di rojevê de dihiştin, esasen nîşan didin ku ji bo vê camîeyê eweliyeta têkilî, rikaberî û pevçûna ku li gel AK Partiyê çêkirine zêdetir e ji çareseriya siyasî ya meseleya kurdî û avakirina aşitiya civakî. Ji vî aliyî ve camîeya dij bi AK Partiyê, her bi guman nêzîkî pêvajoyê bû, xwe dûr girt ji tevkarîkirinê, piştgirî neda û hetta serkeftina pêvajoyê nexwest.

Nûnerê SCS'yeke din, ku li Stenbolê li ser bingeha zanyariyan xebatan dike, di vê mijarê de hinekî pê de diçe û diyar dike ku ji bo camîeya SCS'yên çep-sêkûlêr ên rojava, meseleya kurdî "meseleyeke pileya duyem e". Li gorî vê yekê, di Pêvajoya Çareseriyê de di navbera eweliyeta akterên aliyê kurd û camîeya çep-sêkûlêr a aliyê rojava de cudahiyeke tûj hebû. Beşdarek, ku bi xebatên xwe yên li ser SCS'yan tê nasîn, di vê mijarê de îşaret bi çalakiyên Geziyê dike û diyar dike ku ji bo gelek akterên pêvajoya Geziyê, Pêvajoya Çareseriyê rojeva yekem nebû û nîqaşên ku li ser "çalakiyên Geziyê û kurdan" çêbûn esasen îşaret bi vê cudahiyê dikir. Lê belê Pêvajoya Çareseriyê di 21'ê Adara 2013'an de, tenê du meh berî çalakiyên Geziyê bo raya giştî hatibû ragihandin û pêwîst bû ku xwedî li pêvajoyeke wiha derketa ku ji bo peydakirina çareseriyekê bo meseleyeke wiha sojnak hatibû destpêkirin.

Hin nûnerên SCS'yan diyar dikin ku fikara zerernedan li Pêvajoya Çareseriyê hişt ku gelek akterên civaka sîvîl pasîf bisekinin û înîsiyatîfê wernegirin. Li gorî vê yekê, mijarên wekî girtîbûna pêvajoyê bo kontrolkariya giştî, tercîha Tevgera Kurdan a sereke û AK Partiyê ji bo lidervehiştina akterên sîvîl, hêza akterên dijî pêvajoyê û hestyariya parastina pêvajoyê li dijî van hêzan, hişt ku SCS "zêde ji hed bitemkîn" bin û ji bo ku zererê negihînin pêvajoyê înîsiyatîfê wernegirin.

Bi kurtasî; beşdarbûna sînordar a akterên civaka sîvîl li Pêvajoya Çareseriyê, dînamîkên sînordarker ên hem ji akterên civaka sîvîl û hem jî ji dewlet û hukumeta AK Partiyê û Tevgera Kurdan a sereke roleke girîng lîst di têkçûna pêvajoya diyaloga dawîn û gotûbêjan de. Hem ji bo baştir famkirina vê sernekeftinê hem jî ji bo wan tiştên ku akterên civaka sîvîl di pêvajoyeke muhtemel a gotûbêj û levkirinê de dikarin bikin û ji bo çêkirina sererastkirinên pêwîst ji bo vê yekê, divê li şirîkatiya sazgehî ya SCS'yan bê nêrîn. Di beşa bê de, di çarçoveya têkiliyên SCS-SCS, SCS-siyaset, SCS-akadêmî û SCS-medyayê de şirîkatiya sazgehî ya SCS'yan di Pêvajoya Çareseriyê de tê vekolîn.

## 4. SCS Û ŞIRÎKATIYÊN SAZGEHÎ DI PÊVAJOYA ÇARESERIYÊ DE

Bi tena serê xwe helwesta hukumeta AK Partiyê û Tevgera Kurdan a sereke yan jî hewlên sazgehî yên van akteran, tevkariya akterên civaka sîvîl li çareseriya siyasî ya meseleya kurd û avakirina aşitiya civakî diyar nake. Bi qasî van hewlan, şirîkatiya sazgehî ya SCS'yan jî xwedî girîngî ye. Di vê lêkolînê de, di çarçoveya şirîkatiya sazgehî ya SCS'yan de, têkiliyên SCS-SCS, SCS-akadêmî û SCS-medyayê jî hatin nirxandin.

### 4.1. Têkiliyên SCS-SCS'yan

Bi baldan li peydakên lêkolîna qadê, binê sê mijarên sereke dikare bê xêze kirin di mijara têkiliyên SCS-SCS'yan de. Ya yekem ji van, cudabûna siyasî/aydolojîk e di navbera SCS'yan de. Wek encamek ji encamên angajmanên siyasî ku SCS ketine navê, cudabûnên civakî û siyasî ku li seranserê welêt hene, tenê li qada civaka sîvîl belav nabin; di vê qadê de ji nû ve têne hilberandin. Ev cudabûna siyasî ku dibe sedema pêkhatina getoyên civaka sîvîl, di cî de ye eger bi giştî wek cudabûneke navbera SCS'yên îslamî-parêzgarîkar û SCS'yên çep-sêkûlêr bê kodkirin. Divê bê diyarkirin ku pêkhateyên ûlûsalçî-kemalîst ên li jêr bandora CHP di Pêvajoya Çareseriyê de zêdetir li derve man û li pêvajoyê muxalefet kirin. Hatiye çavdêrîkirin ku hem di getoya civaka sîvîl a îslamî-parêzgarîkar hem jî di ya çep-sêkûlêr de bi asteke sînordar be jî hevkariyek heye. Di gel vê yekê, ev hevkarî dûr in ji avakirina mêkanîzmên dewrî û mayinde.

Duyem, hatiye çavdêrîkirin ku hevkariya navbera SCS'yan zêdetir li ser bingeha sêktoran/mijaran e û xebatên ku hevdu temam dikin, sînordar mane. Mafên mirovan, zayenda civakî, xebatên koçê û zarok van qadên girîng pêk tînin ku ev cure hevkariyên sêktorî tê de derdikevin. SCS'yên ku di sêktor û mijarên ciyawaz de dixebitin, hevkariya wan gelek kêm e ku bêne ba hev û pêkve aliyên ciyawaz ên meseleyeke aloz çareser bikin. Ev rewş nîşan dide ku çanda pêkve-karkirinê di taxên wan SCS'yan bi xwe de jî ku ji aliyê siyasî ve ji xwe jev veqetiyane lawaz e û li şûna ciyawazkirina xebatan yan jî li şûna curbecurkirinê, meyla berdewamkirina karên rûtîn bihêz e.

Sêyem, hatiye çavdêrîkirin ku di navbera SCS'yan de cudabûneke herêmî heye. Piraniya mezin a SCS'yên ku li qada kurdan in –dibe ku encamek be ji encamên wan zehmetiyên jiyana rojane- bi awayekî li gel meseleya kurd têkilî danîne, berevajî vê yekê, beşeke gelek sînordar a SCS'yên ku li aliyê rojavayê welêt in der heqê mijarê de di nav hewlê de ne. Hukumeta AK Partiyê gava ku di Pêvajoya Çareseriyê de kete nav meyla çareserkirina meseleyê bi rêyên siyasî û bi pêkhatina atmosfereke mutabiq li gel vê rewşê, li aliyê rojava di qada civaka sîvîl de zindîbûnek hate meydanê. Di gel vê yekê, gava ku desthilatdara siyasî pozîsyona xwe der heqê meseleyê de guhert, bi paralêl li gel vê yekê, SCS'yên li aliyê rojava jî bi lez ji qadê vekişiyan û xwe adapte kirin li atmosfera nû ya siyasî ya bi pevçûn-tewer.

Hatiye çavdêrîkirin ku di Pêvajoya Çareseriyê de li seranserê Tirkiyeyê hin teşebus hebûn ji bo avakirina piran. Hin ji van; Platforma Hevgirtinê ya Sîvîl, Koalîsyona Belê bo Çareseriyê, Teşebusa Jinan bo Aşitiyê, Teşebusa Aşitiyê bo Zarokan. Di gel vê yekê, gelek ji van teşebusan sînordar man û jev belav bûn bêyî ku encamên girîng hilberînin. Yek ji wan qadên "nermtirîn" ku dikare di navbera qada kurd û rojava de li ser hevkarî bê çêkirin, hevkariyên "sosyo-êkonomîk" in. Di gel vê yekê, hatiye çavdêrîkirin ku hetta di vê qadê de jî têkilî gelek lawaz bûne. Nûnerê SCS'yeke ji camîeya kar û bar, vê jevqetînê bi mînakeke karîger rave dike:

> Di Hezîrana 2013'an de [...] Me bo hemû saziyên dinyaya kar û bar ên rojava, TUSÎAD jî tê de, komele, ango komeleyên ku di asta neteweyî de xwe rêxistin kirine, organîzasyonên wekî TURKONFED û TUSÎAD di serî de bo 365 ode-borseyan nivîsî. Me got ku em dinyaya kar û bar a rojava vedixwînin bi taybetî ji bo pêşvebirina rojhilat û ji bo kişfkirina potansiyêlên erdnîgariya me da ku pêşveçûna navbera herêman ji holê bê rakirin. [...] Me ev yek jî bi zelalî got. Me got ku em ne di wê îddîayê de ne ku divê hûn werin veberhênanê li vir bikin. [...] Ji bo dîtina potansiyêlan di cî de, qet nebe ji bo nîqaşkirina derfetên hevkariyê, yanî em we bi wê têgihîştinê vedixwînin ku hûn bikarin têkiliyê daynin li gel herêmê; em dixwazin mêvandariya we bikin. 3-4 heb ne tê de, mixabin [...] dinyaya kar û bar a rojava berpirsiyarî wernegirt.

Divê Platforma Biratiya Rojhilat û Rojava bê bibîranîn ku di navbera wan SCS'yên îslamî-parêzgarîkar de ji bo derbaskirina cudabûna herêmî hatibû avakirin. Di gel vê yekê, di lêkolîna qadê de hatiye dîtin ku her çi qas ku vê platformê di navbera qada kurd û aliyê rojava de pirek ava kiribe jî, bandora wê gelek sînordar bûye. Nexasim di navbera SCS'yên çep-sêkûlêr de ku li qada kurdan û aliyê rojava cih digirin, hin şirîkatî li ser bingeha projeyan hatine çêkirin. Di gel vê yekê, SCS'yên ku li qada kurdan cih digirin, diyar dikin ku têkiliyên li ser bingeha projeyan, newekhev bûne. Diyar dikin ku

SCS'yên ku ji aliyê rojava hatine, bi piranî, xwe kirine objekt. Beşdarek ji Amedê bi van gotinên xwarê rexneyê li vê şêwe têkilîdanînê digire:

> Carê, li ba rêxistinên civaka sîvîl heta radeyeke bilind edetek çêbûye ku bi awayekî hejmonîk reftar bikin. Ev yek zêdetir li ba SCS'yên ji Stenbolê heye. Yanî gava ku em di nav vê maweya 20 salî de, nexasim li wan rêxistinan binêrin ku li ser bingeha projeyan xebatan dikin, rêxistinên civaka sîvîl yan bi projeyeke Yekîtiya Ewrûpayê yan jî bi wan çavkaniyan tên herêmê ku bi awayekî ji saziyên muxtelîf dabîn kirine. Di cihekî van hevdîtinan de dibe ku civînek du civînên din filan çêbikin. Piştî wê lê dixin û diçin. Piştî ku çûn jî tu şop û rêçek ji wan namîne.

Beşdarek ji Stenbolê vê çavdêriya Amedê piştrast dike û van têkiliyan wek "têkiliyên tehekumî" pênase dike ku li ser bingeha projeyê hatine danîn:

> Di nav SCS'yên sêkûlêr de ku bi taybetî di çarçoveya mafên mirovan de li meseleya kurd dinêrin, li gel SCS'yên kurd têkiliyan çêdikin. Lê belê ez ji vê yekê re nikarim bêjim hevkarî. Ez sedemê jî bêjim; bêtir têkiliyeke patronaj dibînim li wir. Sedema wê jî ev e. Ev SCS, çavkaniyên xwe ji saziyên navneteweyî werdigirin; ji Yekîtiya Ewrûpayê, ji Neteweyên Yekbûyî filan. Çavkaniyê bi xwe bi rê ve dibe. Diçe û li Amedê karekî dike. Li gel SCS'ya li Amedê bi şirîkatî dike. Lê belê SCS'ya li Amedê, wekhev beşdar nabe li birêvebirina wê çavkaniyê. Lewma jî ya vir, heçku têkiliyeke wisa çêkiriye ji bo ku ji SCS'ya Amedê re mezinatiyê bike, pereyan bibe, zanyariyan bibe, pisporî û *know-how*ê bibe diçe wir. Têkiliyên tehekumî. Yanî eynî têkiliyên tehekumî ku dewletê li erdnîgariya kurdan çêkirine, di navbera SCS'yên kurd û wan SCS'yan de jî tên çêkirin ku li gel meseleya kurd eleqedar in.

Ji aliyê din, hatiye çavdêrîkirin ku di qada kurd de hem SCS'yên bi meyla çep-sêkûlêr hem jî SCS'yên bi meyla îslamî-parêzgarîkar, sînordar be jî, di asta herêmî de hevkarî û hevparî çêkirine. SCS'yên bi meyla îslamî-parêzgarîkar, bi rêjeyeke mezin, dixebitin ji bo ku pêvajoyên diyarkirina polîtîkayan di mijara meseleya kurd de hevpar bikin. Ji aliyê din, bandoreke girîng a Tevgera Kurdan a sereke heye li ser SCS'yên bi meyla çep-sêkûlêr û beşeke wan a girîng jî wek siyasî angaje bûne. Di gel vê yekê, divê bê bibîrxistin ku qadeke civaka sîvîl a girîng jî heye ku xwe dûr digirin ji van têkiliyên angajmanî. Beşdarek ji Amedê, diyar dike ku di nav SCS'yên bi meyla çep-sêkûlêr de, di sê qadan de hevkariyên girîng hatine avakirin. Ji van yekem, ew hevparî ne ku li dor xebatên li ser bingeha mafî pêk hatine. Di qada zayenda civakî de, nexasim hevkariya ku di navbera rêxistinên jinan de hatine çêkirin, qada duyem pêk tîne. Dawî jî, hatiye çavdêrîkirin ku di qada çandê de, SCS'yan "di mijara asantir hevnaskirin, hevfamkirin, hevguhdarîkirin û karkirina hevpar de gelek asantir têkilî danîne".

### 4.2. Têkiliyên SCS û Siyasetê

Di beşên pêştir de, di çarçoveya têkiliyên SCS û siyasetê de, binê çar kêşeyên bingehîn hate xêzkirin. Yekem, piraniya mezin a civaka sîvîl li Tirkiyeyê xwe dûr digirin ji mijarên "siyasî". SCS'yên ku li ser bingeha mafî dixebitin û behsa meseleyên "siyasî" dikin, ji %15 derbas nake. Duyem, SCS'yên ku bi awayekî behsa meseleyên "siyasî" dikin, piraniya wan a mezin "dewlet-tewer" yan jî "fokis-dewlet" e. Ev sazî, bi piranî, di mijarên siyasî yên wekî meseleya kurdî de, bi baldan li pozîsyona dewlet û desthilatdara siyasî, xwe bi cih dikin. Sêyem, SCS akterên cemserbendiya siyasî ne ku di van salên dawîn de di qada civakî de qewimî. Rikaberiyên tund di navbera akterên siyasî de û bandora vê li civakê, ji aliyekî ve li qada civaka sîvîl belav dibe û ji aliyê din ve di nav angajmanên siyasî de, SCS'yên ku "didin pey pêşengê xwe" û "getoyên civaka sîvîl" pêk tînin vê cemserbendiyê ji nû ve hildiberînin. Dawî jî, hem hêza karîger a dewletê li ser qada sîvîl û hem jî angajmanên siyasî yên SCS'yan, li Tirkiyeyê di cîhana SCS'yan de "qadên gewr" bi têra xwe teng kirine û bandora wan SCS'yan bi têra xwe sînordar kiriye ku di vê qadê de cih digirin.

Gava ku li têkiliyên SCS û siyasetê bê nêrîn di Pêvajoya Çareseriyê ya 2013-2015'an de, hatiye dîtin ku meseleyên heyî yên di vê qadê de, bi rêjeyeke mezin di vê dewrê de jî berdewam kirine. Li gorî dane û çavdêriyên di lêkolîna qadê de, yekem, Pêvajoya Çareseriyê di esil de bi wan diyalog û gotûbêjan şêwe girtiye ku di navbera akterên siyasî de çêbûne. Duyem, hukumeta AK Partiyê û Tevgera Kurdan a sereke, li gel tabanên xwe yên civakî jî bi asteke sînordar diyalog pêş xistiye û pêvajo meşandiye. Zêdetir wek pêvajoyeke diyalog û gotûbêjên navbera êlîtên siyasî berdewam kiriye. Sêyem, her du aliyan bi asteke gelek sînordar qad ji bo SCS'yan vekiriye. Çarem, SCS'yan bi piranî aliyê ku wek siyasî lê angaje bûye ji bo xwe navend girtiye û xwe bi cih kiriye; û zêdetir fokisa xwe daye ser xebatên rewakirina wê siyasetê ku lê piştgiriyê dike. Gava ku akterên siyasî li gel SCS'yan têkiliyan çêdikin, li şûna ku zemîneke rast a diyalog û gotûbêjan ava bikin, yan xebitîne ji bo peydakirina piştgiriyê bo pozîsyonên xwe yan jî ji bo çêkirina raya giştî, hevdîtinên "şeklî" çêkirine. Pêncem, hukumeta AK Partî û Tevgera Kurdan a sereke, li gel akterên civaka sîvîl ên "taxa hember" neketine nav pêvajoyeke girîng a diyalog û gotûbêjan. Beşdarek, ku li ser SCS'yan dixebite, diyar dike ku hukumeta AK Partiyê û HDP, dev ji beşdarkirina akterên civaka sîvîl ên taxa hember berdin, hetta wisa ku kesên ku di taxa wan de dengên ciyawaz derxistine, li derve hiştine:

> Yanî ez wisa dibînim ku kesên ku derdê wan li gel taxa xwe heye, ji wê taxê bin jî, li wê pêvajoyê beşdar nebûne. Yanî em bêjin kesên ku li gel HDP derdê wan heye, li ser meseleya kurd bûne pispor, li ser wê dixebitin, kesên

> ku dikarin li wê meseleyê tevkariyê bikin jî, li pêvajoyê nehatine daxilkirin; îslamxwaz e û li gel AK Partiyê pev diçe, li hember wê têdikoşe, misilmanên ku derdê wan heye li gel wê, ez wisa difikirim ku li wê pêvajoyê nehatine daxilkirin.

Di vê mijarê de, nûnerên SCS'yên ku li Amed û Wanê "di qada gewr de cih digirin" diyar dikin ku nîsbet bi HDP, hukumeta AK Partiyê bêtir girîngî daye danîna têkiliyan li gel akterên civaka sîvîl. Li gorî vê yekê, hukumeta AK Partiyê nîsbet bi HDP, xebitiye ji bo ku bêtir sûdê ji wê ezmûnê wergire ku di qada civaka sîvîl de heye. Bo nimûne, hukumeta AK Partiyê û saziyên curbecur ên giştî piştgiriya hin projeyên ji bo çareserkirina pevçûnan kiriye ku hin SCS'yan çêkirine ku li ser bingeha zanyariyan parêzvaniyê dikin; her wiha di hin mijarên diyar de ji zanyarî û tecrubeyên van saziyan sûd wergirtiye. Dawî jî, SCS'yên bi hejmareke sînordar ku di vê dewrê de tercîh kirine ku di qada gewr de bimînin, yan hatine neçarkirin ji bo alîgirtinê yan hatine amrazkirin yan jî ji pêvajoyê hatine vederkirin û bandora wan hatiye sînordarkirin.

Hatiye çavdêrîkirin ku bi paralêl li gel polîtîzasyona qada civakî, di camîeya SCS'yan de jî polîtîzasyoneke tund çêbûye û ji bilî hin teşebusan, SCS'yan tercîh kiriye ku "di taxên xwe de" bimînin. Li gorî daneyên lêkolîna qadê, gelek SCS'yan di Pêvajoya Çareseriyê de gelek caran û bi rehetî xwe gihandine akterên siyasî û diyalog pêş xistine. Di gel vê yekê, ev rehetiya ji bo danîna diyalogan nîşan nade ku li Tirkiyeyê di navbera civaka sîvîl û qada siyasetê de gotûbêj û hevkariyeke bihêz heye, zêdetir wê yekê nîşan dide ku têkiliyên SCS û siyasetê xwe dispêrin "hevhêziya fonksiyonel". Bi gotineke zelaltir, akterên ku bi motîvasyonên wekî hev tev digerin, di qadên ciyawaz de fonksiyonên hevxwedîkirinê dibînin.

## 4.3. Têkiliyên SCS û Akadêmiyê

Di çarçoveya şirîkatiya sazgehî ya SCS'yan de, gava sêyem, têkiliyên SCS û akadêmiyê hatin vekolîn. Tevî hebûna zindîbûneke girîng di Pêvajoya Çareseriyê de, têkiliyên SCS û akadêmiyê, di mijara çareseriya siyasî ya meseleya kurd û avakirina aşitiya civakî de ji aliyê sazgehî ve di asteke girîng de nînin. Li rexmî vê, hatiye çavdêrîkirin ku şirîkatiyeke girîng hatiye çêkirin di navbera SCS û wan akadêmîsyenan de ku bi taybetî bi takekesî eleqedar in li gel mijarê û li ser xebatan dikin. Ji aliyê din, hema bêje hemû beşdar hemfikr in ku zanîngeh dikarin rolên gelek krîtîk bilîzin di mijara çareserkirina meseleyê de.

Hin beşdar diyar dikin ku di salên dawî de, ku sînordar be jî, meseleya kurd di nav akadêmiya Tirkiyeyê de cih peyda kiriye. Tê derbirîn ku mijarên wekî

zimanê zikmakî, pevçûn û zarok, koça neçar, zayenda civakî, rêforma dewletê bûne mijarên têzan ku berê qet li ser xebat nedihatin kirin; û di salên dawî de gelek akadêmîsyenên ciwan gihîştine ku li ser rehendên ciyawaz ên meseleya kurd dixebitin. Bi taybetî di Pêvajoya Çareseriyê de ev xebat berbelav bûn û bêtir hatin xuyanê. Di gel vê yekê, hema bêje hemû beşdar hemfikr in ku di mijara meseleya kurdî, çareserkirina pevçûnan û avakirina aşitiya civakî de akadêmiya Tirkiyeyê di cihekî baş de nîne. Bi rastî her wekî berê, di Pêvajoya Çareseriyê de jî tevkariyeke girîng a zanîngehan çênebû. Nûnerê SCS'yekê, ku li Enqereyê li ser bingeha mafî dixebite, valahiya ku ji ber lidervemana zanîngehan çêbû, bi van gotinên xwarê pênase dike:

> Daxilbûna zanîngehan li vê pêvajoyê, girîng e. Ji ber ku vê yekê dê rengê xwe bida xwendekaran jî. Bi rêya xwendekaran jî dê rengê xwe bida malbatan. Weşan ê zêde bûbûna, weşanên zanistî. Lêkolîn ê bihatana kirin, lêkolînên zanistî. Têkiliyên van ên navneteweyî gelek baş in. Ji wir piştgiriya Tirkiyeyê bêtir bilez dê bihata kirin û tevkariyeke erênî dê lê bikira. Niha mêze kin ev yek çênebû. Ev ling gelek kêm ma.

### *Têkiliyên akadêmî û desthilatdariyê*

Piraniya nûnerên SCS'yan ku li gel wan hevdîtin hatine çêkirin, têkiliyên navbera zanîngeh û dewlet û desthilatdariyê û her wiha pêkhatina zanîngehan ku dûr e ji xweseriya îdarî û darayî û zanistî, bi sedemeke girîng dibînin ku têkiliyên SCS û akadêmiyê sînordar dikin di mijara meseleya kurdî û avakirina aşitiya civakî de. Di vê mijarê de tiştê ku yekem binê wê tê xêzkirin, bandora "aydolojiya resmî" ye li ser zanîngehan. Li gorî beşdarekî, ku li ser SCS'yan dixebite, "zanîngeh di rastiya xwe de veguheriye saziyeke wisa ku aydolojiya resmî ya dewletê lê mudaxele dike û çawa dixwaze wisa şekl dide wê". Nûnerê SCS'yekê, ku li Stenbolê li ser bingeha mafî dixebite, diyar dike ku bi bandora aydolojiya resmî zanîngeh hatine bêbandorkirin di mijara meseleya kurdî de ku yek ji girîngtirîn meseleyên welêt e:

> Ji bo xwedê, bila hevalek derkeve û bêje, ji bilî çar pênc xebatên gelek spêsîfîk di akadêmiyê de çi heye? […] Tu hemûyan bidî hev, tê çend akadêmîsyenan bijimêrî ku di vê mijarê de dixebitin. Dibe ku hûn heşt heban bijimêrin ez jî deh heban û hew. Zanîngehan çend têz hilberandine li ser meseleya kurdî ku ev 30 sal e bandorê li azadî, standartên demokratîk, aborî û çavkaniya mirovan a civakê dike? Bo nimûne çi heye li ser wê? […] Binêrin TMMOB rêxistineke pîşeyî ye. Raporeke TMMOB'ê li ser pevçûnan heye, dee mekê çêkiribû, tiştekî wê heye ku hilberandiye; ya Komeleya Mafên Mirovan jî heye. Komeleyek e, ne desteya pisporan e, dawiya dawî rêxistineke civaka sîvîl e. Ka bêjin xebateke zanîngehekê heye li ser çareserkirina pevçûnan, li ser çareserkirina pevçûnên li Tirkiyeyê, […] ev e meseleya Tirkiyeyê. Her zanîngehekê fakûlteya îqtîsadê heye, fakûlteya aboriyê heye, nizam fakûlteya huqûqê heye. Tiştek ku van li hev bicivîne te dî bi rêk û pêk…

Nûnerê SCS'yeke ji Amedê, gaveke din pêşve diçe û diyar dike ku aydolojiya resmî ne tenê zanîngeh sînordar kirin, di heman demê de ev aydolojî ji aliyê zanîngehan bi xwe ve hatiye hilberandin. Li gorî vê, zanîngeh li Tirkiyeyê "parêzvaniya aydolojiya resmî dikin". Nûnerê SCS'yekê, ku li Wanê di qada zayenda civakî de dixebite, zanîngeh çawa aydolojiya resmî hildiberînin bi van gotinên xwarê derdibire:

> Mesele ez dibînim ku mirovek ji akadêmiyê li ser koçkirinê dixebite bêyî ku meseleya kurdî lê beşdar bike. Çend roj berî niha li Wanê, li zanîngeha 100. Yil sêmpozyûmek hebû li ser eşîriyê, ez lê beşdar bûm. Mesele li wir hin têz û pêşkêşî hebûn ku hatibûn kirin. Pêşkêşî bi temamî bi zimanê dewletê hatiye çêkirin. Mesele bi temamî ew jargon dihate bikaranîn ku dewlet bi kar tîne. [...] Yanî akadêmî bi rastî jî wî tiştî nake ku bi rastî pêwîstiya civakê pê heye ji bo xilaskirina vî şerî; tiştê ku pêwîstiya dewletê pê heye dike.

Li Tirkiyeyê bi bandora aydolojiya resmî, akadêmî xwe dûr digire ji meseleyên civakî û ev rewş bandorê li pêkhatina wê ya sazgehî jî dike. Bo nimûne, nûnerê SCS'yeke din, ku li Amedê bi rêfêransên xwe yên îslamî-parêzgarîkar tê nasîn, bi bîr dixe ku li Tirkiyeyê zanîngehên ku di warê zanistên civakî de bûne pispor nînin û her wiha di van zanîngehan de "ji ber meseleyên binyadîn" ev qad lawaz in. Ji ber van meseleyên binyadîn, zanîngeh dûr in ji hilberandina çareseriyekê ji bo meseleyên civakî, saziyên ku ji saziyeke perwerdeyê derbas nabin. Li gorî nûnerê SCS'yekê, ku li Enqereyê li ser bingeha mafî dixebite, akadêmî li Tirkiyeyê xwe berpirsiyar nabîne ji çareseriya meseleya kurdî û di akadêmiyê de mirovên ku li gel meseleyên civakî eleqedar in "gelek kêm" in. "Akadêmî heta radeyeke girîng xwe dûr digire ji rastiyên Tirkiyeyê". Akadêmîsyenên ku eleqedar in li gel meseleyên civakî, zêdetir ew kes in ku di qada zanistên civakî de dixebitin. Li gorî nûnerê SCS'yekê, ku li Wanê li ser bingeha mafî dixebite, "tu ferqeke zanîngehan nîne ji saziyeke resmî ya dewlet, emniyet û teşkîlata muftîtiyê".

Ji aliyê din, li gorî nûnerê SCS'yekê, ku di qada mafên mirovan û tendirustiyê de dixebite, zanîngeh ne tenê di meseleya kurdî de, her wiha di gelek qadan de bêbandor in û ne tenê bi rêya SCS'yan li gel qada civakî, bo nimûne li gel hilberandina têknolojiyê jî nikarin peywendiyekê daynin:

> Helbet rêxistinên civaka sîvîl û akadêmî divê parçeyekî wisa bin ku jev cuda nebin. Ji ber ku tiştên ku akadêmî hildiberîne pêwîst e parçeyek bin ji avakirina rêxistinên civaka sîvîl û civakê; avakirineke jinûve û bêtir tendirust. Lê belê para akadêmiyê çi ye di hilberandina têknolojiyê de ku bikare bibeparçeyekî jinûve-avakirina civaka sîvîl û civakê. Esasen em behsa akadêmiyekê dikin ku dûr e ji qad û pratîkê; lê divê wisa nebe. [...] Bo nimûne di zanistên civakî de, akadêmîsyen mehên havînan naçe zanîngehê jî. Kesek serçavê wî/ê nabîne. Baş e, gelo li qadê ye? Na, li qadê jî nîne. Dibe ku tenê arkêolog li qadê bin ew jî ji ber ku çûne kolanê. Ji bilî wan tu kesek li qadê nîne.

### *Akadêmî û azadiya zanistî*

Li kêlek bandora aydolojiya resmî, duyem, gelek beşdar binê wan astengan xêz dikin ku çavkaniya wan binyada sazgehî ya zanîngehan e. Beşdarek, ku di qada SCS'yan de dixebite, li ser vê mijarê cextê li hejmûn(hegemony)a Yükseköğretim Kurulu (YÖK) [Civata Perwerde û Hînbûna Bilind] ê dike ku li ser zanîngehan heye. Li gorî vê yekê, "pirsgirêkên binyadîn ên YOKê, hejmûna YOKê ya li ser xwe û li ser zanîngehan, xebat û hevkariyeke wiha nemumkun dike". Li gorî nûnerê SCS'yekê, ku li Amedê li ser bingeha mafî parêzvaniyê dike, heta ku zanîngeh di nav xwe de li ser pêvajoyên aşitiyê nexebitin, di vê qadê de pêşveçûna hevkariya SCS û akadêmiyê ne mumkun e:

> Pêkhateya zanîngehan a bi navend YOK û dewlet-tewer û nebûna zanîngehên xweser li Tirkiyeyê, dibine asteng ji bo ku ev xebat di nav zanîngehan de bêne kirin. Xebatek ku di nav zanîngehan de neyê kirin, ne mumkun e ku bi rêya têkiliyên zanîngeh û SCS'yan bikare bi rê ve biçe. [...] Derfet nîne ji bo ku ev yek bi vî awayî bê sererastkirin. Heta ku li Tirkiyeyê zanîngehên azad û xweser nebin, bi ya min, qet ne mumkun e ku têkiliya zanîngeh û SCS'yan li ser pêvajoya aşitiyê bixebite.

Binyada sazgehî ya bi navenda YOKê li aliyekî, hin beşdar diyar dikin ku pirsgirêkên zanîngehan jî hene ku çavkaniya wan nav zanîngehan e. Nûnerê SCS'yekê, ku li ser bingeha mafî dixebite, diyar dike ku zanîngeh li hember meseleyên civakî yên wekî meseleya kurdî gelek şermok û bizdok in û bi "mentiqê gelek karmend" û "zîhniyeta karmendan" tev digere. Bi qasî binyada sazgehî, akadêmîsyen ji ber fikarên ferdî yên wekî karîyer-nekirin, kar-jidestdan, muxbîrîbûn û vederbûnê, xwe dûr digirin ji meseleyên civakî û di vê mijarê de xwe paşve dikişînin ji karkirinê, ev aliyekî din e ku binê wê tê xêzkirin.

Nûnerên SCS'yan ku li Amed û Wanê hevdîtin li gel wan hatin kirin, bi taybetî rexneyê li wê yekê digirin ku zanîngehên herêmê tevkarî li çareseriya meseleya kurdî nekirine. Bo nimûne, nûnerê SCS'yekê, ku li Amedê bi nasnameya xwe ya îslamî-parêzgarîkar tê nasîn, rewşa zanîngehan di mijara avakirina aşitiya civakî de bi nimûneya Zanîngeha Dîcleyê, ku li bajêr e, dinirxîne:

> Di navbera SCS û akadêmiyê de, li ser Amedê biaxivim, bi tu awayî têkiliyek nehate danîn [...] Eger em wek nimûne Zanîngeha Dîcleyê bînin, tevkariya Zanîngeha Dîcleyê çi ye ji bo çareserkirina meseleya kurdî? Hetta gelek jî paşvetir e ji tevkariya zanîngeheke ji rojava. Bi rastî pirsgirêkeke gelek ciddî ye ku Zanîngeha Dîcleyê li ser meseleya kurdî xwedî pêrspêktîfekê nebe di demekê de ku di nav dilê meseleya kurdî de cih digire.

Mijareke din ku binê wê tê xêzkirin, cemserbendiya siyasî ya navbera wan akadêmîsyenan e ku eleqedar in li gel meseleyên civakî. Hin beşdar di wê baweriyê de ne ku cemserbendiya ku di qada civakî û siyasî de çêbûye, li akadêmîsyenan jî belav bûye. Li gorî vê yekê, piraniya akadêmîsyenên ku eleqedar in li gel meseleyên civakî û li xebatên SCS'yan beşdar dibin, gelek caran qîma xwe tenê bi xebata li gel wan SCS'yan tînin ku li xwe nêzîk dibînin. Hewleke girîng nadin ji bo ku têkiliyê li gel komên ciyawaz daynin û pêkve kar bikin. Her wekî ku di qada siyasî û civakî de heye, di nav akadêmîsyenan de jî meyla "di taxa xwe ya siyasî de man" têra xwe berbelav û bihêz e.

Li rexmî van hemû sînoran, piraniya beşdaran bi bîr dixin ku di van salên dawîn de hin zanîngehên dewletê û zanîngehên taybet hewlên curbecur dane. Zanîngehên sereke ku behsa wan hate kirin ev in; Zanîngeha Bîlgiyê, Zanîngeha Sabanci, Zanîngeha Marmarayê, Zanîngeha Boxazîçiyê, Zanîngeha Hacettepe û Zanîngeha Enqereyê. Hinek ji van zanîngehan di wan de xebatên sazgehî yên curbecur hene ku di çarçoveya çareserkirina pevçûnan û avakirina aşitiya civakî de hatine kirin. Her wiha navendên lêkolînê ji bo qada civakî, bernameyên mastirê, bernameyên sêrtîfîkayan hene.

Li ser mijara têkiliyên SCS û akadêmiyê, hin beşdar diyar dikin ku SCS'yên ku li ser bingeha zanzariyan dixebitin, di van demên dawîn de, di warê meseleyên civakî de xebatên girîng encam dane û tevkariyên girîng li SCS'yên din kirine. Ev SCS'yên ku li ser bingeha zanzariyan dixebitin, bi piranî ji akadêmîsyenan pêk tên yan jî bêtir projeyên xwe bi akadêmîsyenan didin birêvebirin, ev yek girîngtirîn taybetmendiya vê tevkariyê ye.

### *Têkiliya SCS û akadêmîsyenan*

Hem ji ber bandora mehrûmker a dewletê li ser zanîngehan hem jî ji ber pêkhatina sazgehî ya heyî, li Tirkiyeyê wek sazgehî tevkariya akadêmiyê gelek sînordar e; ev yek jî bûye sedem ku gelek akadêmîsyenên ku li ser vê mijarê dixebitin wek ferdî li wan xebatan beşdar bin ku di qada civakî de tên kirin. Bi gotina nûnerê SCS'yekê, ku li Enqereyê li ser bingeha mafî dixebite, li Tirkiyeyê zehmet e ku mirov ji têkiliya SCS û akadêmiyê behs bike; zêdetir têkiliya SCS û akadêmîsyen heye. Piraniya beşdaran, li rexmî helwesta nerênî ya zanîngehan, bi hejmareke kêm bin jî, hewlên ferdî yên hin akadêmîsyenan pîroz dikin. Her wekî ku lêkolîna qadê piştrast dike ku di gelek projeyên SCS'yan de, akadêmîsyen cih digirin. Nûnerê SCS'yekê, ku li Amedê li ser bingeha mafî dixebite, vê rewşê bi van gotinên xwarê îfade dike:

> Li Tirkiyeyê, têkiliyên SCS û akadêmiyê di esil de gelek bihêz nîne. Di xaleke gelek baş de nîne. Bi giştî, têkiliyên heyî jî di esil de bi rêya wan kes û akadêmîsyenan çerx dibin ku hem di nav akadêmiyê de ne û hem jî di heman demê de lingekî wan jî di nav SCS'yê û civaka sîvîl de ne. SCS'ya A'yê li gel zanîngeha B'yê projeyek hilberandibe yan jî karên ku kiribin gelek lawaz in. Zanîngeha Sabanciyê hinek di van demên dawîn de van karan dike. Ev hinek jî esasen têkildar e li gel binyada akadêmiyê li Tirkiyeyê. Têkildar e li gel jîngeha azadiyê ku bo akadêmîsyenan hatiye çêkirin. Çi zanim, eve em li gel gelek mamosteyên ji Zanîngeha Marmarayê [...] dixebitin, em gelek karan dikin. Ji [Zanîngeha] Egeyê em dixebitin, ji [zanîngeha] Dîcleyê em dixebitin. Lê belê ev yek danûstaneke wisa nîne ku bi rêya nasnameya sazgehî ya wê zanîngehê bê kirin. Hetta belkî gava ku hûn berê xwe bidine nasnameya sazgehî, îhtîmal heye ku ew xebata we jî bê astengkirin ku hûn li gel kes dikin. Lewma jî yek bi yek bi rêya wan mamoste û akadêmîsyenan, ku li wir têkiliya we li gel wan heye, di van karan de bûne pispor, di van qadan de xebatan dikin, em têkiliyê datînin û gelek karan dikin esasen.

Tevî hebûna têkiliyeke diyar di navbera SCS û akadêmîsyenan de, hatiye çavdêrîkirin ku ev qad jî pirsgirêkên girîng li xwe digire. Li gorî nûnerê SCS'yekê, ku li Wanê bi nasnameya xwe ya parêzgarîkar tê nasîn, akadêmîsyen û SCS li hev xerîb in. Li gorî vê yekê, akadêmîsyen li gel SCS'yan têkiliyeke hîyêrarşîk çêdikin û xwe di meqameke bilindtir de bi cih dikin. Ji aliyê din; li şûna ku SCS sûdê ji ezmûna akadêmîsyenan wergirin, hinekî jî vê têkiliya hîyêrarşîk dikin bihane û xwe dûr digirin ji hevkarîkirinê. Lê belê akterên civaka sîvîl dikarin li gel akadêmîsyenan pêkve bixebitin, nexasim li ser mijara rola SCS'yan ji bo çareserkirina pevçûnan û avakirina aşitiya civakî.

Qadeke din a pirsgirêkê ku beşdaran di çarçoveya SCS û akadêmiyê de binê wê xêz dikin, kêmasiya zanyariyan e ku xwe dispêre lêkolîna qadê. Hin beşdar diyar dikin ku nexasim di lêkolînên qadê de akadêmîsyen dikarin piştigiriyeke mezin bidine SCS'yan û her wiha dikarin piştgiriyê ji wan SCS'yan bigirin ku li qadê ne. Lê belê, li gorî beşdaran, li Tirkiyeyê akadêmîsyen têra xwe dilsar in di mijara daketina qadan û çêkirina xebata qadê de. Nûnerê SCS'yeke bi meyla îslamî-parêzgarîkar li Stenbolê, diyar dike ku akadêmîsyen têra xwe çalak in di mijara şîrovekirinê de li medyayê; lê belê di xebata civaka sîvîl û qadê de hema bêje qet cih negirtin. Her wiha derdibire ku, li rexmî ku pêwîstiya civaka sîvîl û siyasetê bi wan zanyariyên heye ku xwe dispêrin lêkolîna qadê, li Tirkiyeyê di vê mijarê de kêmasiyeke mezin heye û wek sazî dixebitin ji bo ku pêwîstiyên xwe, bi xwe dabîn bikin. Beşdarek, ku li Enqereyê di qada zayenda civakî de dixebite, diyar dike ku SCS'yan heta radeyeke girîng zanyariyên qadê hilberandine û vê yekê ji bo akadêmîsyenan çavkaniyeke mezin pêk aniye; lê belê akadêmîsyen ne tenê di mijara piştgirîkirina SCS'yan de, her wiha di mijara sûdwergirtina xebatên SCS'yan de jî pasîf in. Di vê mijarê de aliyekî din

ku binê wê tê xêzkirin meyla "popîlîzm"ê ye. Li gorî hin nûnerên SCS'yan, her wekî ku di qada civaka sîvîl de heye, di qada akadêmîk de jî meylên popîlîst têra xwe bihêz in û gelek akadêmîsyen ne bi karên ku ked divê, lê bi şîroveyan dikevin nav lêgerîna popîlêrbûnê.

Ji aliyê din, lawaziya têkiliya SCS û akadêmiyê çavkaniya xwe tenê ji akadêmî û akadêmîsyenan wernagire. Bo nimûne, beşdarek, ku li ser SCS'yan dixebite, derdibire ku li ba SCS'yan meyla xebitîna li gel pispor û akadêmîsyenan têra xwe lawaz e. Di pêvajoya amadekirina projeyan de gelek caran serî li zanyariyên pisporan nayê dayîn. Gava ku neçar dimînin di projeyan de, alîkariyê ji akadêmîsyenan dixwazin wek pispor. Beşdarekî din, ku li ser SCS'yan dixebite, diyar dike ku akadêmiyê li ser meseleya kurdî gelek zêde xebat nekirine, lê belê di gel vê yekê, civaka sîvîl jî zehmetî daye akadêmiyê di vî warî de. Lê belê divê akterên civaka sîvîl jî bi awayekî fonksiyonel wan zanyariyan veguhêzin qadê ku akadêmiyê hilberandine:

> Bi rastî em ji akadêmiyê çi hêvî dikin? Bila zanyariyekê hilberînin li ser pêvajoyên çareseriyê ku li dinyayê çawa hatine tecrubekirin û daynin ber me, ne wisa? Yan jî çi zanim, mesele bila zanyarikê hilberînin ka dînamîkên li pişt çaresernebûna meseleya kurdî li Tirkiyeyê çi ne û bila daynin ber me. Mesele em li hêviya van cure tiştan in. Gava ku civaka sîvîl ev cure zanyarî bi dest xistin, xwedî wê qebîliyetê ye ku wan bixe mameleyê esasen. Ji vî aliyî ve, bi ya min, civaka sîvîl ji akadêmiyê sûdê zêde wernagire. Ji çareseriyên dinyayê, yanî ji bo hînbûn û famkirina nimûneyên çareseriya meseleyên bi vî rengî, sûd ji akadêmiyê zêde nayê wergirtin. Hetta diçe û hewl dide ji bo ku bi xwe fam bike; gelek saziyên civaka sîvîl ji bo vekolîna nimûneyên li dinyayê geşt û geran çêdikin, dikevin nav ewkan filan. Lê belê ez nikarim bêjim ku sûda akadêmiyê ji bo wir heye. Lê ya duyem jî, civaka sîvîl jî zorê zêde nade akadêmiyê di vê mijarê de. Yanî li ser vê bixebite, zanyariya vê yekê ji bo me hilberîne, yanî tu zanyariyan hilberîne û ez jî bi awayekî fonksiyonel van zanyariyan veguhêzim qadê ku te hilberandine. Pratîkên ciyawaz ez di qada civakî de pêş xim ji bo çareserkirina pevçûnan.

Wek dawî li ser têkiliya SCS û akadêmiyê di qada meseleya kurdî û avakirina aşitiya civakî de, gelek beşdar diyar dikin ku îro rewş gelek xiraptir e. Li gorî vê yekê, bi taybetî piştî ku "Akadêmîsyenên ji bo Aşitiyê" ji ber daxuyaniya ku li ser pevçûnên nav-bajaran belavkirin, rastî binçavkirin û destgîrkirin û îxracên berbelav hatin, akadêmiya ku li Tirkiyeyê jixwe gelek bipirsgirêk e hema bêje bêbandor kir. Beşdarek ji Wanê, vê rewşê bi vê hevokê "li zanîngehan kesek nema ku ji bo daxwaza aşitiyê dengê xwe derxe" pênase dike. Nûnerê SCS'yekê, ku li seranserê Tirkiyeyê li ser binegeha mafî dixebite, jiyana akadêmîk a piştî Rewşa Awarte wek "jiyaneke bîrokratîk ku bi fermandanê bi rê ve diçe" pênase dike.

Vê rewşê ne tenê bandor li wan akadêmîsyenan kir ku bi awayekî ferdî xebatan dikin, her wiha bandor li gelek SCS'yan jî kir ku li gel akadêmîsyenan dixebitin. Hin beşdar diyar dikin ku berê derfet peyda kirine ji bo ku li gel gelek akadêmîsyenan bixebitin, îro di vê mijarê de gelek zehmetiyan dikişînin. Ji aliyê din, hin gotûbêjker diyar dikin ku dema ku akadêmîsyenan destnîşan dikin ji bo ku di projeyên wan de bixebitin, bi qasî çawaniya kar, wê yekê jî li ber çav digirin ku atmosfera siyasî çawa ye û akadêmîsyenê/a têkildar, nexasim ji aliyê hukumetê ve çawa tê dîtin. Bo nimûne, nûnerê SCS'yekê ku di qada zayenda civakî û aboriyê de xebatan dike, derdibire ku dema ku ji bo projeyên xwe akadêmîsyenan hildibijêrin, neçar dimînin ku wê yekê li ber çav bigirin ka deqa bangewaziya Akadêmîsyenên ji bo Aşitiyê îmze kiriye yan na: "Me jî gava ku akadêmîsyen hilbijart, em jî ketin fikara 'eman bila îmzekerê aşitiyê nebe'. [...] Ji ber ku zarok ê bihata kuştin berî ku biwelide. [...] Bala xwe dê nedana rapora me." Bi kurtasî, têkiliya SCS û akadêmiyê ku jixwe bipirsgirêk e, piştî Rewşa Awarte paşveçûnek hate serê wê ku saxbûna wê zû bi zû çênabe.

## 4.4. Têkiliyên SCS û Medyayê

Li ser şirîkatiyên sazgehî yên SCS'yan di Pêvajoya Çareseriyê de, wek dawî têkiliyên SCS û medyayê hatin vekolîn. Gelek beşdar diyar dikin ku her wekî ku li ser qada civaka sîvîl heye, li ser qada medyayê jî hakimiyeteke dewlet û desthilatdariya siyasî heye. Ji ber vê têkiliya hakimiyetê, her wekî civaka sîvîl, medyaya sereke jî dewlet-tewer û dewlet-navend e. Lewma li gorî pozîsyana dewletê, pozîsyonê werdigirin di mijara meseleya kurdî de. Bi dirêjahiya Pêvajoya Çareseriyê, ji ber ku hukumeta AK Partiyê mesele kişande zemîneke siyasî û cara yekem bi awayekî nisbî pêvajoyeke vekirî bo raya giştî bi rê ve bir, medyayê jî piştgiriya vê pêvajoyê kir bi awayekî giştî. Medyaya sereke ku piştgiriya Pêvajoya Çareseriyê dikir, heta asteke diyar meydan li ber SCS'yan jî vekir di vê mijarê de. Di gel vê yekê, gava ku hukumeta AK Partiyê helwesteke nerênî wergirt li hember pêvajoyê, medyayê jî xwe da ser vê guhertinê û pozîsyona xwe nû kir. Nexasim piştî hewla derbeya leşkerî ya 15'ê Tîrmeha 2016'an, piraniya mezin a medyaya sereke kete bin kontrol û rêgeha hukumetê.

### *Têkiliya medya-aborî-siyasetê*

Gelek beşdar têkiliya hakimiyetê ya navbera dewlet û hukumet û qada medyayê, bi têkiliya medya-aborî-siyasetê ve girê didin. Li gorî vê yekê, îro medyaya sereke bi rêjeyeke mezin di dest komên sermayeyê de ye û ev komên sermayeyê, ji ber berjewendiyên xwe yên aboriyê, ji navikê bi siyasetê ve girêdayî ne. Lewma jî saziyên medyaya sereke li Tirkiyeyê, ne berjewendiyên giştî, berjewendiyên wê koma sermayeyê bo xwe esas

werdigirin ku pê ve girêdayî ne û têkildarî vê yekê li gel saziya siyasetê têkiliyan çêdikin. Li Tirkiyeyê, dewlet û saziya siyasetê bi saya hêz û hakimiyeta xwe ya li ser qada aboriyê, komên sermayeyê û organên medyaya sereke ku ev kom bi rê ve dibin, yan bi xwe ve girê dide yan jî pasîfîze û bêbandor dike.

Li gorî gelek beşdaran, di Pêvajoya Çareseriyê de bi paralêl li gel dewletê, medyaya sereke jî helwesteke erênî wergirt. Nûnerê SCS'yekê, ku li Amedê li ser bingeha mafî parêzvaniyê dike, diyar dike ku ji ber ku cara yekem bû ku me pêvajoya çareseriyê tecrube dikir, medyaya sereke nekarî xwe tam zelal bike ka divê li ku bisekine, lê belê di gel vê yekê jî tevkariyeke girîng li Pêvajoya Çareseriyê kir. Ji ber ku, li gel arambûna atmosfera siyasî medyaya sereke di mijara avakirina aşitiya civakî de roleke çêker lîst. Lê belê ji ber têkiliyên angajmanî yên navbera medya-aborî-siyasetê, medyaya sereke li hember helwesteke nerênî ya hukumetê, bi lez paşve gavê diavêje. Ji vî aliyî ve dikare bê gotin ku li Tirkiyeyê, medyaya sereke, bi giştî li gorî rengê desthilatdariya siyasî reng digire. Nûnerê SCS'yekê, ku di qada rûbirûbûn li gel rabirdû û edaletê de dixebite, zimanê medyayê ku piştî Pêvajoya Çareseriyê bi lez hate guhertin bi van gotinan îfade dike: "Bi awayekî giştî zimanê medyayê, belê, nîsbeten gelek baştir bû. Lê belê pir bi zû dageriya ser zimanê şer. Mesele di nav rojekê de ew ziman hate guhertin. Qet şopek ji yê berê nema." Nûnerê SCS'yekê, ku li Wanê bi nasnameya xwe ya îslamî-parêzgarîkar tê nasîn û parêzvaniyê dike, têkiliya ku di navbera civaka sîvîl û medyayê de di Pêvajoya çareseriyê de hate çêkirin wek "têkiliyeke dewrî" pênase dike:

> Ya rast, di Pêvajoya Çareseriyê de, saziyên civaka sîvîl mijara nûçeyan bûn û tim tim derdiketin ser têlevîzyonan. Li gel medyayê têkiliyên wan hebûn, daxuyaniyên wan hebûn yan jî ev hin nivîs dihatine şandin. Yanî pozîsyoneke wan a taybet hebû ji bo mijarê. Piştî ku îş xilas bû yan jî bijarde hate guhertin, têkiliya civaka sîvîl bi awayekî otomatîk qut bû. Têkiliyeke dewrî bû. Ya rast, ev jî ne rewşeke wisa ye ku bê pesendkirin.

Nûnera SCS'yekê, ku li Enqereyê di qada zayenda civakî de xebatan dike, diyar dike ku li Tirkiyeyê medya fokiskirî ye li desthilatdariyê. Li gorî vê yekê, "em dikarin bêjin, gava ku em li medyaya gelemper binêrin, medyayek heye ku desthilatdarî çi arezû bike li gorî wê xetê dîskûrsê hildiberîne". Her wiha, nûnerê SCS'yekê, ku bi nasnameya xwe ya îslamî-parêzgarîkar tê nasîn û di qada alîkariya mirovî de dixebite, diyar dike ku her wekî qada civakî û sîvîl, qada medyayê jî fokiskirî ye li desthilatdariyê û ev yek di Pêvajoya Çareseriyê de jî û piştî wê jî derbasdar e:

> Di meseleya, di meseleya rojhilatê başûr de cara yekem bi vî awayî medya, civaka sîvîl û hukumetê di heman demê de fokisa xwe da ser meseleyekê.

> Lê belê piştî ku Pêvajoya Çareseriyê xilas bû her tişt xilas bû. Dîsan vegeriya ser eynî tiştî. Nexwe li Tirkiyeyê rewşenbîr, medya, civaka sîvîl her dem li desthilatdariyê dinêre. Eger polîtîkayên wan hemaheng bin li gel desthilatdariyê, tu muşkîleyek nîne. Lê belê eger desthilatdar li meseleyekê dûr binêre yan jî şerhê dayne, medya jî rewşenbîr jî civaka sîvîl jî di wir de dabeş û parçe dibin.

Nûnerê SCS'yekê, ku fokisa xwe dide ser xebatên jinan, diyar dike ku her wekî akadêmiyê, medya jî qadeke bê gerentî ye û lewma jî kesên ku di van qadan de dixebitin gelek caran gotina xwe jê texsîr dikin:

> Gava ku we di mijarekê de heqîqet got, li rexmî ku hûn heqîqetê dibêjin, yanî ne akadêmî ne medya, ne ew qad in ku hûn bikarin lê bimînin. Gerentiya kadir(kadro)yên akadêmîk nîne; bifikire ku dê neyê derkirin û bilindbûna wê/î neyê astengkirin...çi bêjim me mînakên wiha jî hene. Mesele nehiştin ku ew akadêmîsyen bibe profêsor ku bi salan bû li ODTU'yê li ser meseleya kurdî dixebitî. Li zanîngehên din bi awayên din jî hene. [...] Ev qad, qadên biewle nînin. Lewma, serbixwe ji kesan, mekan û cihên gelek sînorkirî ne ji bo ku mirov bikare gotina xwe bêje li wan deran.

Beşeke girîng ji beşdaran diyar dikin ku piştî Pêvajoya Çareseriyê, nexasim piştî 15'ê Tîrmehê, medyaya sereke gelek zêdetir kete bin kontrola desthilatdariya siyasî. Ev rewş rasterast rengê xwe dide meseleya kurdî û xebatên avakirina aşitiya civakî jî. Li gorî nûnerê SCS'yekê, ku li Amedê li ser bingeha mafî parêzvaniyê dike, “vê gavê dewlet behsa çareseriyê nake. Naxwaze ku medya jî jê behs bike. Niha yanî medya bi temamî ditirse ku polîtîkayekê, xebatekê pêş xe ji derveyî hukumet û polîtîkayên hukumetê bi her aliyî ve”. Beşdarekî din ji Amedê, diyar dike ku ev rewş ne taybet e bi hukumetê, hemû tevgerên siyasî karên bi vî rengî dikin. Beşdar binê wê yekê xêz dike ku bi xebatên bêîtîbarkirin û popîlerkirinê, sîmayên ku berî Pêvajoya Çareseriyê û piştî wê derdikevin medyayê, bi awayekî bingehîn hatine guhertin.

Nûnerê SCS'yekê, ku li Amedê di qada mafên mirovan de dixebite, destnîşan dike ku xebatên me yên sazgehî di Pêvajoya Çareseriyê de, kêm be jî, di medyaya sereke de cih digirtin, lê belê îro sîmayên ku “ji hilbijartineke diyarkirî derbas bûne” dihêlin ku derkevin medyayê. Jê zêdetir, medyayê di Pêvajoya Çareseriyê de kêm be jî rolek lîst di mijara amadekirina civakê bo çareseriya siyasî de. Lê belê îro, vê rolê bidin aliyekî, li hemû kenalên têlevîzyonên sereke fîlm û rêzefîlmên ku Pêvajoya Çareseriyê bi awayekî nêgatîf nîşan didin tên lîstin. Bi gotina beşdarekî di van rêzefîlman de “qayimqam radihêle çeka xwe û li deşt û çiyayan dikeve pevçûnan.” Ji vî aliyî ve medyaya sereke ne tenê cih nade dengên ciyawaz, her wiha mîlîtarîzmê belav dike û civakeke mîlîtarîst hazir dike.

## *Cemserbendiya siyasî û medya*

Tevî hakimiyeta dewlet û desthilatdariya siyasî li ser medyayê, wek duyem, hin beşdar diyar dikin ku cemserbendiyên qada civakî û siyasî her wekî ku li qada civaka sîvîl jî belav bûne, li qada medyayê jî belav bûye. Li gorî vê yekê, cemserbendiya civakî li Tirkiyeyê qada siyaset, civaka sîvîl, akadêmî û medya jî dorpêç kiriye. Li gorî beşdarekî, ku li ser SCS'yan dixebite, ji ber cemserbendiyê li Tirkiyeyê bere pêk hatine û di her bereyê de saziya siyasetê, civaka sîvîl, akadêmî û medya pêkve tev digerin û niha jî kenalên diyalogê yên navbera van bereyan bi têra xwe daketiye asteke sînordar:

> Bi ya min, di meseleya kurdî de komeke wiha bi sê-hêl heye. SCS, medya û akadêmîsyenên vê koma bi sê-hêl bi xwe jî heye. Yanî îro mesele yek du ewk hene ku hûn bikarin nûçeyên SCS'yên bi meyla çep û nêzîktir li fikrên çep peyda bikin. Çi ye? Ev [rojnameya] Birgun heye, çi zanim ev bi awayê online T24, Diken filan heye. Lê belê hemû tiştê wan SCS'yan heye ku nêzîk in li dewletê. Ya Tevgera Kurdan cuda heye. Her wiha ya ûlûsalçiyan cuda heye. Li wir mumkun e em bikarin bêjin çar heb. Lewma, yanî ev cemserbendî ew qas çûye nav çermê me ku bi akadêmiya xwe, bi medyaya xwe, bi SCS'ya xwe hemû wek komekê berdewam dike.

Nûnerê SCS'yekê, ku li Wanê bi nasnameya xwe ya îslamî-parêzgarîkar tê nasîn, bi bîr dixe ku li herêmê jî ev cemserbendî di navbera AK Partî û HDP de diqewime û diyar dike ku her wekî medyaya hukumetê, medyaya nêzîk li Tevgera Kurdan a sereke jî, bêalî û serbixwe nîne. Dibêje ku li aliyekî çapemeniyeke “dewletparêz” heye, li aliyê din medyayeke ku “propagendeyê bo rêxistinê dike” heye. Diyar dike ku di Pêvajoya Çareseriyê de ji ber vê tabloyê, nexasim li Wanê dengê SCS'yan ji aliyê organên medyaya serdest ve pir zêde nehate bihîstin.

## *Kêşeyên sazgehî yên medyayê*

Hin beşdar diyar dikin ku mirov nikare helwesta nerênî ya medyaya sereke di mijara meseleya kurdî û aşitiya civakî de tenê bi têkiliya navbera medya-aborî-siyasetê çarçove bike. Li gorî vê, çarçoveya normatîf a medyaya sereke jî di vê mijarê de bi têra xwe bipirsgirêk e. Diyar dikin ku fikr û asoya “bila kurd dayika xwe nebîne” ku serdest e li ser siyaseta Tirkiyeyê, bi awayekî berbelav medyaya sereke jî vê yekê dişopîne. Ji vî aliyî ve mirov nikare tenê wek akterekê li medyayê binêre ku “neçar e wan gotinan bike” ku siyaset û sermaye jê re dibêje. Medya di meseleya kurdî de, ne tenê bêpar nîne ji pirsgirêkên wekî neteweperestî, mîlîtarîzm, vederkirin, tunehesibandin û biçûkdîtinê ku têkildar in li gel çarçoveya normatîf, her wiha aktereke wisa ye ku gelek caran vê çarçoveyê ji nû ve hildiberîne û li civakê belav dike. Bo nimûne, nûnerê SCS'yekê, ku di qada windahiyan de dixebite, diyar dike

ku medyaya sereke, ne tenê di Pêvajoya Çareseriyê de, her wiha hema bêje her dem bûye “belavkara aydolojiya resmî”.

Hin beşdar balê dikişînin ser zimanê medyaya sereke. Li gorî nûnerê/a SCS’yeke îslamî-parêzgarîkar, ku li ser bingeha mafî parêzvaniyê dike, pêwîstî bi “ziman û têrmînolojiyeke ku zimanê aşitiyê ava bike, pêvajoya aşitiyê li ber çavan bigire û li ser wê baldar be” heye. Lê belê medyaya sereke bide aliyekî, li ser wê medyayê jî ku wek aliyê aşitiyê tê dîtin, zimanekî “her dem yêdinkirin, biçûkdîtin û rêzlênegirtinê, yanî ez ji bo hemûyan dibêjim, hem ji bo medyaya muxalif hem ji bo saziyên ku em dikarin bêjine wan medyaya muxalif, ev yek li ser wan jî” serdest e.

Hin beşdar diyar dikin ku zerfiyeta şexsî/rewşenbîrî ya wan kesan der heqê meseleyê de jî gelek girîng e ku di van saziyên medyayê de dixebitin. Tê bibîrxistin ku bi taybetî kesên ku spîkeriyê di kenalên têlevîzyonê de dikin, yan jî pêşkêşkariya bernameyan dikin, roleke krîtîk lîstin di vê mijarê de. Diyar dikin ku rojnamegerên ku spîkerî yan jî pêşkêşkariyê dikin, divê der heqê mijarê de ezmûneke wan a rewşenbîrî/têorîk û zanyariyeke wan a dîrokî û cografîk hebe. Di gel vê yekê, piraniya xebatkaran ji nûçegihaniyê tên û di vê mijarê de xwedî ezmûneke têr nînin.

### *Pirsgirêkên ji ber SCS’yan*

Tevî wan pirsgirêkan ku ji ber medyayê ne, hin beşdar îşaret bi wan pirsgirêkan dikin ku çavkaniya wan SCS bi xwe ne. Aliyê yekem ku di vê mijarê de binê wê tê xêzkirin, zerfiyeta akterên civaka sîvîl e ku medyayê mobîlîze dike. Hin beşdar diyar dikin ku SCS’yan têra xwe girîngî nedaye mijarên xwe-gihandina medyaya sereke, têkilîçêkirin û têkilîpêşxistin li gel wê; di vê mijarê de pirsgirêkeke zerfiyetê ya girîng heye. Li gorî vê, pirsgirêkên binyadî yên medyaya sereke, astengên girîng çêdikin li ber SCS’yan. Di gel vê yekê, nikare bê gotin ku SCS’yan têra xwe hewl daye ji bo ku zorê bide van sînoran û derfetên heyî bi kar bîne. Nûnerê SCS’yekê, ku li Wanê parêzvaniyê dike, vê rewşê wek lawaziya zerfiyeta “birêvebirina îdrakê” ya civaka sîvîl rave dike:

> Kêmasiyek heye di civaka sîvîl de li ser birêvebirina îdrakê yaxud berdewamîdan bi wê bîr û baweriyê ku ew dixwaze. Kêmasî, kêmasiya civaka sîvîl e. Rewşek e ku têkildar e li gel pêşkêşkirin û daxwazkirinê. Hûn vê bîr û baweriya xwe venaguherînin pêwîstiyekê. Yan jî gava ku we xwe li ser ferz nekir, medya jî zêde bala xwe nade we. Di vir de problem, problema civaka sîvîl e. Yanî dikarin biçin û li ser vê mijarê îdrakên gelek paş çêbikin, têkilî û girêdanên gelek baş çêbikin. Mesele jixwe li ser îdrakan dimeşe û mixabin îro ya ku îdrakê çêdike medya ye. Ji vî aliyî ve kêmasiyeke ciddî heye.

Beşdarek, ku li ser SCS'yan dixebite, diyar dike ku pirsgirêkên binyadî yên medyayê hene di têkiliya SCS û medyayê de, di gel vê yekê pirsgirêka bingehîn têkildar e li gel SCS'yan. Li gorî vê yekê, akterên civaka sîvîl nikarin "naverokekê, ku bikare di medyayê de bê nîşandan" hilberînin. Ev alî, bi têra xwe astengeke girîng e li ber temsîlnebûna SCS'yan di medyayê de:

> Yanî ez wisa nafikirim ku li Tirkiyeyê saziyên civaka sîvîl serkeftî bin di veguhestina meseleyên xwe de bo ser medyayê. [...] Naverokên ku SCS hildiberînin, ya rast, ne ew naverok in ku bikarin di medyayê de cih bigirin. Bi ya min, SCS du cure deqan hildiberînin, du cure naverokan hildiberînin. Yekem; deqên giran, xemilandî; xwendin, famkirin û xebitandina wan dijwar hildiberînin. Evane, raporên mezin û kûr in ku, bi ya min, karekî ku akadêmî divê bike, dikin. [...] Ya duyem; deqên polîtîk dinivîsin, yanî deqên propagendeyê dinivîsîn SCS. Yanî SCS'ya jîngehê dişîne, ku bi "Roj nîne ku xirapkariyeke jîngehî çênebe, qetlîam çênebe" dest pê dike û deqên wisa dinivîsin ku pozîsyona xwe li ser xwîneran ferz dike. Gava ku wisa jî bû, hemwelatî têkiliyê li gel SCS'yê çênake. Medya qet çênake. Yanî ne ew deq in ku di medyayê de bêne temsîlkirin.

***SCS û medyaya "muxalif"***

Wek encamek ji encamên dîlgirtina medyaya sereke ji aliyê aborî û siyasetê ve, hatiye çavdêrîkirin ku gelek SCS'yên ku di mijarên "hestyar" ên wekî meseleya kurdî û avakirina aşitiya civakî de xebatan dikin, karîne cih ji bo xwe di medyaya "muxalif" de peyda bikin ku bi awayekî sînordar dikarin xîtabî beşên civakî bikin. Beşdarek, ku li ser SCS'yan dixebite, diyar dike ku medyaya muxalif, li rexmî hemû sînoran, derfetên girîng çêkirin ji bo civaka sîvîl:

> Helbet divê mirov medyayê di mijara meseleya katêgorîzasyonê de bike du beş. Yek ji wan, ku em jê re dibêjin medyaya berbelav yan jî em vê têgehê tim bi kar tînin, bi gotina xelkê havuz medya [medya hewzê] yan jî medyaya ku em jê re dibêjin medyaya sereke, zêdetir ewk e; zêdetir qada sîvîl bi ciddî wernagire, qadeke ku pêrspêktîfa wê gelek ciyawaz e. Yek jî beşek heye ku li derveyî vê ye. Yanî qadek heye ku zêdetir em jê re dibêjin medyaya înternêtê. Yek jî beşên vê yên nivîskî hene, beşên nivîskî û çapkirî hene. Ev qad hinekî din nêzîk e li civaka sîvîl. Têkiliyên li gel van hinekî din berbelav in. Hetta ez dikarim bêjim ku rûyê beşa duyem a medyayê li cîhana civaka sîvîl e. Helbet ev şansek e ji bo civaka sîvîl. Bi rastî, her ku dewlet berê xwe dide wan, ew derfetên nû çêdikin ji xwe re, ji bo ku dubare vebin, ji bo ku dubare dengê xwe ragihînin. Civaka sîvîl jî ji aliyekî ve kêfxweş e ku li gel wan pêkve dixebite.

Gelek beşdar bi bîr dixin ku di çarçoveya Rewşa Awarte de, ku piştî 15'ê Tîrmehê hate ragihandin, piraniya organên medyaya muxalif hatin girtin ku cih didan meseleya kurdî û xwe di qada avakirina aşitiya civakî de bi cih

dikirin û di vê mijarê de weşanên sîstematîk dikirin; rojnamegerên muxalif hatin destgîrkirin. Qada medyaya muxalif îro gelek zêde hatiye tengkirin. Ji vî aliyî ve divê bê destnîşankirin ku derfetên navborî îro têra xwe kêm bûne. Her wiha, her wekî ku beşdar binê wê xêz kir, çi qas ku medyaya altêrnatîf/muxalif ji bo SCS'yan derfetên girîng çêke jî, ji bo xwe-gihandin bi beşên civakî yên berfireh, girîng e ku akterên civaka sîvîl xwe bigihînin medyaya sereke.

### *Medyaya civakî*

Qadeke din ku di van salên dawîn de ji bo xwe-gihandina beşên civakî yên berfireh di qada civaka sîvîl de berbelav bûye, medyaya civakî ye. SCS bi giştî wek mecrayeke altêrnatîf li medyaya civakî dinêrin ji bo ku xebatên xwe veguhêzin civakê. Di gel vê yekê, diyar dike ku qada medyaya civakî sînorên girîng li xwe digire. Ji vî aliyî ve, bi piranî, wek qadeke temamker a medyaya tradîsyonel, li medyaya civakî tê nêrîn. Gelek beşdar binê wê yekê xêz dikin ku li rexmî ku SCS agahdar in ji bandora medyaya civakî ku bilind dibe, lê belê dîsan jî veberhênaneke sînordar li vê qadê dikin. Beşdar wek dawî di mijara medyaya civakî de binê hin xetereyan xêz dikin.

Gelek nûnerên SCS'yan cextê li ser girîngiya amrazên medyaya civakî yên wekî twitter, facebook, periscope dikin ji bo ku SCS dengê xwe bigihînin civakê. Hin beşdar, serbixwe ji rewşa li Tirkiyeyê, cextê li ser wê girîngiya medyaya civakî dikin ku li seranserê cîhanê di cîhana ragihandinê de zêde dibe. Di vê mijarê de bi taybetî ew yek tê bibîrxistin ku ciwan bi awayekî berbelav û çalak medyaya civakî bi kar tînin. Li gorî vê yekê, medyaya civakî li kêlek medyaya tradîsyonel, wek ragihandineke altêrnatîf û kenaleke agahdarbûnê, ciwan di serî de di nav hemû beşên civakî de her ku diçe zêdetir tê bikaranîn. Hatiye çavdêrîkirin ku cîhana SCS'yan jî, ne sîstêmatîk be jî, li medyaya civaka sîvîl daxil bûye bi paralêl li gel vê guhertina qada civakî.

Hin beşdar, tevî vê meyla li seranserê cîhanê, binê rewşa li Tirkiyeyê jî xêz dikin. Li gorî vê yekê, hakimiyeta dewlet û desthilatdariya siyasî ya li ser medyaya sereke ya tradîsyonêl dihêle ku SCS jî di nav de gelek akter berê xwe bidine medyaya civakî. Nûnerê SCS'yekê, ku li ser bingeha mafî parêzvaniyê dike, diyar dike ku nexasim piştî 15'ê Tîrmehê, medyaya civakî bû "yekane altêrnatîf" û "altêrnatîfeke bihêz". Nûnerê SCS'yekê, ku di qada huqûq û edaletê de dixebite, bi bîr dixe ku li gel Rewşa Awarte, desthilatdariya siyasî hakimiyeta xwe li ser medyaya tradîsyonêl zêde dike û organên medyaya muxalif digire; û medyaya civakî jî wek "altêrnatîfeke mecbûrî" pênase dike.

Di gel vê yekê, hin beşdar diyar dikin ku li Tirkiyeyê zextên li ser medyaya civakî, çalakbûna vê qadê heta radeyeke girîng kêm kiriye. Ji bo ku SCS van qadan bi awayekî çalak bi kar bînin, serê pêşîn, di mijara standardên medyaya civakî de “xebatên ku li seranserê cîhanê ji aliyê cîhanê ve hatine qebûlkirin ku dikevine çarçoveya azadiya ra-derbirînê divê sûc neyên hesibandin”. Bi gotina beşdarekî, ji ber ku “li Tirkiyeyê dadwerî di vê mijarê de ezmûneke gelek xirap dide”. Li ser vê mijarê, nûnerê SCS’yekê, ku li Wanê di qada zayenda civakî de dixebite, destgîrkirinên berbelav bi bîr dixe ku ji ber parvekirinên medyaya civakî qewimîne. Her wiha nûnera SCS’yekê, ku li Enqereyê di qada zayenda civakî de dixebite, binê wê yekê xêz dike ku di mijara bikaranîna medyaya civakî de li Tirkiyeyê oto-sansoreke berbelav heye.

Hin beşdar dibêjin ku SCS li Tirkiyeyê pir bi asteke sînordar dikarin xwe bigihînin medyaya tradîsyonêl; di gel vê yekê bi rêya medyaya civakî pir bi karîgertir dikarin xebatên xwe ragihînin raya giştî. Nûnerê SCS’yekê, ku di qada alîkariya mirovî de dixebite, derdibire ku medyaya civaka sîvîl bûye amrazek ji bo ku SCS xwe bigihînin mirovan û wek sazî jî vê yekê pir bi çalakane bi kar tînin. Nûnerê SCS’yekê, ku li Amedê bi nasnameya xwe ya îslamî-parêzgarîkar tê naskirin, derdibire ku girîngtirîn nîşaneya bandora medyaya civakî, hejmara wan mirovan e ku xwe gihandine wan û diyar dike ku SCS’yan bi rêya medyaya civakî xwe gihandiye gelek zêdetir mirovan:

> Niha (medyaya civakî) hem ji bo civaka sîvîl hem ji bo medyaya nivîskî û devkî, bi awayekî ciddî bûye altêrnatîfek. Yanî niha kesek, ku xwedî 10-15 hezar şopîner e, gava ku twittekê yan jî li ser facebookê tiştekî parve dike, pir bi rehetî dikare xwe bigihîne sê-pênc hezar kesî. Yanî îro gava ku em li ser bingeha lokalî lê binêrin, asta xwendinê bo baştirîn rojnameya lokalî hezar-hezar û pênc sed kes e. Yanî gava ku hûn li ser asta neteweyî lê binêrin, baştirîn rojnameya neteweyî heft sed hezar, heşt sed hezar tê firotin, mumkun e du sed-sê sed hezar xwînerê wê hebe. Ew jî carinan du sed-sê sed hezar nabe. Lê belê twittek ku kesekî nivîsiye, di carekê de dikare bigihê ber destê sed hezaran.

Beşdarekî din diyar dike ku mumkun e ku bi rêya medyaya civakî bandor li medyaya tradîsyonêl bê kirin. Ji ber ku, gava ku SCS di qada medyaya civakî de karîger dibin, bandora ku ji vir derdikeve, rengê xwe dide medyaya tradîsyonêl jî û mirov dikare li wir cihekî bo xwe peyda bike.

Nûnerê SCS’yekê, ku li Amedê di qada jin û aboriyê de dixebite, her wiha diyar dike ku di medyaya civakî de kontrola wan gelek zêde ye û dikarin nûçeyên xwe taybetmend bikin û “cureyeke medyayê hûn bo xwe” çêdikin. Li gorî vê yekê, şansê SCS’yan ji bo beralîkirina medyaya tradîsyonêl

yan nîne yan jî gelek sînordar e. Zanyariyên ku SCS hildiberînin; saziyên medyayê li gorî eweliyetên xwe wan sererast dikin, gelek caran teng dikin û carinan jî manîpîle dikin û diweşînin. Li hember vê yekê, SCS di qada medyaya civakî de gelek zêdetir xwedî kontrol in û peyamên ku dixwazin bigihînin civakê, bi rêya "çapemeniya xwe" ku wan pêk aniye, rasterast şêweyekî didin wan û radigihînin.

Gelek beşdar, di çarçoveya têkiliya medyaya civakî û SCS'yan de, diyar dikin ku medyaya civakî tevkariyê li demokratîkbûnê dike. Medyaya civakî ku derfetên rêxistinbûn, şefafbûn û pirên civakî diafirîne, ji bo SCS'yan jî dikare bibe qadeke altêrnatîf. Li gorî vê yekê, medyaya civakî bi dabînkirina derfetên xebergihandina bilez û çalak tevkariyê li rêxistinbûnê dike. Her wiha, bidestxistina çavkaniyên ciyawaz ên xeberan mumkun dike û veşartîbûnê dijwar dike û sûdê dibexşe şefafbûnê. Dawî jî, derfetan diafirîne ji bo xwe-gihandina beşên civakî yên ciyawaz û avakirina pirên civakî. Di çarçoveya her du fonksiyonên yekem de, gelek beşdar hemfikr in di mijara çalakbûna medyaya civakî de. Di gel vê yekê, gelek beşdar xwedî bîr û baweriyeke nerênî ne di mijara xwe-gihandina beşên ciyawaz û avakirina pirên civakî de. Ji ber ku li ser medyaya civakî jî kombendî heye û mirov bi gelemperî xwe digihînin wan kesan ku dişibin wan. Li gorî beşdarekî, ku li ser SCS'yan dixebite, krîtîktirîn mesele di mijara medyaya civakî de, xwederbaskirin e ji "cemaeta xwe":

> Eger şandeyên we dîsan tenê ew cemawer bibîne ku hûn xîtabî wê dikin, eger ew bişopînin, eger hûn nekarin ji wan wêdetir biçin, esasen tê wê wateyê ku hûn tenê dîsan ji bo cemaeta xwe, tenê ji bo şopînerên xwe weşanê dikin. A di vir de krîtîktirîn mesele jî herhal ev e ku em ê çawa ji wê wêdetir biçin.

Ji aliyê din, gelek beşdar diyar dikin ku medyaya civakî ji aliyê SCS'yan ve nayê bikaranîn û veberhênaneke têr li vê qadê nayê kirin. Li gorî gotûbêjkerekî, ku li Amedê li ser bingeha zanyariya parêzvaniyê dike, civaka sîvîl bi awayekî kamil ji medyaya civakî sûdê wernagire. "Li ser vê mijarê, ezmûna wê nîne, zanyariya wê nîne, xwe pêşve nabe. Zêdetir yek du kes bargîriya vî karî digirin ser xwe di rêxistinên civaka sîvîl de." Nûnerê SCSyekê, ku camîeya kar û bar ava kiriye, diyar dike ku rêxistinên kardêran jî tê de, gelek SCS pirsgirêkên sazgehîbûnê dijîn, çavkaniyên wan ên darayî *sînordar* in û di vê mijarê de xwedî pêrsonelên wesifdar nînin. Ev hemû mijar ber li SCS'yan digirin ji bo ku medyaya civakî çalakane bi kar bînin. Di gel vê yekê, sînordar be jî, hatiye çavdêrîkirin ku hin SCS girîngiyeke mezin didin vê qadê û veberhênanê li ser dikin. Beşdarek, ku li ser SCS'yan dixebite, diyar dike ku rêxistinên ku sazgehî bûne, medyaya civakî baş bi kar tînin. SCS'yên ku li ser bingeha zanyariyan parêzvaniyê dikin, rêxistinên mafên mirovan û mueseseyên pîşeyî ji vî aliyî ve medyaya civakî baştir bi kar tînin.

Gelek beşdar tevî derfetên heyî yên medyaya civakî, binê sînorên wê jî xêz dikin. Nûnerê SCS'yekê, ku li Amedê di qada mafên mirovan de dixebite, derdibire ku medyaya civakî nikare bibe altêrnatîf bo medyaya tradsîyonêl di serî de, ji ber ku ji aliyê çendaniyê ve derfetên wê tenê ji bo xwe-gihandina beşeke gelek sînordar, guncaw in. Her wiha, mirovên ku xwe bi wan digihîne, ew mirov in ku beşeke girîng ji wan, jixwe bi meraqa xwe ya taybet medyaya civakî bi kar tînin û xwe digihînin zanyariyên altêrnatîf. Gava ku ev kom me da aliyekî, hejmara wan mirovan gelek sînordar e ku bi rêya medyaya civakî gihîştine wan. Nûnerê SCS'yekê, ku li Wanê li ser bingeha mafî dixebite, binê wê yekê xêz dike ku bi taybetî hemwelatiyên ku di qada gundewar de dijîn di navbera wan de bikaranîna medyaya civakî gelek sînordar e û derfeta SCS'yan nîne ku tenê bi rêya medyaya civakî bi awayekî berbelav xwe bigihînin mirovan. Li gorî nûnerê SCS'yekê, ku li Stenbolê di qada pêkvebûna civakî ya hestyar bo pevçûnan de dixebite, medyaya civakî rêyeke baş e ji bo xwe-gihandina nifşê ciwan ku bi awayekî berbelav wê bi kar tîne, lê belê amrazeke sûdewer nîne ji bo xwe-gihandina komên navsere û ser-navsere. Nûnerê SCS'yekê, ku li Enqereyê di qada mafên mirovan de dixebite, balê dikişîne ser têkiliya navbera medyaya civakî û çînê. Li gorî vê yekê, medyaya civakî ji aliyê çîna navincî û çîna ser ve bi awayekî berbelav tê bikaranîn, lê belê derfetên kesên feqîr têra xwe sînordar in ji bo xwe-gihandina çavkaniyên wekî mobayla jîrek û girêdana timî ya înternêtê ji bo ku medyaya civakî bi kar bînin.

Li ser vê xalê, hin beşdar diyar dikin ku medyaya civakî zêdetir ji qadeke altêrnatîf, divê wek qadeke "temamker" lê bê nêrîn. Nûnerê SCS'yekê, ku li Enqereyê di qada mafên mirovan de xebatan dike, vî aliyê temamker ê medyaya civakî bi van gotinên xwarê îfade dike:

> Pêwîstî bi wê yekê heye ku hemû mecra di heman kêliyê de bêne bikaranîn. Helbet divê medyaya civakî bê bikaranîn. Tevkariya wê mezin e li xebatên xuyabûn, nasîn û agahdarbûnê. Lê belê heta ku ragihandina rûbirû û yekbiyek nebe, şaşiyeke wisa çêdibe ku bi medyaya civakî tenê ragihandin çêdibe. Ji bo pêkanîna guhertina reftaran, pêwîst e ku çavbiçav lev-nêrîn hebe di heman demê de û di heman derê de.

Beşdarek, ku li Enqereyê li ser bingeha mafî parêzvaniyê dike, li ser vê mijarê diyar dike ku SCS divê pêdagir bin di mijara xwe-gihandina medyaya tradîsyonêl de. Ji ber ku, têkiliya navbera SCS û medyaya tradîsyonêl, çawa ku tevkariyê li cîhana SCS'yan dike, her wiha tevkariyê li medyayê bi xwe jî dike: "Bi ya min, SCS divê tenê berê xwe nedine medyaya civakî. Divê em dev ji medyaya sereke bernedin. Ji ber ku eger têkiliyên medyaya sereke li gel rêxistinên mafên mirovan û rêxistinên jinan qut bibe, rewş dê xiraptir lê were."

Beşdar binê wan kêşeyan xêz dikin ku çavkaniya wan medyaya civakî ye. Nûnerê SCS'yekê, ku di qada jin û aboriyê de dixebite, derdibire ku her wekî qada medyaya tradîsyonêl, di qada medyaya civakî de jî monopolbûnek heye û ev monopol medyaya civakî beralî dikin. Gotûbêjkerek, ku li Amedê li ser bingeha zanyariyan parêzvaniyê dike, diyar dike ku medyaya civakî mirovan de-mobîlîze dike. Li gorî vê yekê, mirov li şûna ku bi rastî li bûyerên civakî mudaxil bin, "bi twittekê dixwazin ku xwe ji hemû gunehên xwe paqij kin". Beşdarek, ku li Stenbolê di qada zayenda civakî de dixebite, li rex vê fikrê ye û diyar dike ku medyaya civakî dikeve dewsa têkilîdanîn û ragihandina rasterast û dibe asteng li ber pêşveçûna tevgerên civakî bi wateya rasteqîn. Nûnerê SCS'yekê, ku li ser zarokan xebatan dike, diyar dike ku di hin rewşan de bi rêya medyaya civakî deng tê derxistin, lê belê bi rêya vê qadê çêkirina "bend û peywendiyê" li gel mirovan pir ne mumkun e.

Nûnerê SCS'yekê, ku li Wanê li ser bingeha mafî dixebite, bi bîr dixe ku medyaya civakî di heman demê de vekirî ye bo manîpîlasyonê. Gelek zanyarî, dikarin rengekî din bigirin gava ku li ser medyaya civakî çerx dibin; yan jî ji aliyê hin koman ve naveroka van zanyariyan bi hişmendî dikarin bêne guhertin. Nûnerê SCS'yekê, ku li Stenbolê di qada alîkariya civakî de dixebite, derdibire ku medyaya civakî vekirî ye bo provekasyonan û nirxên ku we wek sazî bi salan bi kedê ava kirine, li ser medyaya civakî bi operasyoneke îdrakê dikarin bêne yekkirin li gel erdê:

> Dibe ku we salekê ked dabe di ber de. We gelek hesab û kitêb çêkirine. Bi ser de jî hûn berpirsiyariyê hildigirin. Hûn çawa berpirsiyariyê hildigirin? Hûn sazî ne, bexişkarên we hene ku hûn hesab didine wan, endamên we hene ku hûn hesab didine wan, dewlet heye ku hûn hesab didinê, huqûq heye, daraz heye, civak heye. Te zanî? Li ser medyaya civakî tiştekî wiha nîne. Herî zêde bi darazê muqabileke wê heye. Ew jî eger naveroka wê bêtir sûc be. Eger naveroka wê ne sûc be, bi îdrakekê dikare bê serûbinkirin. Dawiya dawî, tu cihek nîne ku hesab bidiyê. Qadeke bêberpirsiyar e. Xeternak e ji ber ku bêberpsiyar e.

Hin beşdar binê bandora cemserbendkirina medyaya civakî xêz dikin. Li gorî nûnerê SCS'yekê, ku di qada alîkariya mirovî de dixebite, di qadên wekî meseleya kurdî de ku tê de cemserbendiyên civakî kûr in, li ser medyaya civakî dîskûrsên ku cudakar in û bangewaziya şîdetê li xwe digirin û nefretê hildiberînin bi rehetî û bi awayekî berbelav dikevine nav ger(roaming)ê. Beşdarek, ku li Stenbolê li ser bingeha zanyariyan parêzvaniyê dike, diyar dike ku li gel medyaya civakî, êdî zanyarî veşartî namînin û mirov dikarin zanyariyên cuda li ser heman bûyerê bi dest xin, ji vî aliyî ve medyaya civakî tevkariyê li demokratîkbûnê dike. Di gel vê yekê, qadeke bêkontrol "medyaya civakî, aliyan pir tûj dike; yanî pir dijwar dike. Ya maqûl di navberê de winda dibe". Li gorî nûnerê SCS'yekê ku li Enqereyê

li ser bingeha mafî dixebite, vê bêkontroliyê “nezaniyeke ênformatîk” welidand û hişt ku “desthilatdar […] sektoreke bi navê tiroltiyê ava bikin”. Ji ber ku, li gorî beşdar, “ji ber ku bêkontrolî bi xwe, bû xisletê hebûnî yê vê pêvajoyê” desthilatdaran medyaya civakî veguherande qadeke wisa ku tê de “bi rêya zanyariyên bêkontrol civakê kontrol dike”.

Bi kurtasî; li Tirkiyeyê di wan şirîkatiyên sazgehî de ku civaka sîvîl ava kirine, pirsgirêkên girîng hene. Ji bo ku SCS tevkariyê li çareseriya siyasî ya meseleya kurdî û avakirina aşitiya civakî bikin, her wekî di binyadên wan ên sazgehî de, divê di şirîkatiyên wan ên sazgehî de jî başkirin bêne çêkirin. Di vê beşê de, di çarçoveya şirîkatiyên sazgehî de têkiliyên SCS-SCS, SCS-siyaset, SCS-akadêmî û SCS-medyayê hatin nirxandin û pirsgirêkên heyî hatin xulasekirin. Di mijara çareseriya siyasî ya meseleya kurdî de, berî ku em biçine nav pêşniyaran li ser rolên SCS’yan, baş dibe eger di mijara levkirinê de mirov li derfet û sînorên heyî binêre. Mijara beşa bê ji vê meseleyê pêk tê.

## 5. DERFETÊN GOTÛBÊJ Û LEVKIRINÊ DI MESELEYA KURDÎ DE

Di navbera SCS'yan de qebûleke giştî heye ku pêvajoyeke gotûbêj û levkirinê bi mebesta çareseriya siyasî ya meseleya kurdî dê ji nû ve dest pê bike. Piraniya beşdaran binê wê yekê xêz dikin ku bijardeyek nîne ji bilî maseyê. Di gel vê yekê, beşdar derpêş dikin ku destpêkirina pêvajoyeke nû ya gotûbêj û levkirinê dijwar e gava ku şert û mercên heyî bêne liberçavgirtin. Di vê mijarê de, dîrok û xala werçerxanê ku gelek caran tê bibîrxistin, hilbijartinên 2019'an in. Li gorî vê yekê, li gel hilbijartinê, tevliheviya siyasî dikare bi dawî bibe li Tirkiyeyê. Meseleya kurdî hem di bidawîkirina vê tevliheviya siyasî de dikare fonksiyonekê bigire û hem jî piştî ku tevliheviya siyasî bi dawî bû dubare bê rojevê di çarçoveya gotûbêj û levkirinê de. Hinek ji beşdaran, esasen, binê rola akterên siyasî xêz dikin ji bo pêvajoyeke nû; hinek jî diyar dikin ku pêwîst e akterên civaka sîvîl rol bigirin zêdetir ji akterên siyasî.

Ji aliyê din, gelek beşdar diyar dikin ku pêvajoyeke nû ya gotûbêj û levkirinê dê ciyawaztir be ji Pêvajoya Çareseriyê ya berê. Di mijara "nûkariyan" de sernavên girîng ku fokisa nîqaşan li ser wan e; hevkêşeya nû ya jêopolîtîk a meseleya kurd, krîzên ku li Êraq û Sûriyê berdewam in ku hêzên cîhanî li wan mudaxil bûne û rengvedanên vê yekê li meseleya kurdî, pevçûnên nav-bajaran û encamên wan û akterên pêvajoya gotûbêjê.

### 5.1. Pêvajoyeke Nû ya Gotûbêj û Levkirinê?

Levkirineke normatîf heye di navbera beşdaran de li ser wê yekê ku di meseleya kurdî de, ji bilî çareseriyê, bijardeyeke din nîne û pêvajoyeke nû ya gotûbêj û levkirinê dê dîsan dest pê bike. Gelek beşdar diyar dikin ku di maweyeke kurt de çareseriyeke wiha ne mumkun e, lê belê mesele dê dubare were ser maseyê. Argomêntên girîng ku li ser "mecbûrbûna maseyê" tên derpêşkirin ev in:

- Daxwazkirina aşitî û çareseriya siyasî ji aliyê beşên civakî yên bere fireh ve,
- Her wekî ku ezmûnên cîhanê nîşan didin, ev cure pevçûn bi geg

lemperî bi levkirinê bi dawî dibin,

• Li ser mijara dîroka meseleya kurdî ya zêdetir ji sedsalî û li ser çaresernebûna meseleyê bi şîdetê, zanyarî û ezmûnên têr û tijî derketine meydanê,

• Dînamîkên nufûsa kurdan û mobîlîzasyona wan a sosyo-polîtîk, birêvebirin û serkutkirina meseleyê bi amrazên ku "xwe dispêrin şîdetê" nemumkun kiriye,

• Ne mumkun e ku her du alî bikarin ji aliyê fîzîkî ve hevdu ji nav bibin,

• Bîr û baweriyeke berbelav di nav kurdan de heye ku mesele nikare bi şîdetê bê çareserkirin û çareseriya siyasî tekane bijarde ye,

• Meseleya kurdî ji sînorên neteweyî derbas bûye,

• "Maliyeta" meseleya kurdî ji bo dewletê her ku diçe zêdetir dibe,

• Li gel daxilbûna hêzên cîhanî yên wekî Rûsya û DYE li meseleyê, maliyeta meseleya kurdî ji bo Tirkiyeyê bêtir zêde bûye,

• Gava ku li îstîqrara siyasî, veberhênan û mezinbûna aboriyê bê nêrîn, polîtîkayên ewlehiyê û pevçûn ji bo Tirkiyeyê ne "berdewambar" in

• Li Tirkiyeyê di asta civakî de hebûna êntêgrasyoneke kûr di navbera kurdan û wan kesên mayî yên welêt de,

• Bi awayekî berbelav hebûna mandîbûna civakî ku ji ber pevçûnan çêbûye di nav beşên civakî yên berfireh de kurd di serî de.

Li rexmî hebûna levkirineke normatîf di navbera nûnerên SCS'yan de li ser wê yekê ku di meseleya kurdî de ji bilî siyasetê çareserî nabe, gelek beşdar wisa difikirin ku di maweyeke kurt de vegera ser bijardeya gotûbêj û levkirinê ne mumkun e. Akterên civaka sîvîl li ser vê mijarê bi giştî diyar dikin ku Tirkiye tabloyeke ku "nayê pêşbînîkirin" xêz dike û di nav vê tabloyê de zehmet e ku di maweyeke kurt de pêvajoyeke nû ya gotûbêj û levkirinê derkeve. Fikrên beşdarekî, ku li ser SCS'yan dixebite, meyla giştî ya di vê mijarê de baş xulase dike:

> Bi rastî ez ne piştrast im ku li ba me yekî jî fikrek hebe ka bi rastî rewşa Tirkiyeyê dê çi be heta hilbijartinên Serokkomariyê yên 2019'an. Her tiştê ku em bêjin kehanet e. Gelek hokar li ortê hene. Yanî ez bêjim rewt(seyr)a têkiliyên Emerîka û Tirkiyeyê, têkiliyên Ewrûpa û Tirkiyeyê di vir de hokar in. Xirecira li Sûriyê ew ê çi lê were, li wir kurd ew ê bibine otonom yan na, meyla Tirkiyeyê di vê mijarê de, hemû hokar in. Lê belê meseleya kurdî îro bûye xwedî paşxaneyeke dîrokî û navneteweyî ku herhal tu carî xwedî nebûye. Lewma jî di vir de gelek lîstikvan hene, gelek hokar hene, gelek dînamîk hene. Ez ne hêvîdar im ku ji jîngeheke wiha pir-lîstikvan, pir-akter, pir-dînamîk pêvajoyeke çareseriyê derkeve di maweyeke kurt de.

Piraniya mezin a beşdaran îşaret bi bandorên pevçûnên nav-bajaran, bi pevçûnên heyî di meseleya kurd de, bi destgîrbûna navên girîng ên siyaseta lêgal a kurd, bi zêdebûna sînordarkirinan li ser azadiya ra-derbirîn û rêxistinbûnê, bi SCS û saziyên medyayê ku hatine girtin, her wiha bi îxracên berbelav dikin û diyar dikin ku tabloya heyî, jixwe pêvajoyeke gotûbêj û levkirinê nemumkun kiriye di maweyeke kurt de. Di vê mijarê de, duyem jî îşaret bi pêşveçûnên li Sûriye û Êraqê tê kirin. Li gorî vê yekê; rewşa qeyrana Sûriyê, rewşa teşkîla kurdan a li wir, her wiha qeyrana heyî û xumamiya ku derketiye li Herêma Kurdistanê, bijardeya gotûbêj û levkirinê di meseleya kurd de ji kar dixe di maweyeke kurt de. Hin beşdar bi taybetî hilbijartinên Serokkomarî û meclîsê bi bîr dixin û derpêş dikin ku hukumeta AK Partiyê qet nebe heta hilbijartinan dê wê meyla xwe bidomîne ku bo xwe polîtîkayên heyî yên ewlehiyê navend digire.

Hin beşdar li ser vê mijarê îddîa dikin ku hukumeta AK Partiyê "bi polîtîkayên xwe yên ewlehiyê" mesele aniye hevsengiyeke "berdewambar". Li gorî nûnerê SCS'yekê ku li ser qada pêkvebûna civakî ya hestyar bo pevçûnan dixebite,

> Tirkiye bi polîtîkayên xwe yên ewlehiyê, qet nebe, di nav Tirkiyeyê de pêvajoyeke berdewambar bi rê ve dibe. Yanî ev çêbûna 15'ê Tîrmehê, hebûna meseleya FETO'yê û têkoşîna ku li hember vê tê kirin filan, bi awayekî di nav xwe de –em dibêjin hevsengî di endazyariyê de- hatiye hevsengiyekê. Pêwîstî û hewcedariyek jî nîne ji bo guhertina vê hevsengiyê.

Li gorî beşdar, hukumeta AK Partiyê, qet nebe, heta hilbijartinan ji aliyekî ve dê rêzê li nasnameya kurd bigire û giraniyê bide ser veberhênanên êkonomîk û her wiha li herêmê piştgiriya SCS'yên îslamî, medrese û îmam xetîpan bike, ji aliyê din ve jî dikare polîtîkayên heyî yên ewleheyî bidomîne.

Li ser vê mijarê hin beşdar, hejmara wan kêm be jî, derdibirin ku hilbijartin dikarin derfeteke gotûbêj û levkirinê jî biafirînin. Li gorî vê yekê, meseleya kurdî meseleyek e ku encama hilbijartinan diyar dike li Tirkiyeyê. Hukumet

bi baldan li girîngiya dengên kurdan, her wekî berê, ku gotûbêjê li gel Tevgera Kurdan a sereke neke jî, dikare hin gavan biavêje di çarçoveya nasîna mafan de. Li gorî nûnerê SCS'yekê, ku li Stenbolê li ser bingeha zanyariyan dixebite, pêwîstiya hukumetê bi çîrokeke serkeftinê heye û gava ku hêza bandorkirina dengên kurdan li ser hilbijartinê bê liberçavgirtin, îhtîmal heye ku hukumet gavan biavêje:

> Ez wisa difikirim, dibe ku hukumet gavekê biavêje li ser van mafên gelê kurd, li ser meseleya hemwelatîbûnê û li ser mijareke din. Ji ber ku pêwîstiya hukumetê jî bi çîrokeke serkeftinê heye. Hukumeta ku di vê qadê de tiştekî neke, ez zen nakim ku bikare Tirkiyeyeke tehemmulbar bi rê ve bibe. Yanî em wî tiştî jî dibînin di hemû hilbijartinan de ku dengên herêmên kurdan çi qas bandorê li encamên hilbijartinê dikin, em girîngiya dengên herêmên kurdan dibînin di pêkhatina hevkêşeya siyasî de li Tirkiyeyê. Lewma jî, bi ya min, eger eqlê selîm serwer be, ez dibêjim tiştin dikarin bêne kirin têkildarî wê qadê. Lê belê, bi ya min, pêvajoyeke çareseriyê bi wî awayê berê zehmettir e ku me di dawiya 2012'an û di navbera 2013-2015'an de dîtibû.

Li ser mijara nûkariyên pêvajoyeke muhtemel a gotûbêj û levkirinê, meseleya ku herî zêde binê wê tê xêzkirin, hevkêşeya nû ya jêopolîtîk a meseleya kurdî ye. Aliyê yekem ku beşdar di vê mijarê de îşaretê pê dikin ev e: Nîsbet bi duh, derfetên çareserkirinê kêmtir in ku eger êdî tenê di çarçoveya sînorê Tirkiyeyê de li meseleya kurd bê nêrîn. Ji vî aliyî ve, Tirkiye neçar e ku bi pêrspêktîfeke sînor-derbas çareseriyekê peyda bike û gava ku ji bo meseleya nav xwe li çareseriyê bigere, neçar e ku meseleyên kurdî yên welatên cîran jî li ber çavan bigire. Di vê mijarê de meseleya ku gelek caran tê bibîrxistin; şerê navxweyî yê heyî li Sûriye û Êraqê û lêgerînên kurdên van welatan û akterên siyasî ye. Nûnerê SCS'yekê, ku li Amedê li ser bingeha mafî dixebite, bi van gotinan diyar dike ku Tirkiye "neçar e ku bi nêrîneke giştî" li meseleya kurdî binêre:

> Derfeta wê yekê nema ku êdî hebûn û statû û siberoja kurdan li ser vê erdnîgariyê jev bêne veqetandin. Bi Ocelan ve di 1999'an de sînaryoya yekbûna van çar parçeyan bi awayekî ji rojeva PKK derketibû. Ji rojeva kurdan jî derketibû. Hemû akterên siyasî di vê mijarê de bawer dikir ku ev yek jî ne rast e. Ne tenê akterên li Tirkiyeyê, her wiha akterên kurd ên li Îran û Êraq û Sûriyeyê jî li vir bûn. Baweriyeke wisa hebû ku ji bo kurdan rasttir dibe eger kurd tevî wan welatan ku lê dijîn statûyekê biafirînin. [...] Eger ku Tirkiye meseleya xwe ya kurdî çareser bike, eger ku li ser axa xwe bi pêkvejiyanê çareser bike jî, neçar e ku xwedî polîtîkayekê be li ser kurdên li Êraq û Sûriyê. Cuda û serbixwe û bêeleqe ji kurdên vir, dê nekare vê polîtîkayê jî pêk bîne. Ew dem êdî xilas.

Nûnerê SCS'yekê, ku li Enqereyê li ser bingeha mafî dixebite, bi awayekî manend diyar dike ku Tirkiyeyê ew şans ji dest daye ji bo ku meseleyê di

nav xwe de çareser bike. Li gorî beşdarekî, ku nîqaşên Lijneya Şopandinê bi bîr dixe, Tirkiyeya ku nekarî ji xwe re "lijneya neteweyî ya hakem" ava bike, di pêvajoyeke nû ya gotûbêj û levkirinê de Tirkiye dê li gel lijneyeke çavdêriyê ya navneteweyî rû bi rû bimîne. Şansê Tirkiyeyê hebû ji bo ku meseleyê di asta herêmî de bi rê ve bibe, lê îro zêdetir di pozîsyoneke wisa de ye ku bandorê nake lê bandorê digire:

> Bi ya min, ev mesele di 2013'an de meseleyek bû ku Tirkiyeyê dikarî bi derfetên xwe yên neteweyî çareser bike. Lê me ew xilas kir. Yanî ji ber ku nekarî ji xwe re lijneya neteweyî ya hakem ava bike, êdî xilas kir. Nema veger dibe bo wir. Eger jê û pê ve çêbe jî, êdî bi lijneya çavdêran a navneteweyî dibe. Ji ber ku her tiştek, her derenceyek... Eger hûn hewcedariyên wê pêk neynin, tabloyek derdikeve pêşiya we ku astê bilindtir dike. [...] Jixwe meseleyeke navneteweyî bû ev. Jixwe navneteweyî bû. Lê belê li Rojava ev tablo tunebû ku îro em wê dibînin. Eger Tirkiyeyê di nav xwe de karîbûya bi ser xista, dibe ku çi zanim hem ji bo Barzanî, Kurdistana Êraqê, hem ji bo Rojava dibû mînak. Niha pêşveçûnên li wir ji bo Tirkiyeyê dibin mînak. Yanî pêvajo beravajî diçe. Çi zanim mesele li Tirkiyeyê çi qas kurd hene? Ka em bêjin 20 mîlyon. Em nizanin lê em ferz kin. Yanî divê 20 mîlyon bandorê li 3 mîlyonan bike bi hesabê matêmatîkê. Lê belê êdî destkeftên polîtîk ên cemawereke bi 3 mîlyonî dê zextê li vir bike.

Di çarçoveya hevkêşeya jêopolîtîk de aliyê duyem ku binê wê tê xêzkirin, akter in. Li gorî vê yekê, Tirkiye di Pêvajoya Çareseriyê de xwedî wê derfetê bû ku meseleyê di nav xwe de çareser bike. Lê belê îro hêzên cîhanî yên wekî DYE, YE û Rûsya rasterast li meseleya kurd mudaxil bûne ku aliyê wê yê sînor-derbas bûye tewera yekem. Gelek beşdar hemfikr in ku di pêvajoyeke muhtemel a gotûbêj û levkirinê de, cihê akterên sînor-derbas gelek zêdetir dê bibe mijara nîqaşan. Hin beşdar vê yekê erênî dibînin, lê belê hin beşdar vê rewşê wek xetereyeke ciddî dibînin. Ji aliyê din, hin beşdar, kêm bin jî, diyar dikin ku Tirkiye dubare dikare meseleyê wek "meseleyeke navxweyî" qebûl bike û çareser bike û wê ev derfet bi temamî ji dest nedaye. Li gorî vê yekê; dînamîka bingehîn a diyarker, îradeya aliyan "herî zêde jî îradeya dewletê ye".

Di mijara nûkariyan de beşdaran wek dawî jî fokisa xwe dan ser akterên lokal ên pêvajoya çarseriyê. Li gorî vê yekê, pêvajoyeke nû ya gotûbêj û levkirinê, wekî yên berê, dibe ku rasterast di navbera rêxistin û hukumetê de pêk neyê. Bi akterên ciyawaz, bi pêvajoyên ciyawaz levkirineke nû mumkun e. Di vê mijarê de aliyê bingehîn ku derdikeve pêş ev e; dewlet "mafên kurdan" dikare nas bike bêyî girêdan bi gotûbêja li gel rêxistinê. Tevgera Kurdan a sereke ku daxwaz dike ku çareseriya siyasî ya meseleya kurd bi eweliyetên wê yên siyasî/aydolojîk û bi muxatabqebûlkirina wê çêbe, dikare li hember vê çareseriyê berxwedanê bike. Di gel vê yekê bijardeyeke

wiha dikare were rojevê. Hin beşdar diyar dikin ku dewlet di meseleya mafan de dikare hin gavan biavêje û di vê mijarê de, cuda ji berê, dikare Tevgera Kurdan a sereke veder bike yan jî tenê li gel wê hevdîtinan neke û dikare akteran curbecur bike. Ev curbecurkirin, hem dikare akterên siyasî yên ciyawaz li xwe bigire hem jî dikare akterên civaka sîvîl li xwe bigire.

Nûnerê SCS'yekê, ku li Amedê di qada jin û aboriyê de dixebite, diyar dike ku di pêvajoyeke nû ya gotûbêj û levkirinê de SCS gelek zêdetir dikarin cih bigirin û curbecurî zêdetir dê bê pêkanîn. Nûnerê SCS'yekê, ku li Stenbolê li ser bingeha mafan parêzvaniyê dike, diyar dike ku di pêvajoyeke muhtemel a gotûbêj û levkirinê de dewlet ê di nav lêgerînê de be ji bo ku "beşên ciyawaz ên kurdan jî bîne ser maseyê yan jî bi awayekî ênformel wan têkildar bike li gel maseyê" û sîgnal jî hene li ser vê yekê. Her wiha derdibire ku di vê mijarê de Tevgera Kurdan a sereke jî dikare pozîsyoneke bêtir vehewîner bigire û gava ku li ezmûnên berê yên wekî projeya HDP bê nêrîn, bi taybetî di vê mijarê de Ocelan dikare bibe rêveker.

## 5.2. Asteng

Beşdar di mijara wan astengan de ku li ber pêvajoyeke nû ya gotûbêj û levkirinê hene, binê dînamîkên ciyawaz xêz dikin. Mijara ku gelek caran binê wê tê xêzkirin, pevçûnên heyî yên li Tirkiyeyê ne. Gelek beşdar derdibirin ku pêvajoyeke nû ya gotûbêj û levkirinê ne mumkun e ku dest pê bike heta ku pevçûn nesekinin. Nûnerê SCS'yekê, ku li Amedê di qada huqûqê de dixebite, diyar dike ku di rewşa heyî de alî di mijara bêdengkirina çekan de îradeyek nîşan nedane û ev yek jî girîngtirîn asteng e. Hin beşdar di mijara bêdengkirina çekan û peydakirina çareseriya siyasî bo meseleyê de diyar dikin ku înîsîyatîf û berpirsiyarî li ser dewletê ye. Li gorî vê yekê, dewlet li rexmî Tevgera Kurdan a sereke eger îradeyê nîşan bide, dikare vê meseleyê çareser bike. Li gorî akterekî civaka sîvîl, ku li Wanê bi rêfêransên îslamî-parêzgarîkar parêzvaniyê dike, heta ku çek neyêne bêdengkirin, em jî tê de tu komeke îslamî dê li meseleyê daxil nebe: "Heta ku çek hebin, tu komeke îslamî, em jî tê de, em ê di vê meseleyê negerin. Ji ber ku dera ku çek lê hebin, ne ew alî ne ev alî guh nade gotina we. Lewma jî ev rewş wekî ku tu avê bikolî wisa ye."

Mijara duyem ku wek asteng binê wê tê xêzkirin, destgîrbûna gelek kesan e ku di siyaseta kurd de dikarin xwedî gotin bin. Bi taybetî gelek beşdarên ji Amed û Wanê diyar dikin ku heta ku siyasetmedarên girtî neyên berdan û şaredarî bi qeyyûman bêne birêvebirin, ne mumkun e ku pêvajoyeke nû ya gotûbêj û levkirinê dîsan dest pê bike. Ji ber ku "kesek li derve nema ku pê re bê axaftin, kesên ku diaxivin jî dibêjin ku ez kîjan peyva rast bi kar bînin; bi vê tirsê hevokê çêdikin". Heta ku ev tirs ranebe û siyaset dubare

neaxive, ne mumkun e ku pêşveçûn çêbe. Beşdarek, ku di qada zayenda civakî de dixebite, diyar dike ku ne tenê siyasetmedarên HDP'yî, her wiha medyaya muxalif, SCS, akadêmîsyen û rojnameger jî hatine bêdengkirin. Li gorî vê yekê, tengbûna derfetên xeberdanê, astengeke mezin e li ber vegera ser gotûbêj û levkirinê. Akterekî civaka sîvîl, ku li Enqereyê li ser bingeha mafî dixebite, gaveke din pêşve diçe û diyar dike ku bi gelemperî qada siyasetê hatiye bêfonksiyonkirin. Ne tenê HDP, her wiha CHP jî hatiye bêfonksiyonkirin û diyar dike ku dewletê bi hinceta têkoşîn li gel FETO'yê hemû qada siyasetê girtiye bin kontrolê.

Bi taybetî beşdarên ji Enqere û Stenbolê diyar dikin ku Rewşa Awarte bi xwe, rasterast astengek e ji astengên herî girîng. Diyar dikin ku li gel Rewşa Awarte rêxistinbûn û karkirin li ser aşitiyê, hatiye rewşeke nemumkun. Îxrackirina akadêmîsyenan, bêdengkirina saziyên medyaya muxalif, destgîrkirina rojnamegeran û girtina piraniya SCS'yan li Tirkiyeyê avakirina aşitiya civakî gelek dijwartir kiriye. Hin beşdar diyar dikin ku dewlet bûye navendî ku nikare bê qiyaskirin li gel berê û derfetên xwe yên kontrolkirinê li ser civakê bihêz kirine; ev yek jî di demeke nêzîk de gotûbêj û levkirina siyasî dijwartir dike. Beşdarek, ku li Stenbolê li ser bingeha mafî parêzvaniyê dike, vê rewşê bi van gotinan enelîz dike:

> Bi ya min, niha dewlet bûye xwedî qadeke dîskûrsê ku li ser hejmûn e û ev demeke dirêj e, demeke 80'yan ne tê de, nedikarî bi dest bixe. [...] Yanî bi ser medyayê de gelek serwer e [...] Akadêmî, akadêmiya ku çê û xirap hebû, niha hatiye qirkirin. Ev hemû tişt qadên hejmûnîk ên dewletê bihêz dikin. Yanî bi dîskûrsê, yanî hilberandina dîskûrseke nû, şansê hilberandina wê dîskûrsê nîne ku bikare vê hejmûnê hilweşîne. [...] Lewma jî ez ji bo siberojeke nêzîk, hêvî dikim ku şaş bim, texmîn nakim ku ji nû ve gotûbêjeke aşitiyê çêbe.

Hin beşdar diyar dikin ku li gel pergala serokatiyê ku di 16'ê Nîsana 2017'an de hate qebûlkirin, teşkîleke wisa hate pêş ku tê de hêz, zêdetir ji hedê xwe, navendî dibe û ev rewş jî hejmûna dewletê qet nebe ji bo demekê dê mayinde bike.

Di vê mijarê de aliyê sêyem ku binê wê tê xêzkirin, hilbijartinên Serokkomariyê ne ku biryar e di 2019'an de bêne kirin. Gelek beşdar diyar dikin ku tercîhên siyasî yên heyî ku girîngiyê didine polîtîkayên ewlehiyê, li Tirkiyeyê di nav beşên civakî yên berfireh de tên pêşwazîkirin. Li gorî vê yekê, heta ku di civakê de ji bo çareseriya siyasî ya meseleya kurd meyleke diyar pêş nekeve, polîtîkayên heyî yên ewlehiyê dê heta hilbijartinan berdewam bikin. Ji vî aliyî ve, heta hilbijartinên Serokkomariyê, divê mirov li hêviya gavekê nebe ji bo çareseriya siyasî.

Çarem jî, hin beşdar diyar dikin ku tiştên ku piştî Çareseriya Siyasî qewimîn, trawmeke civakî çêkiriye û ev trawm astengeke girîng pêk tîne li ber pêvajoyeke nû ya gotûbêj û levkirinê. Ev trawm, di qada kurd de bi taybetî bi bandora mirinbar û xirapkar a pevçûnên nav-bajaran derkete holê. Piştî lêgerînên çareseriya siyasî yên teqrîben 20 salî; pevçûnên ku hatin nav bajaran, mirina bi hezaran mirovan, xirapkirina jiyangehên mirovan bajarên dîrokî yên wekî Amed-Sûr û Şirnex-Cizîr jî tê de û koça neçar a nêzîkî nîv mîlyon mirovî bû sedema trawmê di qada kurd de. Bi gotina beşdarekê, ku di qada mafên zarokan de dixebite, "kesera kûr û êş û xem"a ku di qada kurd de pêk hat, astengeke girîng e li ber gotûbêj û levkirinê.

Ji aliyê din, li gorî nûnerê SCS'yekê, ku bi rêfêransên îslamî-parêzgarîkar di qada alîkariya civakî de dixebite, di aliyê rojava de jî "trawmeke siyasî" çêbû. Ji ber ku bi pêşengiya Erdogan û bi hewleke mezin, rasta tirk û siyaseta bi rêfêransa îslamî bi Pêvajoya Çareseriyê hatin qanîkirin. Lê belê, ji bo çareseriya meseleya kurdî dabûn ser rê, pêvajo vegeriya ser pevçûnên nav-bajaran û avakirina dewletê li başûrê Tirkiyeyê. Beşdar "trawma siyasî" ya li rojava bi van gotinan îfade dike:

> Trawm tenê nehate ser mirovên ku li Sûr û Amedê dijîn. Eger li wir trawmeke fîzîkî qewimîbe, li rojava trawmeke siyasî qewimî. Yanî Kak Tayyip bi salan xebitî ji bo ku vê derê qanî bike û rojava qanî kir. Encam; eger nîvê tabana AK Partiyê îslamparêz be, nîvê din jî tabaneke neteweparêz û neteweparêzên rast in. Her çi qas ku baweriya herêma Behra Reş û herêma Anatolya Navîn bi Kak Tayyip hebe jî, gava ku te got meseleya kurdî, li wir disekine. Niha Kak Tayyip xebitî ji bo ku vê yekê hilweşîne. […] Di carekê de li pey hev hat. Rojava, Yasîn Boru, Sûr û hwd. Di 2013'an de, her tişt, dîtina ku me dît, her tişt tê ser ewkê, PKK di sînorê me de dewletê ava dike. Niha hûn dikarin vê yekê ji rojhilatê başûr re vebêjin û nîqaş bikin û hwd., lê li Behra Reş, Anatolya Navîn, Êge, Behra Spî û Marmarayê hûn nikarin vê yekê vebêjin. Ji ber ku AK Partî jî di nav xwe de li ser meseleya rojhilatê başûr gelek homojên nîne.

Pêncem, hin beşdar diyar dikin ku hukumeta AK Partiyê, di mijara meseleya kurdî de, hem di nav welêt hem jî di nav sînor-derbas de, rêflêksên kevneşop ên dewletê nîşan dane û ji vî aliyî vî ji armancên xwe yên avabûnê averê bûye. Bo nimûne nûnerê SCS'yekê, ku li Amedê li ser bingeha mafî parêzvaniyê dike, pozîsyona heyî ya AK Partiyê li ser meseleya kurdî ku wek "heman rêflêksa ku ji avabûna komarê heta îro tê" pênase dike û wek meyleke wisa dinirxîne ku "li ruhê siyaseta AK Partiyê nayê". Beşdarekî din ji Amedê diyar dike ku aliyê "ûlûsalçî" û "zêde-neteweparêz", ku berî niha hatibûn derkirin ji bîrokrasiya dewletê, îro li ser AK Partiyê hakimiyet çêkiriye. Di vê mijarê de, aliyekî din ku binê wê tê xêzkirin, îtîfaqa AK Partiyê ye li gel MHP ku ji 07'ê Hezîrana 2015'an ve ava kiriye. Bi taybetî ev îtîfaqa

ku bi Giştpirsiya Makeqanûnê ya 16'ê Nîsana 2017'an konsîlîde bû, ji aliyê gelek beşdaran ve wek astengek tê dîtin. Li gorî vê yekê, meseleya kurdî îro hatiye girêdan bi "erêkirina" ûlûsalçî û zêde-neteweparêzan.

Şeşem, hin beşdar diyar dikin ku dîwarên normatîf astengeke girîng pêk tînin. Li gorî vê yekê, di meseleya kurdî de layenan dîwarên normatîf ên girîng hene û astenga herî girîng jî ji van dîwaran pêk tê. Bo nimûne, li gorî nûnerê SCS'yekê, ku bi nasnameya xwe ya îslamî-parêzgarîkar tê nasîn, ew bîr û baweriya ku "teşkîlên siyasî yên kurdan" ji xwe re wek metirsî dibîne berdewam dike. Îro ku kurd li Sûriye û Êraqê statûyeke siyasî bi dest dixin, ev yek wek metirsî tê dîtin; ev yek nîşan dide ku esasen ji aliyê normatîf ve li ba dewletê berdewamî heye di meseleya kurdî de. Her wiha li gorî aktee rekî civaka sîvîl, ku li Amedê li ser bingeha zanyariyan parêzvaniyê dike, girîngtirîn dîwarê normatîf, feraseta "serdestiyê" ye ku li ser siyaseta tirk hakim e. Li gorî vê yekê, di meseleya kurd de bîr û baweriya "bi edayeke birayê mezin û her tiştî ez dizanim, ez mafan didim, ez çarenûsa te dinivîsim" heye. Ev riwangeha ku dibêje "sînorên ku min diyar kirine, çarçoveya ku min diyar kiriye li gorî wan çareserî dibe" astengeke mezin pêk tîne li ber gotûbêj û levkirinê.

Li aliyê dewletê dîwarekî din ê normatîf ku binê wê tê xêzkirin, ew riwangeh e ku "meseleya PKK" û "meseleya kurdî" wekhev dibîne û pêkve-girêe dayî dike. Gelek beşdar diyar dikin ku ev her du mesele têkildar in li gel hev, lê belê wekhevkirin û pêkve-girêdayîkirina her duyan astengeke girîng pêk tîne li ber çarseriya siyasî. Li gorî vê yekê, gava ku bi pêrspêktîfeke wekî "edalet", "wekhevî", "azadiyê" ku esasen ji kurdan wêdetir hemû hemwelatiyan eleqedar dike li meseleyê bê nêrîn, pêşveçûn mumkun dibe di "meseleya kurdî" de bêyî ku tu girêdayî bî bi "meseleya PKK". Di vê mie jarê de hin beşdar diyar dikin ku li ba PKK jî dîwarekî wiha normatîf heye. Li gorî vê yekê, PKK li jêr siya eweliyetên xwe yên siyasî li meseleya kurd dinêre û di meseleya muxatabiyê de jî xwe digire navendê, ev hemû astengên girîng pêk tînin li ber pêvajoya gotûbêj û levkirinê. Ji ber ku meseleya kurdî meseleyek e ku eweliyetên siyasî yên PKK derbas dike û hemû beşên civakî ku xwedî meyl û tercîhên ciyawaz ên aydolojîk û polîtîk in muxatabê vê meseleyê ne bi pileya yekem.

Heftem, hin beşdar binê wê yekê xêz dikin ku Tirkiye di mijara meseleya kurdî de ketiye nav tengbûneke ciddî ya rewşenbîriyê. Li gorî vê yekê, enelîst û akadêmîsyenên ku zanyariyan li ser meseleyê pêşkêşî civak, akterên civaka sîvîl û medyayê dikin îro hejmara wan gelek kêmtir e û ev yek astengeke girîng e. Li gorî beşdarekê, ku li Enqereyê di qada zayenda civakî de dixebite,

> Cuda ji serdema din ku em jê derbas bûn, berî niha di destê me de di qada sîvîl de jî di siyaseta Tirkiyeyê de jî û di siyaseta kurd de jî fîger(fîgur)ên ku dikarîn siyasetê bixwînin hebûn. Wan xwendina siyasetê dikir; xwendina pêvajoyê dikir. Îro ew fîger jî nînin. Yanî hejmara wan mirovan jî kêm e ku bikarin pêvajoyê bixwînin, tehlîl bikin, enelîz bikin; qada sîvîl, cemawer, medya û hwd. beralî bikin. Derfetên tehlîlkirinê jî sînordartir in. Her kes maye şaş li hember pêşveçûnan.

Dawî jî, hin beşdar balê dikêşine ser "dîskûrsa nefretê" ya berbelav. Aktereke civaka sîvîl, ku li Enqereyê di qada zayenda civakî de xebatê dike, derdibire ku piştî vê dîskûrsa nefretê têra xwe zehmet e ku civak bê qanîkirin ji bo pêvajoyeke nû ya aşitiyê. Ji ber ku "du kesên ku îro dijûnan bidin hev, sibê nikarin werin ser maseyê ji bo ku aşitiyê çêkin".

Gelek akterên civaka sîvîl, tevî dînamîkên nav welêt, binê dînamîkên sînor-derbas xêz dikin. Bi gotina beşdarekî, ku li ser SCS'yan dixebite, di meseleya kurd de "akter zêde bûn", "erdnîgarî curbecur bûn". Di vir de meseleya ku gelek caran tê bibîrxistin, şerê navxweyî yê li Sûriyê ku berdewam dike û Rojavaya bi pêşengtiya PYD ye. Hin beşdar derdibirin ku Pêvajoya Çareseriyê, zêdetir ji dînamîkên li Tirkiyeyê, ji ber Rojava sernekeftî bi dawî bû û heta ku li Sûriyê şerê navxweyî bi dawî nebe û statûya kurdan zelal nebe ne mumkun e ku li Tirkiyeyê pêvajoyeke nû ya gotûbêj û levkirinê çêbe. Di vê mijarê de hin beşdar derdibirin ku "meseleya Rojava" di destpêkê de ji bo ku meseleya kurdî li Tirkiyeyê çareser bibe derfetek pêşkêş kir, lê belê Tirkiyeyê ev derfet bi kar neanî. Li gorî vê yekê, derfeta ku ji dest çû, îro zêdetir veguheriye astengekê. Ji ber ku, rewşa heyî ya Rojava, li ba dewletê fikareke "beqa"yê çêkir. Ji aliyê din, Rojavayê hişt ku li ba PKK xwe-baweriyek çêbe û daxwaz û bendewariyên rêxistinê guhertin. Her wiha Tevgera Kurd a li Tirkiyeyê û Tevgera Kurd a li Sûriyeyê di navbera wan de rageşiyeke girîng derkete meydanê. Ji ber ku eweliyet, akter, îtîfaqên navneteweyî yê her du qadan bi awayekî girîng ciyawaz bûne. Ji ber ku ev rewş di navbera Tevgera Kurdan a sereke de jî bûye sedema xumamiyekê, dibe asteng ji bo vegera ser gotûbêj û levkirinê.

Ji aliyê hin beşdaran ve bi qasî şerê navxweyî yê Sûriyê û Rojava, pêşveçûnên li Herêma Kurdistanê jî wek asteng têne dîtin. Li gorî vê yekê, qeyran û xumamiya ku di çarçoveya sînor-derbas de diqewime, dibe asteng ji bo ku gav bê avêtin ji bo gotûbêj û levkirinê li Tirkiyeyê. Di navbera Gulan û Tîrmeha 2017'an de ku hevdîtin hatin kirin, hin beşdaran îşaret bi Giştpirsiya Serxwebûnê kirin ku di 25'ê Îlona 2017'an de li Herêma Kurdistanê dê bê lidarxistin û binê wê yekê xêz kirin ku bi qasî Sûriye/Rojava, Herêma Kurdistanê jî dê rasterast bandorê li pêvajoya gotûbêj û levkirinê bike li Tirkiyeyê. Bi rastî jî giştpirsî hate lidarxistin û di serî de hukumeta AK Partiyê hemû partiyên sereke yên li Tirkiyeyê bertekeke mezin nîşan

dan. Hukumeta AK Partiyê di çarçoveya "metirsiya neteweyî" de li meseleyê nêrî. Xumamî û bandorên ku giştpirsiyê çêkirin bi rêjeyeke mezin berdewam dikin.

Di çarçoveya sînor-derbas de, hin beşdar mudaxilbûna hêzên cîhanî yên wekî DYE, Rûsya û YE û hêzên herêmî yên wekî Îran û Îsraîlê li meseleya kurd, nexasim li Êraq û Sûriyê, wek astengeke girîng dibînin ku ev mudaxilbûn nikare bê qiyaskirin li gel berê. Nûnerê SCS'yekê, ku li Wanê bi rêfêransên îslamî-parêzgarîkar parêzvaniyê dike, nûnertiya fikrên wan kesan dike ku mudaxilbûna akterên navneteweyî li meseleyê nerênî şîrove dikin. Li gorî beşdar, bi taybetî piştî pêşveçûnên li Sûriye û Êraqê, hem ji bo dewletê hem ji bo PKK "şertên siyaseta serbixwe" bi rêjeyeke mezin ji holê rabûn:

> Şertên siyaseta serbixwe nînin ji bo her du aliyan jî. Ne Dewlata Komara Tirkiyeyê ne jî PKK'ê şertên siyaseta serbixwe hene. Gava ku wisa bû, kesên ku van şertên siyasetê çêdikin, polîtîkayên wan ên ciddî hene gava ku li rexmî wan li vir aşitiyek pêk were. Em dikevine wê şaşiyê. Şîroveyeke kilîşe heye. Gava ku behsa tiştên li ser şerê navxweyî yê Lubnanê dihate kirin, em di destpêka ciwaniya xwe de bûn, paragrafeke manşêtê ku me dixwend, esasen ji bo me: "Divê mirov dinyayê fam bike ji bo ku bikare Lubnanê fam bike." Di esil de sedema şerê navxweyî yê Lubnanê dinya bû. Lê belê akter pêwîst bûn li Lubnanê. Aydolojî pêwîst bûn. Mîlîsên şîe, mîlîsên sunnî, ev û ew lazim bûn li wir wek akter. Heçku problem esasen ji bo vir jî derbasdar e.

Li gorî hin beşdaran, ji aliyekî ve hêzên cîhanî û herêmî li meseleya kurdî mudaxil dibin ku nikare bê qiyaskirin li gel berê; ji aliyê din têkiliyên AK Partiyê li gel akterên navborî tim paşve diçin. Ev rewş, vê daxilbûna akterên sînor-derbas li meseleya kurdî vediguherîne dînamîkeke nerênî ne ku erênî.

## 5.3. Derfet

Akterên civaka sîvîl tevî wan astengan ku li jor hatin xulasekirin, binê derfetên curbecur jî xêz dikin. Di gel vê yekê divê bê gotin ku hewayeke reşbîn li ba cîhana SCS'yan heye ku di meseleya kurdî de bijardeya gotûbêj û levkirinê di demeke nêzîk de nayê pêş.

Gelek beşdar di çarçoveya dînamîkên welêt de, wek yekem, dibêjin ku piştgiriya berfireh ji bo aşitî û çareseriya siyasî ya di nav civaka kurd de derfeteke girîng e. Argomêntên nûnerekê SCS'yekê, ku bi rêfêransên îslamî-parêzgarîkar parêzvaniyê dike, bi awayekî baş nûnertiya fikrên li ser vê mijarê dike:

> Hemû beşên kurdan di her platformê de behsa aşitî, biratî û çareseriyê dikin ku ev yek derfeteke gelek mezin e. Yanî dawiya dawî çi bibe jî, civakek ku mafên wê ji destê wê hatibin zeftkirin, tune hatibe hesibandin, dest danîbin ser erdnîgariya wê, hemû mafên wê ku hema bêje ji her aliyî ve ji destên wê hatibin zeftkirin jî di her platformê de behsa çareserî, aşitî û edaletê dike; ev yek ji bo destpêkirina pêvajoyeke nû ya çareseriyê derfeteke mezin e.

Hin beşdar wisa difikirin ku di pevçûnên nav-bajaran ên 2015-2017'an de, piştgirînekirina xendekan ji aliyê xelkê ve, derfeteke girîng e. Li gorî vê yekê, xwedûrgirtin ji şîdetê û daxwaziya aşitiyê ya di nav beşên civakî yên berfireh de, derfeteke girîng pêşkêş dike ji bo vegera ser gotûbêj û levkirinê. Hin beşdar li ser vê mijarê dibêjin ku rêfêransên nû ku di Pêvajoya Çareseriyê de derketin, derfeteke girîng pêşkêş dikin. Li gorî vê yekê, mirovan di Pêvajoya Çareseriyê de dît ku mesele dikare bi axaftinê bê çareserkirin û ev yek bû rêfêranseke girîng. Li gorî vê yekê hem Tirkiyeyê ezmûnên girîng dane hev hem jî kurdan. Li ser vê mijarê akterekî civaka sîvîl, ku li Stenbolê di mijara aşitiyê de parêzvaniyê dike, diyar dike ku ne tenê kurdên ku piştgiriyê didine HDP, her wiha kurdên ku piştgiriyê didine AK Partiyê jî mafên wekî perwerdeya bi zimanê dayikê, lokalbûn û demokratîkbûnê daxwaz dikin û ev yek ji bo çareseriyê derfeteke girîng pêk tîne.

Mijareke din a girîng ku têkildarî daxwaza aşitiyê binê wê tê xêzkirin "mandîbûna siyasî" ye ku li ba beşên civakî yên berfireh çêbûye. Li gorî hin beşdaran, ev mandîbûna siyasî, dê zorê bide aliyan ji bo ku gavan biavêjin. Li gorî nûnerê SCS'yekê, ku di qada alîkariya mirovî de dixebite, şansê Tirkiyeyê nîne ku bi vê mandîbûnê dewam bike:

> Tirkiyeyeke gelek bihêrs heye di navxwe de û pêwîstiya her kesî bi arambûnê heye. Pêwîstiya her beşî. Hûn biçin ba kê jî, kesên ku siyaseta çalak dikin jî eciz in ji çalakiyên zêde û pêvajoyên hilbijartinên yên gelek tund û şerê berdewam. Yanî kesên ku bi awayekî ji vî tiştî para xwe girtine jî eciz in, jixwe eciz e yanî ji vê atmosfera bihêrs û zextdar. Lewma jî ez wisa difikirim ku di qonaxên pêş de, ne desthilatdariya siyasî ne jî partiyên siyasî êdî zêde nikarin vê hêrsbûnê ragirin. Bivê nevê her kes dê neçar bimîne ku vê hêrsebûnê ji holê rake. Helbet yek ji girîngtirîn sernavan jî dê meseleya kurdî be.

Duyem jî, hin beşdar diyar dikin ku AK Partiyê di nav dengderên neteweparêz-parêzgarîkar ên Tirkiyeyê de, di mijara meseleya kurdî de nermbûn û qebûlek çêkir û ev rewş derfeteke girîng pêşkêş dike ji bo pêvajoyeke nû ya gotûbêj û levkirinê. Nûnerê SCS'yekê, ku li Wanê bi rêfêransên îslamî-parêzgarîkar parêzvaniyê dike, diyar dike ku bizava siyasî ya sereke li Tirkiyeyê bizava neteweparêz-parêzgarîkar e û di Pêvajoya Çareseriyê de ev beş ji aliyê AK Partiyê ve bi rêjeyeke girîng bo çareseriya siyasî hate qanîkirin.

Sêyem jî, çawa ku hilbijartinên Serokkomariyê ku biryar e di 2019'an de bêne kirin wek asteng tên dîtin, her wiha wek derfetek jî lê tê nêrîn. Li gorî vê yekê, ji niha ve ne hêsan e ku mirov pêşbîniyekê bike ji bo hilbijartinên 2019'an. Gava ku di wexta hilbijartinan de daxwaza aşitiya civakî bilind bibe, partiyên ku dixwazin li ser desthilatdariyê bimînin yan jî dixwazin werine ser desthilatdariyê, dikarin bijardeya gotûbêj û levkirinê bînine rojevê di meseleya kurdî de. Her wiha encamên giştpirsiya ku di 16'ê Nîsana 2017'an hate lidarxistin, li Tirkiyeyê du blok çêkirin bi rêjeya %50-%50. Ev rewş meseleya kurdî û helwesta siyaseta sereke ya kurd di hilbijartinan de girîng digerîne. Dengên kurd û siyaseta sereke ya kurd hem ji bo bereya "Belê" hem jî ji bo bereya "Nexêr"ê xwedî girîngiyeke krîtîk e û ev rewş ji bo vegera ser gotûbêj û levkirinê dikare wek çavkaniyeke erênî fonksiyonekê bigerîne.

Çarem, li gorî hin beşdaran dînamîkên wekî ezmûna berê ya Tirkiyeyê, ezmûna wê ya demokrasiyê bi qiyas li gel welatên derdorê, şertên wê yên sosyo-êkonomîk û rû li rojava derfeteke girîng çêdikin. Li gorî vê yekê, ji ber ku hem rûyê Tirkiyeyê hem jî rûyê kurdan li Ewrûpayê ye, ev derfetek e ji bo welêt û Tirkiye dikare bijardeya aşitiyê bîne rojevê û dikare vegere pêvajoya YE. Bo nimûne, nûnerê SCS'yekê, ku li Amedê li ser bingeha mafî parêzvaniyê dike, diyar dike ku "tirêna YE nehatiye berdan" û bi çêkirina pêvajoyeke aşitiyê li gel kurdan ev tirên ji nû ve dikare bê pêkanîn.

Pêncem, hin beşdar wek derfetekê li pergala serokatiyê dinêrin ku bi Giştpirsiya Makeqanûnê ya 16'ê Nîsana 2017'an hate qebûlkirin. Li gorî vê yekê, Tirkiye di nav guhertina pêvajoya rêjîmekê de ye û di vê wextê de pergala siyasî dê ji nû ve bê pêkanîn. Gava ku baş bê bikaranîn, ev pêvajoya pêkhatina jinûve, dikare veguhere derfetekê ji bo çareseriya siyasî ya meseleya kurdî. Li gorî beşdarekî, ku li Wanê bi rêfêransên îslamî-parêzgarîkar parêzvaniyê dike, di rewşeke wiha de ku akterên cîhanî bi wateya nerênî li meseleya kurdî mudaxil bûne, eger Tirkiye meseleya xwe ya kurd bi lez çareser bike, ev yek tevkariyê li derbasbûna pergala serokatiyê jî dike.

Şeşem, hin beşdar diyar dikin ku hewla derbeya leşkerî ya 15'ê Tîrmehê dikare bibe derfetek di çarçoveya "ders-wergirtin ji bûyereke nerênî" de. Li gorî vê yekê, çaresernebûna meseleya kurdî roleke girîng lîst di mezinbûna wan akteran de ku derbe kirin. Çareseriya siyasî ya meseleya kurdî û avaekirina aşitiya civakî dê zemîna derbeyan ji ortê rake. Hin beşdar têkildarî derbeyê diyar dikin ku paqijkirina Rêxistina Gulen ji dewletê, derfeteke girîng pêşkêş dike. Ji ber ku di sernekeftina Pêvajoya Çareseriyê de yek ji girîngtirîn akteran ku rol tê de lîst, Rêxistina Gulen bû.

Heftem, hin beşdar diyar dikin ku di pevçûnên nav-bajaran de “rêxistin têk çû” û ev rewş di mijara nasîna mafan û çareseriya siyasî ya meseleyê de derfeteke girîng dide dewletê. Li gorî nûnerê SCS’yekê, ku li Wanê bi rêfêransên îslamî parêzvaniyê dike, li gorî pênc sal berî niha hêsantir e eger dewlet mafan nas bike. Ji ber ku eger ev maf û azadî hingî nas bikirina, dê bihata gotin ku “ji ber zexta rêxistinê û ji ber çalakiyên rêxistinê [...] dewlet neçar ma û ev dan”. Lê belê, niha dewlet dikare bêje ku “ez bala xwe nadim tu rêxistinekê yaxud teşkîleke siyasî, [...] ev pêwîstiya xelkê min e ku ji demokrasiyê tê” û gavan biavêje. Ev rewş dê piştgiriya civakî jî zêde bike ji bo hukumeta AK Partiyê.

Heştem, hin beşdar wê yekê bi derfet dizanin ku her du tradîsyonên siyasî xwedî pêşengên bihêz in ku xwedî roleke krîtîk in di çareserkirina meseleya kurdî de. Li gorî vê yekê, R. T. Erdogan pêşengê mezintirîn tradîsyona siyasî ya neteweparêz-parêzgarîkar e li Tirkiyeyê û dikare şopdarên xwe qanî bike. Ji aliyê din, di nav Tevgera Kurdan a sereke de Ocelan pêşengek e bê rikaber. Ev rewş derfeteke mezin e ji bo çareseriya siyasî ya meseleya kurdî.

Hin nûnerên SCS’yan tevî dînamîkên nav welêt, di çarçoveya dînamîkên sînor-derbas de, bi giştî zêdebûna hêza kurdan li Rojhilata Navîn, bi derefet dizanin. Li gorî vê yekê, kurd bûne aktereke gelek bihêz li Rojhilata Navîn. Gelek welat agahdar in ji vê yekê û hewl didin ji bo ku hevkariyê bikin li gel kurdan. Ev rewş dê Tirkiyeyê jî dehf bide ji bo ku hevkariyê li gel kurdan bike û pêvajoyeke nû ya gotûbêj û levkirinê bide destpêkirin. Nûnerê SCS’yekê, ku li Amedê di qada huqûqê de dixebite, diyar dike ku gava ku Tirkiye “fobiya xwe ya kurdan”, “fobiya xwe ya dabeşbûnê” bide aliyekî, berzbûna kurdan li Rojhilata Navîn dê ji bo Tirkiyeyê jî derfetên girîng biafirîne:

> Di nav vê rol-bidestxistinê de, esasen bi eqlekî nû, ku bê pêkanîn, gelek derfet hene di çarçoveya meseleya kurdî de. Lê bi ya min, şertên vê yên binegehîn hene. Te dî, pêş-mercek heye ku divê Dewleta Komara Tirkiyeyê fobiya xwe ya kurdan û fobiya xwe ya dabeşbûnê bide aliyekî û xwe bigihîne kurdan û aşitiyê bike û dilê kurdan bigire. Yanî eger Komara Tirkiyeyê ji vê fobiya xwe rizgar bibe, te dî, bi xwe jî arezû dike ku li herêmê bibe otorîteyeke xwedî gotin, belê rêya vê di vir re diçe esasen. Yanî lewma jî Komara Tirkiyeyê hem ê meseleya kurdî çareser bike ku ev 200 sal e cir û cedela wê dike û hem jî wê bigihê wê nuqteyê ku niha bi polîtîkayên xwe dixwaze xwe bigihîne wê. Lê belê ji bo vê yekê pêwîstî bi guhertina eqlê dewletê heye.

Li gorî beşdarekî, ku li Stenbolê li ser bingeha mafî parêzvaniyê dike, eger PYD xwe ji PKK cuda bike û PKK terka çekan bike li Tirkiyeyê, li miqabilî vê, meseleya kurdî dikare bigihê çareseriyeke siyasî li Tirkiyeyê. Ji vî aliyî

ve, Rojava dikare rolekê bilîze ku siberoja meseleya kurdî diyar bike li Tirkiyeyê.

Li gorî nûnerê SCS'yekê, ku bi rêfêransên îslamî-parêzgarîkar li ser bingeha mafî parêzvaniyê dike, eger ku bê bikaranîn, Rojava derfeteke girîng pêşkêş dike ji bo sîvîlbûna PKK û çareseriya siyasî ya meseleya kurdî li Tirkiyeyê. Li ser vê mijarê, nûnerê SCS'yekê, ku li ser bingeha zanyariyan parêzvaniyê dike, diyar dike ku bi nêrîn li ezmûna Herêma Kurdistanê, Rojava dikare bandoreke veguherîner bilîze li ser PKK û tevkariyê bike li çareseriya meseleya kurd li Tirkiyeyê:

> Rojava jî di vê mijarê de derfeteke girîng e. [...] Şerkirin tiştek e, birêvebirin tiştek e. PKK niha rêxistinek e ku şer dike. Sibê gava ku bû rêxistinek ku bi rê ve dibe, êdî ji ber ku mijûl e bi birêvebirinê ve, vê yekê bi şer nake êdî. Me dît, Pêşmerge jî wisa lê hat. Me Kurdistana Başûr wek Pêşmerge nas dikir. Îro Kurdistana Başûr bi gavên xwe yên dîplomatîk li ser sehneya dinyayê dilîze. Hema bêje tu hêzeke wê ya Pêşmergeyan nîne. Ev du salên dawîn in ku dest bi çêkirina hêzeke Pêşmergeyan kir. Divê em vê yekê baş bixwînin. Yanî piştî ku hûn li derdora xwe maqûl hatin dîtin, hûn êdî dibine modêleke birêvebirinê. Tirkiye êdî, bi ya min, eger piştgiriyê neke jî, divê bisekine û nebe asteng ji bo ku PKK ji rewşa rêxistineke şerker derbasî rêxistineke birêveber bibe ku Rojava bi rê ve dibe; jixwe ev pêvajo dê pêşve biçe. Ku pêşve jî çû, pêkvebûna kurd û tirkan, ku kêmek berî niha min jê behs kir, bivê nevê dê bibe asteng li ber pevçûna kurd û tirkan li ser van axan.

Hin beşdar diyar dikin ku her wekî Rojava, Herêma Kurdistanê jî derfetan pêşkêş dike. Li gorî vê yekê, derfeteke girîng e hewla Herêma Kurdistanê ji bo ku li gel Tirkiyeyê têkiliyên xwe yên siyasî û aborî pêşve bibe û ev yek dê tevkariyê li çareseriya siyasî ya meseleya kurdî bike. Li gorî aktereke civaka sîvîl, ku li Amedê di qada jin û aboriyê de dixebite, ev hewlên Herêma Kurdistanê dê helwesta Tirkiyeyê nerm bike ku li ser meseleya kurdî heye:

> Ez wisa difikirim ku hewaya ku ew ê çêke, dê vir jî nerm bike. Ji ber ku birêveberî, hukumet û serokê vê dewrê yê Kurdistana Başûr hewl dide ku berdewamiyê bide têkiliyên baş li gel Tirkiyeyê. Ez jî bi erênî dibînim. Ji ber ku tekane pencere ye ku li cîhanê vedibe. Girîng e berdewambûna têkiliyan li gel wir. Ji aliyekî din ve, mezintirîn cemawera kurdan li vir e. Dawiya dawî, tiştekî ji vê siruştîtir nîne ku têkiliyên baş li gel welatekî wisa çêke ku hem wek deriyekî pê li cîhanê vedibe û hem jî kesên ku li wir dijîn hemnijadên wê ne. Ez wisa difikirim ku ev yek dê riwangeha hukumeta tirk û riwangeha tirkan nerm bike.

Dawî jî, hin beşdar di çarçoveya sînor-derbas de, binê wan têkiliyan xêz dikin ku Tirkiyeyê li gel cîhana rojava çêkirine. Beşdarek, ji Wanê, endambûna Tirkiyeyê li NATO'yê bi bîr dixe û diyar dike ku ev têkilî dê meseleya kurd, ji nû ve bîne ser maseyê.

## 5.4. Akterên Krîtîk

Tevî asteng û derfetên li ber pêvajoyeke nû ya gotûbêj û levkirinê, di lêkolînê de rawestan li ser akterên krîtîk hatiye kirin ku dikarin di pêvajoyeke wiha de rol bilîzin. Di vê mijarê de, hin akteran fokisa xwe da ser gotûbêjên di asta civakî de û hinan jî fokisa xwe da ser gotûbêjên asta bilind. Akterên civaka sîvîl ku fokisa xwe dan asta yekem, îşaret bi wan beşên berfireh kirin ku dê karîger bin di "civakîkirina aşitiyê" de û akterên ku fokisa xwe dan ser asta duyem jî balê dikêşine ser rola pêşengên asta bilind. Wek dawî, gelek akter, bi bîr dixin ku mesele îro zêdetir derbasî çarçoveyeke sînor-derbas bûye û diyar dikin ku li gorî berê hêzên herêmî û cîhanî dê gelek karîgertir bin di formasyona pêvajoyeke muhtemel a gotûbêj û levkirinê de.

Erdogan û Ocelan ew akter in ku herî zêde îşaret bi wan tê kirin di çarçoveya akterên kilît de. Teqrîben du ji sêyê beşdaran, diyar dikin ku akterên bingehîn ku dê formasyona pêvajoyeke nû diyar bikin, Erdogan û Ocelan e. Li gorî vê yekê, du aliyên bingehîn ên meseleyê hene: dewlet û hukumeta AK Partiyê bi pêşengiya Erdogan û Tevgera Kurdan a sereke bi pêşengiya Ocelan. Hem Erdogan hem jî Ocelan li ser alîgirên xwe xwedî bandoreke wisa ne ku nayê nîqaşkirin. Gava ku ev her du pêşeng lev bikin û biryarê bidin, pêvajoyeke nû ya gotûbêj û levkirinê dikare dest pê bike. Di vê mijarê de gelek beşdar diyar dikin ku bi taybetî Erdogan diyarker e. Li gorî nûnerê SCS'yekê, ku li Wanê bi rêfêransên îslamî-parêzgarîkar li ser bingeha mafî dixebite, "eger Erdogan bixwaze, li rexmî Emerîka û li rexmî Ocelan dikare vê pêvajoya aşitiyê ji nû ve bide destpêkirin û bidawîkirin".

Hin beşdarên ku binê pêşengtiya Erdogan xêz dikin, îşaret bi girîngiya helwesta neteweparêz-parêzgarîkaran di çareseriya siyasî ya meseleya kurdî de dikin ku li Tirkiyeyê berfirehtirîn û bihêztirîn koma sosyo-polîtîk pêk tînin. Li gorî vê yekê, çareseriya meseleyê zêdetir girêdayî ye bi beşên civakî yên neteweparêz-parêzgarîkar û pêşengtiya Erdogan zêdetir xwedî girîngî ye gava ku li bandora wî ya li ser van beşan bê nêrîn ku nayê nîqaşkirin.

Hin beşdar îddîa dikin ku dewlet û KCK diyarker in zêdetir ji pêşengan. Bo nimûne akterekî civaka sîvîl, ku li Amedê di qada huqûqê de dixebite, tevî qebûlkirina pêşengtiya Erdogan, diyar dike ku aktera bingehîn "dewlet" e:

> Ez (wek aktera kilît) dewletê bi xwe pênase dikim. Yanî ez ne li gel wê me; nizanim "dewleta AK Partiyê", "hukumeta AK Partiyê"... Rast e, Erdogan bi awayekî bênîqaş bihêz û otorîter e. Yanî hema bêje dikare her tiştî bike ku dibêje, ew hêz pê re heye. Yanî ev berî giştpirsiyê jî wiha bû, piştî wê jî. Lê birêveçûn û eqlekî destgeh(*device*)a dewletê bi xwe heye.

Ji aliyê din, hin beşdar, li hember pêşengtiya Ocelan, cextê li ser hêza Qendîlê dikin. Li gorî vê yekê, tevî ku pêşengtiya bihêz a Ocelan nayê nîqaşkirin, Qendîl yek ji wan akterên kilît e ku dê pêvajoyeke nû ya gotûbêj û levkirinê diyar bike. Bi taybetî pêşveçûnên li Rojava, Qendîl di nav pêkhateyên Tevgera Kurdan a sereke de wisa hêzdar kir ku nikare bê qiyaskirin li gel berê.

Akterên ku meseleyê di çarçoveya Erdogan, Ocelan, dewlet û Qendîlê de nîqaş dikin, roleke sînordar didine CHP, MHP û HDP. Di gel vê yekê, levkirineke berbelav heye li ser wê mijarê ku divê ev akter jî bêne liberçavgirtin. Tê derbirîn ku piştî hilbijartinên 07'ê Hezîrana 2015'an paşveçûneke girîng hate ser HDP û gelek dûr ket ji aktera lîstik-diyarker. Ji aliyê din, hin beşdar diyar dikin ku piştgiriya CHP li pêvajoyê girîng e gava ku li berfirehiya tabana civakî ya wê bê nêrîn ku nûnertiya wê dike. Bi giştî bal tê kişandin bo ser potansiyela MHP ji bo xirapkirina pêvajoyê û tê diyar kirin ku ji bo ku ev bandora nerênî ji holê bê rakirin, nerasterast be jî, divê li pêvajoyê bê daxilkirin. Dawî jî, hin beşdar muxalefeta der-meclîs jî bi bîr dixin û binê wê yekê xêz dikin ku divê ev akter jî li pêvajoyê bêne daxilkirin. Ev daxwaz ne tenê ji bo wan partî û komên siyasî ku li Tirkiyeyê siyasetê dikin, di heman demê de ji bo partî û komên siyasî yên muxalif li hember Tevgera Kurdan a sereke jî tê gotin ku di qada kurd de xwe rêxistin kirine.

Piraniya beşdaran diyar dikin ku akterên sînor-derbas û navneteweyî dê gelek zêdetir rol bilîzin di pêvajoyeke nû ya gotûbêj û levkirinê de li gorî pêvajoyên berê. Hêzên herêmî û cîhanî ku gelek caran îşaret bi wan tê kirin; Emerîka, Rûsya û Îran e. Sedema herî girîng  ku ev her sê welat wek akterên karîger tên dîtin, rasterast mudaxilbûna wan e li şerê heyî yê Sûriyê û Êraqê. Têra xwe zehmet e avakirina pêvajoyeke nû ya gotûbêj û levkirinê bêyî ku ew akter bêne liberçavgirtin ku mudaxil in li vê pêvajoyê; ji ber ku piştî qeyranên Sûriyê û Êraqê, aliyekî sînor-derbas li meseleya kurd zêde bû ku nikare bê qiyaskirin li gel berê.

Her çi qas ku akterên civaka sîvîl hemfikr bin di mijara hêza DYE û Rûsyayê de, levkirinek peyda nabe di wê mijarê de ku ev akter dê roleke çawa bilîzin. Gelek beşdar diyar dikin ku tabloyeke nediyar heye. Hinek jî diyar dikin ku ev akter dê roleke nerênî bilîzin. Nûnerê SCS'yekê, ku li Amedê bi rêfêransên îslamî-parêzgarîkar parêzvaniyê dike, mudaxilbûna akterên navneteweyî yên wekî DYE û Rûsyayê bi nerênî dizane û diyar dike ku bi taybetî Tirkiye û Îran hem di meseleya kurdî de hem jî di çêkirina aşitiyê de li Rojhilata Navîn dikarin roleke krîtîk bilîzin. Li gorî vê yekê, Îran welatekî bihêz e ku pêşengtiya cîhana şîe dike û Tirkiye jî, nîsbet bi navçeyê, welatek e ku li gel rojava têkiliyên baş çêkirine ku azadîxwaz û demokratîk e. Ji vî aliyî ve, ev her du welat li navçeyê dikarin rolên girîng bigirin ser xwe

di avakirina aşitiyê de.

Aktereke din a krîtîk Herêma Kurdistanê ye ku piştî DYE, Rûsya û Îranê îşaret pê tê kirin. Tiştê ku Herêma Kurdistanê dike aktereke kilît, esasen jêopolîtîka meseleya kurd e ku bi gotineke din di çarçoveya nufûs, erdnîgarî û pêvajoyên mobîlîzasyona sosyo-polîtîk ên pir-astî û pir-akterî de meseleya kurdî dikeve nav sînorên çar dewletan. Girîngtirîn dînamîk ku Herêma Kurdistanê dike aktereke kilît ew e ku Herêma Kurdistanê yekane teşkîl e ku xwedî statûyeke sosyo-polîtîk û îdarî ye di nav çar dewletan de, bi gotineke din ji ber ku cure dewletek[27] e. Tevî vê yekê, hin beşdar rola erênî ya Herêma Kurdistanê bi bîr dixin ku di pêvajoyên berê yên diyalog û gotûbêjê de lîstiye. Dawî jî, hin beşdar balê dikêşine ser têkiliyên navbera Herêma Kurdistanê û Rojava û diyar dikin ku di maweyeke navincî de ev her du herêm dê bibine yek û ev rewş jî dikare siberoja meseleya kurdî rasterast diyar bike li Tirkiyeyê.

Ji aliyê beşdaran ve, tevî van her çar hêzan, YE jî wek aktereke kilît tê pênasekirin. Di gel vê yekê divê bê gotin ku YE, nîsbet bi Emerîka û Rûsyayê, ji aliyê beşdaran ve di asteke gelek sînordar de wek akterekê tê dîtin. Hin beşdar di vê mijarê de diyar dikin ku her wiha hin binyad û saziyên navneteweyî ku rêza wan heye wek hêsankar dikarin tevkariyê li pêvajoya aşitiya civakî bikin. Ev yek, dibe ku SCS'yek be ku di qadên wekî çareserkirina pevçûnan û mafên mirovan de dixebite; dibe ku jî komeke tevlihev be ku ji wan şexsiyetan pêk tê ku li asta navneteweyî tên naskirin.

Mijareke din a girîng ku gelek beşdar binê wê xêz dikin, têkiliyên hêzî ne di navbera akteran de. Li gorî vê yekê, hemû akter wekî hev xwedî hêz nînin û di pêvajoyeke muhtemel a gotûbêj û levkirinê de akter dê xwedî girîngiyên ciyawaz bin. Bo nimûne akterek, ku li Amedê li ser bingeha zanzariyan dixebite, li gorî hêza wan a bandorkirinê sinifandineke sê-alî dike:

> Yanî eger em wek A û B rêz bikin, gava ku em wek bihêztirîn akteran bixine rêzbendiyê, rêza A'yê; Recep Tayyip Erdogan, Emerîka, Rûsya ye ku niha zelal tên dîtin. Ev akterên bihêz in bi pola A; zelal e. Heçî pola B'yê ye, mixabin Ebdulla Ocelan vegeriya pola B'yê di vê qonaxê de. PYD û PKK jî akterên girîng ên pola B'yê ne. Em dikarin yên din bişînin pola C'yê. Ewrûpa akterek e ku dakete pola C'yê. HDP akterek e ku dakete pola C'yê. Em dikarin bêjin ku bi temamî bêbandor bû. Partiyên opozîsyonê CHP û MHP bi temamî daketin pola C'yê. Tu bandoreke wan nîne gelo? Heye, lê divê

**27** Ozdemirkiran, Merve, *"Construire Un Etat, Briser Des Tabous:* Les Hommes D'affaires de Turquie Entre La Construction Étatique Du Gouvernement Régional Du Kurdistan (GRK) et La Politique Étrangère de la Turquie," *Teza Neweşandî ya Diktorayê,* Institut d'Etudes Politique de Paris (Sciences Po.), 2013.

> em rêzbend bikin. Gava ku me rêzbend kir, belê, li rexmî C'yê aşitî pêk tê. Li rexmî yên B'yê jî, îhtîmala pêkhatina aşitiyê bilind e. Lê belê gava ku em vedigerin û lê dinêrin, em dikarin bibînin ku ev her sê akter (Erdogan, Emerîka û Rûsya) bihêz in.

Hin beşdar, li şûna gotûbêjên asta bilind, fokisa xwe didine gotûbêjên bi asta civakî û civaka sîvîl wek akterek ji akterên krîtîk pênase dikin. Di vê mijarê de aliyê yekem ku binê wê tê xêzkirin, meseleya nûnertiyê ye. Li gorî vê yekê, pêvajoyeke muhtemel a gotûbêj û levkirinê, divê çînên ciyawaz ên civakê li xwe bigire û di vê mijarê de SCS'yên wekî akadêmî, sêndîka û odeyên pîşeyî dikarin roleke girîng bilîzin. Bo nimûne, teqrîben temamê akterên civaka sîvîl ku di qada zayenda civakî de dixebitin, diyar dikin ku divê jin beşdar bin. Ji ber ku, pêvajoyek ku jin lê daxil nebin dê sernekeftî be û ji vî aliyî ve jin di rêza yekem de ne di nav akterên kilît de. Hin beşdar diyar dikin ku bi taybetî divê mexdûr bêne daxilkirin. Eger akterên ku di pevçûnan de ziyan ber wan ketiye û birîndar bûne li pêvajoyê daxil bin, dê serkeftina avakirina aşitiya civakî zêde bike.

Li gorî gelek beşdaran, di pêvajoyeke muhtemel a gotûbêj û levkirinê de, SCS dikarin wek çavekî sêyem û aktereke krîtîk cih bigirin. Li gorî vê yekê, ji aliyekî ve SCS dikarin peywira çavdêriyê bi cih bînin û ji aliyê din ve jî dikarin roleke hêsankar bilîzin gava ku pêvajo xetimî; dikarin bibine pirek di navbera aliyên pevçûnan û giştî de. Li gorî vê yekê, ew tiştên ku berê ji bo avakirina aşitiya civakî qewimîn, divê li hemû çînên civakê bêne belavkirin û divê saziya siyasetê bê kişandin bo nav vê mecrayê. Di vê nuqteyê de, SCS di qada civakî de bi çalakiyên berbelav dikarin ji bo pêvajoya gotûbêj û levkirinê zemînekê amade bikin û li ser saziya siyasetê zextekê dikarin çêkin ji bo gav-avêtinê. Dawî jî hin beşdar diyar dikin ku SCS di qadên diyar de xwedî zanyarî û tecrubeyê ne û dikarin van ezmûnên xwe li pêvajoya avakirina aşitiya civakî zêde bikin. Di vê mijarê de, bi taybetî îşaret bi wan SCS'yan tê kirin ku li ser bingeha mafî dixebitin û di qadên diyar de bûne pispor.

Di vê beşê de, derfet û sînorên pêvajoyeke nû ya gotûbêj û levkirinê di meseleya kurdî de hatin nirxandin. Di vê çarçoveyê de, fikrên akterên civaka sîvîl hatin vekolîn di mijara asteng û derfetên bingehîn û akterên krîtîk de ku asteng in li ber pêvajoyeke nû ya diyalogê ji bo çareseriya siyasî ya meseleya kurdî. Di beşa din de, cihê SCS'yan hatiye nirxandin gava ku pêvajoyeke wiha dest pê bike. Di vê çarçoveyê de, SCS dikarin çi bikin, asteng û derfetên bingehîn ên li ber wan û wek dawî jî tiştên ku divê aliyên pevçûnan çi bikin, hatin lêkolîn û vekolîn ji bo ku rolên xwe bikarin bi awayekî çalak bilîzin.

## ENCAM: ROLA CIVAKA SÎVÎL JI BO ÇARESERÎ Û LEVKIRINÊ

Di çarçoveya lêkolînê de, dawî jî pêşniyarên şênber ên beşdaran hatin nirxandin ka SCS dikarin çi bikin di pêvajoyeke muhtemel a gotûbêj û levkirinê de. Di vê çarçoveyê de, yekem, asteng û derfetên bingehîn hatin nirxandin ku li ber SCS'yan hene. Duyem jî hate vekolîn ka SCS dikarin çi bikin di pêvajoyeke muhtemel a gotûbêj û levkirinê de. Dawî jî hate bibîrxistin ka dewlet û hukumet û Tevgera Kurdan a sereke divê çi bikin ji bo ku SCS bikarin rolên xwe bi awayekî çalak bilîzin.

### Astengên Bingehîn li ber SCS'yan

Astengên bingehîn ku beşdaran binê wan xêz kirin, li gorî frêkans(frequency)a behsbûna wan ev in:

1. Rewşa Awarte ku bûye sedema sînordarkirina azadiya ra-derbirîn û rêxistinbûnê, bûye sedema girtina SCS'yan tevî gelek saziyên medyayê û her wiha binçavkirin û destgîrkirin û ji qada giştî îxrackirina endamên wan; dawî jî wek encameke van piratîkên Rewşa Awarte tirs berbelav û kûr dibe di nav civakê de û wek encama vê tirsê jî rûdana paşveçûneke girîng di xebatên civaka sîvîl de,

2. Pûtenedana hukumet û Tevgera Kurdan a sereke bi civaka sîvîl û dilsarbûna wan ji karkirina li gel civaka sîvîl,

3. Angajmanên siyasî, alîgirî û cemserbendiya navbera SCS'yan,

4. Ji aliyê hukumet û Tevgera Kurdan a sereke ve mecbûrkirina SCS'yan ji bo ku bibine alî,

5. Lawaziya pêkhatina sazgehiya navxweyî ya SCS'yan û kêmasiyên zerfiyeta sazgehî (hêza mirovî, çavkaniyên darayî, çavkaniyên zanyariyan û hwd.),

6. Bi têra xwe pêşneketina pêvajo û normên demokratîk di SCS'yan de (têkiliyên lawaz li gel civak û endaman, xwe-girêdan bi fonan û meyla profêsyonêlbûnê, serokbûna kesan bi maweyeke dirêj di SCS'yan de, di-yarkeriya serok, desthilatdariya zilamên navsere û ser-navsere, kêmasiya pêvajoyên biryarên demokratîk),

7. Dîwarên tirsê di camîeya civaka sîvîl de ku çavkaniya wan hukumet yan jî Tevgera Kurdan a sereke ye,

8. Hebûna çekan û pevçûnên ku hê berdewam dikin,

9. Tabana civakî ya lawaz a SCS'yan û sînordarbûna zerfiyetên wan ji bo bandorkirin li pêvajoyên siyasî,

10. Riwangeha nerênî ya dewletê li wan SCS'yan ku di qada çareseriya siyasî û avakirina aşitiya civakî de dixebitin,

11. Kêmasiya SCS'yan a tecrube û zanyariyan di mijara çareseriya siyasî û avakirina aşitiya civakî de, sûndwernegirtin ji tecrubeyên navneteweyî li gorî pêwîst,

12. Bizdonekiya civaka sîvîl û pêşnexistina înîsîyatîfê,

13. Piştî ku pevçûnan dest pê kir, derfetên axaftinê ji holê rabûn ji bo SCS'yan,

14. Hevkariya navbera SCS'yan û kêmasiya hemahengiyê,

15. Mewzûeata ku qada SCS'yan teng dike,

16. Hewla derbeya leşkerî ya Rêxistina Gulen ku xwe wek mezintirîn tevgera civaka sîvîl pêşkêş dikir û piştî wê jî bawernekirina hukumetê bi civaka sîvîl wekî berê,

17. Bikarneanîna zimanê aşitiyê ji aliyê SCS'yan ve û xwe-bicihnekirin li gorî aşitiyê,

18. Xwedûrgirtina SCS'yan ji karekî nû û bikaranîna rêbazeke nû; û hakima bûna helwesteke parêzgarîkar di vê mijarê de,

19. Di hemû qadan de rêxistinkirina SCS'yan ku ji aliyê hukumetê ve têne rêberîkirin û xebatkirina hukumetê li gel van saziyan wek akterên civaka sîvîl,

20. Gelek zêde noqbûna akterên civaka sîvîl bi nîqaşên normatîf de, lewma jî bi awayekî çalak nebûna karînê ji bo hilberandina berheman û nebûna karînê ji bo hevpar-tevgerînê.

## Derfetên li ber SCS'yan

Akterên civaka sîvîl gava ku binê gelek astengan xêz dikin, sînordar be jî, diyar dikin ku hin derfet jî hene. Derfetên ku binê wan hatin xêzkirin li gorî firêkansa behsbûna wan ev in:

1. Rêfêransa ku Pêvajoya Çareseriyê ya 2013-2015'an pêk anî ku meseleya kurdî dikare bi rêyên siyasî bê çareserkirin,

2. Kuştiyên ku di van salên dawîn de ji ber pevçûnên nav-bajaran çêbûn û rewşa nerênî ku ji ber xirapkariyên mezin çêbû û berbelavî û meziniya daxwaza li ba civakê ji bo ku careke din ew neqewimin,

3. Guhertina pergalê ku piştî giştpirsiya makeqanûnê hê berdewam dike, hilbijartinên Serokkomariyê yên 2019'an û dînamîkên nû,

4. Hesta bêedaletiyê ku belav bûye li nav her beşeke civakê û zêdebûna lêgerînên derketinê ji vê rewşê,

5. Xelkê ku xwe dûr digire ji pevçûnan û piştgiriya aşitî û çareseriya siyasî dike, wan palpiştek çêkiriye ji bo civaka sîvîl,

6. Li Tirkiyeyê zêdebûna wan beşan ku ji taxên xwe ne memnûn in, di serî de li taxên komên neteweparêz-parêzgarîkar û bi rêfêransên îslamî; berfirehbûna "qadên gewr ên demokratîk",

7. Heta radeyekê pêşveçûna civaka sîvîl li Tirkiyeyê, wek encamek ji encamên pêvajo û rêformên endambûnê li YE û li rexmî paşveçûna ji ber Rewşa Awarte, berdewamkirina hewlên civaka sîvîl,

8. Derketina ezmûneke demokratîk wek encamek ji encamên wan têkiliyan ku Tirkiyeyê ji sedsala 19'em û pê ve li gel cîhana rojava çêkirine û welatek e ku rêfêrans e ji bo cîhana rojhilat,

9. Tecrubeyên cîhanê di mijara çareserkirina pevçûnan û avakirina aşitiya civakî de û potansiyela akterên civaka sîvîl ji bo veguhestina van tecrubeyan bo Tirkiyeyê,

10. Serkutkirina hewla leşkerî ya 15'ê Tîrmehê bi raperîna sîvîl a hemwelatiyan û pêkhatina rêfêranseke siyasî ya demokratîk di vê mijarê de,

11. Sînordar be jî berhevbûna tecrubeyên AK Partî û Tevgera Kurdan a sereke ji bo xebatkirinê li gel akterên civaka sîvîl,

12. Bihêzbûna kurdan li seranserê Rojhilata Navîn û wek encamek ji encamên vê yekê nemumkunbûna çareseriya leşkerî.

## SCS Dikarin Çi Bikin?

Beşdar bi baldan li asteng û derfetên heyî, pêşniyarên ciyawaz pêşkêş dikin ka SCS dikarin çi bikin di pêvajoyeke gotûbêj û levkirinê ya muhtemel de. Pêşniyarên ku beşdaran pêşkêş kirin ka SCS dikarin çi bikin, li ser bingeha heft fonksiyonên SCS'yan di mijara çareserkirina pevçûnan û avakirina aşitiyê de, hatine sinifandin. Fonksiyonên ku beşdaran herî zêde fokisa xwe dan ser, bi dorê ev in: "parêzvanî û ragihandina giştî", "pêkveibûna civakî ya hestyar bo pevçûnan", "navbînkarî û asankarî", "civakîbûna nav-komî û çanda aşitiyê", "şopandin û berpirsiyarî-qebûlî" û "xizmetkirin bi awayekî rasterast". Fonksiyona "parastina hemwelatiyan" ku di nav heft fonksiyonên civaka sîvîl de cih digire, hatiye çavdêrîkirin ku SCS wek qadeke krîtîk li vê fonksiyonê nanêrin. Li xwarê, pêşniyarên beşdaran li ser bingeha fonksiyonan û li gorî rêzbendiya girîngiyê hatine pêşkêşkirin:

### *Parêzvanî û ragihandina giştî*

1. Parastina çareseriya siyasî ya meseleya kurdî û aşitiya civakî li ser zemîneke normatîf, zindîragirtina vê yekê di qada civakî de û daxwazkirin ji siyasiyên biryarbidest, bi gotineke din parastina mafê aşitiyê,

2. Birêvebirina "dîplomasiyeke aşitiyê" ya pir-astî û pir-akterî li ba biryarbidestan,

3. Birêvebirina xebatan ku daxwaza aşitiya civakî bigihînine beşên berfireh; bêyî ku bikevine bin wesayeta siyasetê û bêyî ku bi berdevkiya aliyekî rabin, wek saziyên serbixwe xebatkirin ji bo qanîkirina civakê di mijara çareseriya siyasî ya meseleya kurdî û avakirina aşitiya civakî de,

4. Bi çalakiyên bêîtaetiya sîvîl, hem tevkarîkirin li avakirina aşitiya civakî hem jî zextkirin li ser biryarbidestan,

5. Lidarxistina çalakiyên cemawerî yên berfireh ku beşên civakî yên ciyawaz li dor daxwaza aşitiyê li hev dicivînin û avakirina tevgereke aşitiyê,

6. Hilberandina zanyariyan bi çalakiyên wekî lêkolîna qadê, rapor û enelîza tecrubeyan û bi van zanyariyan mudaxilbûn li pêvajoyên polîtîka-çêkirinê,

7. Veguhestina tecrubeyên navneteweyî bo Tirkiyeyê ku der heqê avakirina aşitiya civakî de ne,

8. Pêşvebirina zimanê aşitiyê û hem li siyasetê hem li medyayê hem jî li civakê belavkirin,

9. SCS'yên wekî komeleyên hembajarî ku angajmana wan a siyasî nînin, komeleyên alîkariyê û yaneyên werzişê, berdaşkirina wan li xebatên avakirina aşitiya civakî; bi xebatên van SCS'yan diyarkirina wan têkiliyên ku heta roja îro nehatine xuyanê yan jî nehatine ferqkirin ku di navbera rehendên ciyawaz ên meseleya kurdî û avakirina aşitiya civakî de hene û xebatkirin ji bo vê yekê,

10. Bêyî ku li hêviya peymaneke resmî yan jî pêvajoyeke gotûbêjan bimîne, avakirina "komîsyonên heqîqet û rûbirûbûnê" yên sîber,

11. Gihandina çîrokên mexdûrên demên pevçûnan bi beşên civakî yên ciyawaz,

12. Bi baldan li wê yekê ku civak zêde ne eleqadar e ka berê çi bûye û di siberojê de dê çi bibe, bêtir alaqadar e ka îro çi dibe û ya ku li me nêzîk dibe çi ye; di vê mijarê de agahdarkirina xelkê û avakirina xebatên aşitiyê li ser vê yekê,

13. Ka şer û aşitî çi ye, di vê mijarê de eşkerekirina heqîqetê û çêkirina agahdariya civakî,

14. Encamdana wan xebatan ku jin û ciwan û zarokan ji bo xwe navend digirin û beşdarkirina van koman li xebatên avakirina aşitiya civakî,

***Pêkvebûna civakî ya hestyar bo pevçûnan***

15. Avakirina piran di navbera rojhilat û rojava de wêdetir ji xebatên parêzavaniyê û levcivandina serpêhatiyên ciyawaz û avakirina mekanîzman ji bo vê yekê,

16. Avakirina mêkanîzm û teşkîlan ji bo ku beşên civakî yên ciyawaz bikarin tê de li hev bicivin,

17. Avakirina teşkîl, platform û meclîsan ji bo ku SCS'yên bi eweliyetên siyasî yên ciyawaz bikarin ji bo aşitiyê hem di nav deverê hem jî di nav welêt de pêkve xebatan bikin û hevpar tev bigerin,

18. Avakirina meclîsan ji bo ku di hemû deveran de hem akterên siyasî yên ciyawaz hem saziyên giştî hem jî SCS'yan li hev bicivîne û lokalkirina avakirina aşitiya civakî,

19. Berbelavkirin û bihêzkirina qadên gewr; mezinkirina qadên gewr ku aliyên ciyawaz li hev dicivînin û derfetên axaftinê çêdikin di navbera ciyawaziyan de; û piştgirîkirina wan SCS'yan ku di van qadan de dixebitin,

20. Levcivandina wan kesan ku li taxên AK Partî, CHP yan jî HDP cih digirin û derdê wan hene li gel "taxên xwe",

21. Levcivandina wan navên popîlêr ku tevî ku angajmanên wan ên siyasî yên ciyawaz hene lê rasterast bi partiyekê behsa wan nayê kirin û hem zêdekirina agahdariya civakî ji bo aşitiyê hem jî çêkirina zextê li ser karbidestên siyasî û bi vê yekê pêkanîna înîsîyatîfan,

22. Levcivandina wan beşên civakî ku pev diçin û birêvebirina karên hevpar,

23. Li şûna wan tiştan ku nasnameya tirk û kurd rasterast ji bo xwe navend digirin û axaftinê zehmet dikin, axaftin li ser hevpariyên civakî yên wekî aborî, êkolojî û jiyana civakî; û levcivandina wan aliyan ku li ser peydakirina çareserkirina pevçûnan pev diçin yan jî nikarin bêne ba hev; li ser bingeha hevpariyên civakî jevkirina meseleyê bi ser parçeyên biçûk de û avakirina piran li ser meseleyên biçûk û axaftina meseleyên mezin ên wekî meseleya kurdî.

24. Pêşvebirina xebatên wekî Lijneya Mirovên Aqil; bilindkirina daxwaza aşitiya civakî bi rêya wan mirovên popîlêr ku xîtabî beşên civakî yên ciyawaz dikin û gihandin bi beşên berfireh,

25. Derfet çêkirin ji bo ku SCS'yên li rojava, ku di serî de ewên ku diyaloga wan bihêz e li gel hukumetê, li meseleyê baştir serwext bibin; û rasterast bêne herêmên pevçûnan û xebatan bi rê ve bibin di van herêman de,

***Navbînkarî û asankarî***

26. Hakemtîkirin di navbera aliyan de,

27. Şopandina pêvajoya diyalog û gotûbêjan, enelîzkirin û raporkirin,

28. Agahdarkirina aliyan li ser mijara şaşî û çarerêyan

29. Navbînkarîkirin di navbera aliyan de, asantirkirina ragihandin û gotûbêt jê,

30. Birêvebirina xebatên çavdêrî, mudaxelekerî û berlêgiriyê li hember wan xebatan ku çareseriya siyasî û aşitiya civakî xirap dikin,

31. Enelîzkirina rîskan, diyarkirina rîskên muhtemel berî ku biqewimin û xebitîn li ser wan rîskan ka hem civaka sîvîl hem jî akterên siyasî li hember wan dikarin çi bikin,

32. Avakirina teşkîlan ji bo ku bikevin navberê gava ku qeyran çêbûn,

33. Pêkanîna 'lijneyên aşitî-şopîner' ên sîberî yên mayinde,

***Civakîbûna nav-komî û çanda aşitiyê***

34. Berbelavkirina nasîna ciyawaziyan, pêkvejiyan, rîayetkirin li mafan û çanda aşitiyê li nav welêt û zêdekirina agahdariya civakî di vê mijarê de,

35. Tevkarîkirin li avakirina pergaleke perwerdeyê ji bo rakirina cudakarî û yêdinkirin û nefreta li ser bingeha êtnîk, dînî yan jî zayendî; amadekirina nifşên siberojê ji bo aşitiya civakî,

36. Parastin û berbelavkirina çareseriya siyasî û aşitiya civakî di "taxa xwe ya siyasî" de, şopandina gotûbêj û levkirinê,

37. Bi rêya wîjdan behskirina meseleya kurdî ji civakê re di bîr û bawerî û helwesta wan de guhertinekê pêk nayne, bi baldan li vê rastiyê, zêdetir ji wîjdan, karkirin ji bo ku mirov fam bikin "ka ji ber vê meseleyê çi ji destdane", bi gotineke din têkilîçêkirin di navbera meseleya kurdî û jiyana rojane ya mirovan de,

***Şopandin û berpirsiyarî-qebûlî***

38. Şopandin û eşkerekirina pêşêlkariyan û çêkirina agahdariya civakî li ser vê mijarê,

39. Bibîrxistin û nîşandan bi akteran di serî de desthilatdariya siyasî, ku encamên huqûqî yên ciddî yên pêşêlkariyan hene,

40. Bi awayekî sîstêmatîk birêvebirina xebatên bibelgekirin û raporkirinê di hemû qadan de, çêkirina bîr û avakirina erşîvan di qadên ciyawaz de,

***Xizmetkirin bi awayekî rasterast***

41. Avakirina mekanîzman ji bo rakirina mexdûriyetan ku ji ber pevçûnan çêbûne,

***Yên din***

42. Levcivandina wan saziyan ku qada wan a yekem aşitî ye û çêkirina zaanyarî, fikr, mekanîzm, teşkîl û tîman ji bo piştgirîkirina pêvajoya çareseriyê,

43. Têkiliyeke çawa heye di navbera qada xwe ya xebatê û meseleya kurdî de, eşkerekirina vê têkiliyê û di vê qadê de amadekarîkirin ji bo tevkarîkirin li çareseriya siyasî,

44. Bi asteke biçûk pêşvebirina projeyên taybet di qada xwe de û hilberandina bersivên şênber ji bo meseleyên biçûk di qadên jin, ciwan, mafên zimanan, trawma civakî, girtîgeh, efa giştî û hwd. de; piştgirîkirina pêvajoya diyalog û gotûbêjê bi awayekî rasterast,

45. Çêkirina nîqaşên normatîf di mijara civaka sîvîl de; bi pêrspêktîfeke rexnegirane pêdeçûnkirin bi têkiliyên SCS'yan de ku li gel civak, dewlet û siyasetê hene,

46. Bi baldan li wan tecrubeyan ku di mijara çareserkirina pevçûnan û avakirina aşitiya civakî de derketine di zeman û mekanên ciyawaz de, bihêzkirina zerfiyeta sazgehî; nexasim bi rêya fokisdan bi ser zanyarî û têknîk û rêbazê,

47. Bi pêrspêktîfeke rexnegirane, nirxandina wan rolên civaka sîvîl ku di pêvajoyên berê de lîstine û derxistina dersan û hînbûn ji şaşî û serkeftinên rabirdûyê.

**Dewlet, Hukumet û Tevgera Sereke ya Kurdan Divê Çi Bike?**

Pêşniyarên beşdaran ji bo wê yekê ka dewlet û hukumet û Tevgera Kurdan a sereke divê çi bikin ji bo ku akterên civaka sîvîl bikarin çalaktir rolên xwe bilîzin, li gorî firêkansa behsbûna wan li xwarê hatine rêzbendkirin.

1. Pêkanîna derdoreke siyasî û huqûqî ji bo ku akterên civaka sîvîl bikarin

xebatên xwe bi serbestî bikin û nûkirina mewzûeta huqûqî bi wî awayî ku qada civaka sîvîl berfireh dike,

2. Bêdengkirina çekan û ji nû ve çêkirina jîngeha bêpevçûn,

3. Destberdana dewlet û Tevgera Kurdan a sereke ji wê meylê ku civaka sîvîl dixe nav angajmanên siyasî û dike alîgir,

4. Destberdana aliyan ji wê bîr û baweriyê ku SCS'yan dike amraz û vekirina pêşiya civaka sîvîl û afirandina derfetên pêkve-xebatkirinê,

5. Çênekirina zext û gefekê li ser akterên civaka sîvîl ji aliyê layenan ve û her wiha sînordarker nebûn,

6. SCS û birêveberên wan ku di Pêvajoya Aşitiyê de ji bo aşitiyê dixebitîn, îro ji ber wan xebatên xwe têne mehkemekirin; gava ku ev yek were liberçavgirtin, divê ev mehkemekirin bi dawî bibe û ew temînata huqûqî ku ji bo peywirdarên giştî hatiye çêkirin, divê di pêvajoyên aşitiyê yên bê de ji bo akterên civaka sîvîl jî bê çêkirin,

7. Pêkanîna şefafiyet û berpirsiyarî-qebûliyekê ku rê dide ji bo beşdarbûn û kontrola giştî,

8. Piştgirîkirina SCS'yan ji bo pêşvebirina zerfiyetên wan,

9. Layen li  ser pêkhateyên xwe yên sazgehî û mekanîzmên xwe yên navxa weyî divê lêpirsîneke karîger bikin û di vê mijarê de divê mekanîzmên mayinde ava bikin.

# ÇAVKANÎ

Aspinall, Edward, *The Helsinki Agreement: A More Promising Basis for Peace in Aceh?,* Policy Studies No. 20, Washington, D.C., East-West Center, 2005.

Çelik, A. Betül, di nav "Etnik Çatışmaların Çözümünde Siyaset Bilimi ve Uyuşmazlık Çözümü Yaklaşımları,", F. Nimet Beriker (der.), *Çatışmadan Uzlaşmaya: Kuramlar, Süreçler ve Uygulamalar,* Stenbol, İstanbul Bilgi Üniversitesi Yayınları, 2010, 163-188.

______, di nav "Kürt Meselesini Dönüştürmede Toplumsal Mutabakat İhtiyacı: Neden, Nasıl, Kimle?,", Murat Akbaş (brhv.), *Çatışma Çözümleri ve Barış,* Stenbol, İletişim, 2014, 131-152.

______, "Turkey: The Kurdish Question and the Coersive State," içinde, Thania Paffenholz (Ed.), *Civil Society and Peacebuilding: A Critical Assessment,* Boulder, Lynne Rienner Publishers, 2010, 153-179.

Çelik, A. Betül ve Mutluer, Nil, di nav "Toplumsal Barış ve Barış Süreci'nin Toplumsallaşması,", Necmiye Alpay & Hakan Tahmaz (brhv.), *Barış Açısını Savunmak. Çözüm Sürecinde Neler Oldu?,* Stenbol, Metis Yayınları, 2015, 59-75.

Daşlı Güneş, Alıcı, Nisan ve Flader, Ulrike, *Kadınların Barış Mücadelesinde Dünya Deneyimleri: Sırbistan, Kosova, Sri Lanka ve Suriye,* Enqere: DEMOS Demokrasi Barış ve Alternatif Politikalar Merkezi Derneği Yayını, 2017.

Democratic Progress Institute (DPI), *Briefing: International Contact Group for the Southern Philipines Peace Process,* Democratic Progress Institute, 2014.

______, *Çatışma Çözümünde Filipinler Deneyimi' Konulu Karşılaştırmalı Çalışma Ziyareti Raporu,* London, Democratic Progress Institute, 2016.

Lederach, John Paul, *Building Peace: Sustainable Reconciliation in Divided Societies,* Washington, D.C.: United States Institute of Peace Press, 1999.

Ozdemirkiran, Merve, “*Construire Un Etat, Briser* Des Tabous : Les Hommes D’affaires de Turquie Entre La Construction Étatique Du Gouvernement Régional Du Kurdistan (GRK) et La Politique Étrangère de la Turquie,” *Têza Neweşandî ya Diktorayê*, Institut d’Etudes Politique de Paris (Sciences Po.), 2013.

Paffenholz, Thania & Spurk, Christoph, di nav “A Comprehensive Analytical Framework,”, Thania Paffenholz (ed.) *Civil Society and Peacebuilding: A Critical Assessment*, Boulder, Lynne Rienner Publishers, 2010, 65-76.

______, “Civil Society, Civic Engagement, and Peacebuilding,” *The World Bank Social Development Papers: Conflict Prevention and Reconstruction,* Paper No. 36, Washington, DC, October 2006.

Pérouse, Jean- François, di nav “Reposer la ‘question kurde’,”, Semih Vaner (Dir.), *La Turquie,* Paris, Fayard, 2005, 357-387.

Powel, Jonathan, *Teröristlerle Konuşmak: Silahlı Çatışmalar Nasıl Sona Erdirilir?,* Stenbol: Aykırı Yayıncılık, 2014.

Söylemez, Hatice, *Moro: Uzakdoğu’da Bir Bağımsızlık Mücadelesi,* Stenbol, İHH İnsani ve Sosyal Araştırmalar Merkezi, 2016.

Yaşama Dair Vakıf YADA, *Verilerle Sivil Toplum Kuruluşları,* Enqere, 2015.

## PÊVEK 01: LÎSTA BEŞDARAN

### Amed

1. Seroka Çocuklar Aynı Çatı Altında Derneği (ÇAÇA) Azize Laygara

2. Serokê Dicle Toplumsal Araştırmalar Merkezi (DİTAM) Mehmet Kaya

3. Serokê Şaxa Amedê ya Türkiye Diyanet ve Vakıf Görevlileri Sendikası (Diyanet-Sen) Ömer Evsen

4. Serokê Baroya Amedê Ahmet Özmen

5. Seroka Diyarbakır İş Kadınları Derneği (DİKAD) Reyhan Aktar

6. Serokê Şaxa Amedê ya Özgür Düşünce ve Eğitim Hakları Derneği (Özgür-Der) Süleyman Nazlıcan

7. Serokê Diyarbakır Sanayici ve İş İnsanları Derneği (DİSİAD) Burç Baysal

8. Serokê Diyarbakır Siyasal ve Sosyal Araştırmalar Enstitüsü (DİSA) Necdet İpekyüz

9. Seroka Doğu ve Güneydoğu İş Kadınları Derneği (DOGÜNKAD) Nevin İl

10. Hevserokên Şaxa Amedê ya Göç Edenlerle Yardımlaşma ve Dayanışma Derneği (Göç-Der) Semire Nergiz ve Yılmaz Kan

11. Serokê Şaxa Amedê ya İnsan Hakları Derneği (İHD) Raci Bilici

12. Endamê Desteya Koordînasyona Amedê ya Hak İnisiyatifi (Mazlum-Der) Selahattin Çoban

13. Serokê Şiddet ve Göç Mağdurları Rehabilitasyon ve Adaptasyon Merkezi (SOHRAM) Mim Yavuz Binbay

14. Pisporê Saziyên Civaka Sîvîl Şehymus Diken

**Wan**

1. Endamê Desteya Birêvebirinê ya Gençlik ve Ekoloji Derneği Cevahir Böke

2. Alîkarê Serok yê Gökkuşağı Eğitim Kültür ve Yardımlaşma Derneği Kemal Çelen

3. Serokê Şaxa Wanê ya İnsan Hakları Derneği (İHD) Murat Melet

4. Sikritêrê Giştî yê İnsan ve Özgürlük Hareketi (Öze Dönüş) Mehmet Kamaç û Berdevkê Wanê Murat Bozdemir

5. Kevneserokê Şaxa Wanê ya Mazlum-Der Yakup Aslan

6. Endamê Desteya Birêvebirinê ya Öze-Dönüş Derneği Yasin Haskanlı

7. Serokê Baroya Wanê Murat Timur

8. Serokê Van Genç Eğitim Kültür Yardımlaşma Dayanışma ve İnsan Hakları Derneği (Genç-Der) Giyasettin Özçiçek

9. Serokê Van Girişimci İş Adamları Derneği (VANGİAD) Kadri Salaz

10. Seroka Van Kadın Derneği (VAKAD) Zozan Özgökçe

11. Serokê Van Ticaret ve Sanayi Odası Başkanı Necdet Takva

**Stenbol**

1. Endama Barış İçin Kadın Girişimi Nimet Tanrıkulu

2. Berdevka Dayikên Şemiyê Sebla Tarcan

3. Kevneserokê Eko-Politik Tarık Çelenk

4. Koordînatorê Giştî yê Eşit Haklar İzleme Derneği Nejat Taştan

5. Birêvebera Hakikat Adalet Hafıza Merkezi Hafıza Çalışmaları Programı Özgür Sevgi Göral

6. Berpirsiyara Koordînasyona Giştî ya Helsinki Yurttaşlar Derneği / Yurttaşlık Derneği Emel Kurma

7. Berpirsiyara Mafên Mirovan û Kar û Barên Huqûqî ya İHH İnsani Yardım Vakfı Gülden Sönmez û Endamê Lijneya Mutewellî Osman Atalay

8. Berpirsiyara Koordînasyona Giştî ya Küresel Barış ve Adalet Koal-isyonu (Küresel BAK) Yıldız Önen

9. Dîrektora Lêgerînê ya PODEM – Kamusal Politikalar ve Demokrasi Çalışmaları Merkezi Özge Genç

10. Dîrektorê Süreç Araştırma Merkezi Murat Sofuoğlu

11. Pispora SCS'yan Ayşe Betül Çelik

12. Pisporê SCS'yan Mehmet Ali Çalışkan

**Enqere**

1. Alîkarê Serokê Giştî yê Alevi Bektaşi Federasyonu Bülent Kaya

2. Endama Ankara Kadın Platformu Hatice Kapusuz

3. Kevneseroka Başkent Kadın Platformu Fatma Bostan Ünsal

4. Seroka Desteya Birêvebirinê ya Demir Leblebi Derneği Sevna Somuncuoğlu

5. Koordînatora Lêgerînê yê Demokrasi Barış ve Alternatif Politikalar Araştırma Merkezi (DEMOS) Güneş Daşlı

6. Endama Desteya Birêvebirinê ya Gündem Çocuk Derneği Ezgi Koman

7. Serokê Giştî yê İnsan Hakları Derneği Öztürk Türkdoğan

8. Koordînatorê Giştî yê İnsan Hakları Ortak Platformu Feray Salman

9. Çalakvanê Înîsîyatîfa Heq û Kevneserokê Giştî yê Mazlum-Der Ahmet Faruk Ünsal

10. Koordînatorê Giştî yê Sivil Toplum Geliştirme Merkezi (STGM) Tezcan Abay û Koordînatorê Ragihandinê Mehmet Kutku

11. Seroka Türkiye İnsan Hakları Vakfı Şebnem Korur Fincancı

## PÊVEK 02: PIRSÊN LÊKOLÎNA QADÊ

**P1.** Ji salên 1990'î ve ji bo çareseriya siyasî ya meseleya kurdî, lêgerînên curbecur ên diyalog û levkirinê hene. Gava ku em vê dewrê bidin ber çavan ku ji 20 salan zêdetir e berdewam dike, hûn rola civaka sîvîl çawa dinirxînin di mijara xilaskirina pevçûnan û avakirina aşitiya civakî de li Tirkiyeyê?

**P2.** Hûn xebatên civaka sîvîl çawa dinirxînin ku ji bo çareseriya meseleya kurdî li Amed/Wan/Stenbol/Enqereyê (Hevdîtin li kîjan bajarî hatibe kirin) di mijara xilaskirina pevçûnan û avakirina aşitiya civakî de têne kirin?

**P3.** Wek sazî we heta îro çi kiriye ji bo xilasbûna pevçûnan û avabûna aşitiya civakî? Xebatên we yên bingehîn çi ne di vê mijarê de?

**P4.** Îro projeyek yan xebateke we ya ku berdewam dike heye ji bo çareserkirina pevçûnan û avakirina aşitiya civakî?

**P5.** Hûn rola civaka sîvîl li Tirkiyeyê çawa dinirxînin di Pêvajoya Çareseriyê de?

**P6.** Wek saziyeke civaka sîvîl di Pêvajoya Çareseriyê de temaseke we çêbû li gel partiyeke siyasî yan jî akterên siyasî ji bo xilaskirina pevçûnan û avakirina aşitiya civakî? Yan jî akterên siyasî yên navborî daxwaza tevkariyên we kirin?

**P7.** Wek saziyeke ji bo çareserkirina pevçûnan û avakirina aşitiya civakî, di Pêvajoya Çareseriyê de, tu xebatek yan jî projeyeke we çêbû? Kîjan in ew saziyên ku hûn pêkve xebitîn di asta lokal û herêmî de yan jî di asta welêt de, we projeyên çawa çêkirin?

**P8.** Di Pêvajoya Çareseriyê de, ji bo çareserkirina pevçûnan û avakirina aşitiyê tu hevkariyeke we, projeyek yan jî xebateke we ya hevpar hebû li gel saziyek ji wan saziyan ku ji aliyê rojhilat/rojavayê welêt in?

**P9.** Hûn têkilî/hevkariya **SCS-akadêmiyê** çawa dinirxînin di çarçoveya çaa reserkirina pevçûnan û avakirina aşitiyê de?

**P10.** Hûn têkilî/hevkariya **SCS-medyayê** çawa dinirxînin di çarçoveya çaa reserkirina pevçûnan û avakirina aşitiyê de? Gava ku em li xebatên we binêrin ku we wek sazî çêkirine, medyaya civakî dikare bibe qadeke altêrnatîfek ji bo civaka sîvîl?

**P11.** Gelo pêvajoyeke nû ya gotûbêj û levkirinê mumkun e ji bo çareseriya meseleya kurdî, xilaskirina pevçûnan û avakirina aşitiya civakî? Ji bo vê yekê astengên bingehîn çi ne ku divê bêne derbaskirin?

**P12.** Derfetên bingehîn çi ne û akterên kilît kî ne di vê mijarê de?

**P13.** Civaka sîvîl dikare çi bike û divê çi bike ji bo pêvajoyeke nû ya gotûbêj û levkirinê?

**P14.** Astengên bingehîn çi ne li ber civaka sîvîl di pêvajoyeke muhtemel ya gotûbêj û levkirinê de?

**P15.** Derfetên li pêş civaka sîvîl çi ne?

**P16.** Divê alî çi bikin ji bo ku civaka sîvîl bikare çalaktir rola xwe bilîze ji bo xilaskirina pevçûnan û avakirina aşitiya civakî di meseleya kurdî de?